

Sernivîser
Qado Şêrîn

Derhener
Xorşîd Şûzî



Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûrî

hejimar '17' Êlûn 2013

شهرية تصدر عن رابطة الكتاب والصحفيين الكورد في سوريا

Arşevê Oskan

Kesê welatê xwe

ji bo keçekê bifroşe



Wekî ku min berya niha jî, ji we re gotibû: divê li Europayê, em hiş û aqilê welêt ji ser xwe bavêjin.

Ango mirov piştî ku paseportê qezenc dike, ma mirovê ji netewperestiyê çî bike. Hemû li cem me dibin gotin motinên vala. Ma ku pereyên min hebin û paşeroja zarokên min, ne di xeterê debe, ku qanûn li ser min û Almanekî wek hev bê bikaranîn. Vêca ev çî birazît û quretîn in. Ez nema sintekî xwe, di ruhê Kurdan de didim. Yaoooo çima ez hatime û serê we bi van gotinê, ku hezarê caran hatine dûbarekirin di'êşnim. Ka ez serpêhatiya vê carê ji were bixwînim û we ji çîrok mîrokan rizgar bikim.

Wê rojê, ez di tirênê de, bi keçekê re siwar hatim û ew jî, ji bajarê min bû. Gotinek ji vir, yek ji wir, min pîrsa navê wê kir. Wê jî, bê tirs û fedî navê xwe ji min re got: navê min Xelat e. Dema ku min jê pîrsî: tu ji kîjan welatî hatiye Almaniyayê?. Got: ez ji Turkiyê hatime û hemû malbata min li vir rûdinên. Dema ku wê jî, ji min pîrsî û got: Tu ji kîjan welatî hatiye?. Li vir ez hinekî sar sekinîm û ramiyam, ku ez bibêjim ji Kurdistanê hatime, ditirsim ku keç ji min bixeyide, ji bo navê welatê minî qedexekirî û nema bi min re bipeyive, lê hema min ji wê re got: Ez ji Sûriyê me!. Min nema dixwest ku pîrs firehtir û bêhtir bibin.

Me li nav û temenê hev pîrsî û bi vî awayî, her tişt baş derbasbû. Dema ku min jê pîrsî: piştî em li bajêr peyabin, emê dikarin careke din hev bibînin?. Wê jî, kêfa xwe anî û got: Çima na?. Ez roja yekşemê valam e û karê min wê rojê tune ye, em dikarin telefonên hev bistînin û hev bibînin. Bi rastî min ji xwe bawer nekir, ku ev keça xweşikî nazenîn, kêfa xwe ji min re anî û wê were serdana mala minî biçûk.

Bi gihandina min ya malê re, çî tiştên minî bi kurdî hebûn, min ew veşartin, kasê, nexşeya Kurdistanê, al û pirtûkên kurdî. Min hundir ji kurdayetiyê paqij kir. Min xwe amade dikir, ku jê re bibêjim ez mirovekî Erebiyê im. Roja yekşemê hat, hevala me di soza xwe de li derî xist, bi derbasbûna wê re, roj derbasî odeya min bû. Li ser kenebeyê rûnişt û li derdora xwe nerî, ji min pîrsî: Ka çî kasêten xweş li cem te hene?. Ji bilî yê kurdî, li cem min tune bûn. Min derew lê kir û got: Mixabin, hevalê min hemû kasêten turkî û erebî birine cem xwe. Yeqîn di hundirê teyiba xwe de, min kasêta Şivan Perwer jibîr kiribû. Gava ku destê xwe da ser bişkojê û Şivan mîna hercar qîriya, dest bi strana xwe (Çîroka Laz û Kurd) kir, min xwe qermiçand ser hev. Dîna min dî, ku wê jî serê xwe li ber stranê hejand, ez li hejandina serê wê matmayî mam.

Gotina yekem ji min re got: Ez dizanim tu Kurd î, mane ez ji Kurd im ha, ez ne Turk im, lê mixabin bi kurmançî nizanim, ez Zaz im!. Bi gotina wê re min êrîşî bin text û kenebeyan kir û al, kasê, nexşe û pirtûkên kurdî kir û ew derxistin. Min lêbûrîna xwe ji wê xwest û min got: bi xwedê, min go qey tu keçeke Turk e, lewra min hemû tiştên kurdî ji ber te veşart, da ku tu ji min nexeyide. Keçik, ji wê tevgera min, bi hêrs ji derî derket û got: Kesê welatê xwe ji bo keçekê bifroşe, ez nikarim hevaltiya wî bikim. Bi vî awayî, Xelat û welat herdu jî, ji min xeyidîn û çûn!!

(Ji erşîva nemir)

Ezîz ê Cewo

Pêdivîya me bi rast axavtin,
rast nivîsîn û rast xwedînê heye (xelek-1)

..... RûPel(4)

Harold Pinter

Kurd dê biserkevin.

Zebaniyan kurdistan kirine cehneme

..... RûPel(8)

Ezîz Xemcivîn - Amadekirin:

Bingehên grame ra kurdmancî

Celadet Alî Bedirxan

Bi navê Yezdanê pak ê dilovan ê mihrevan

Navdêr

..... RûPel(10)

Dr. Ehmed Xelîl - Cîgeh û mirov

Heyder Omer - Wergêr

Kesayetiya kurdî Lêkolînên civaknasîn * - Xelek 8 -

Çiya kilîtê kesayetiya Kurd e (1)

..... RûPel(12)

Kemal Tolan

Erdên Êzdiyên li başûrê rojavayê Kurdistanê (Sûriyê)

kurtiyek ji Diroka cih û warên Êzdiyên li başûr-rojavayê

Kurdistanê (Xelek - 2)

..... RûPel(15)

Qamişlo

Di evîna welat de dilekî pir jen e

Mihemedê Mele Ehmed

Xelek - 2 -

..... RûPel(17)

Hevpeyvînek zindî bi

Tengezarê Marînî re

..... RûPel(20)

Hoşeng Broka

Hewlêr.. baş li xwe binere!

..... RûPel(22)

Boniye Cegerxwin

Min di ronîya çavê xwe de

..... RûPel(24)

Mizgîn Hesko - Wergerandin ji Erebi:

Mehmûd Derwêş

..... RûPel(29)

Beyar Robarî

Birakê te nexweşe! - Xelek 1 - RûPel(31)

Danehev û berhevkerin: *Serhan Îsa*

Hovo û Hirçê Cezîrê



Ji kevnetorê Kurdî

Dibêjin li Cezîra Botan Hirçek ketbû devê gelîyekî, ku kesekî bi rê û rêwanî jî êdî nikarî bû di wir ve here û were.

Hovo jî şivanê Keşê ye, zend û bendên Hovo ji gotina mîna du stûna ne, pirça sînga wîna du bost û nîvan dirêj e, newqa wîna jî destê du mêran lê nagihê hev, serûbinî hevûdin bûye mîna kelpîçekî ji kelpîçên Dêrên Ermenîyan, tolekî Hovo jî heye navê wîna Quto ye, darê Hovo ye şivantiyê jî bi qasî zendê mêrekî wisa stûr e.

Rojekê ji rojan Hovo jî berê pezê xwe da wê nehêlê, a ku Hirç tê de, dibêjin segurkê lêda, Hirç jî ji kuna xwe derket û ber bi Hovo, Quto û keriyê pez hat, bû kewte kewta Quto êrîş berda Hirçê, piştî Hirçê da latê ew kire dîwarê hesarê, hema Hovo jî rahişte wî zire kopalî û heta Xwedê hêz dayê bi ser serê Hirçê de berda ew di ciyê cî de kuşt.

Dibêjin çend roj di wê navê re çûn xelkê Cezîrê pê hisîyan ku Hirç hatiye kuştin, xwedîxêran xeber dane Bedirxan Beg ku mîrê min bi enya bavê te Hirçê Cezîrê hatiye kuştin û kurm û mêşan girtine kelaşê wî.

Bedirxan Beg ferman da xelkên Cezîrê ku bilezînin ka ji min re peyva rast bînin ka bê ma kî ev Hirç kuştîya.

Pirsîn li vir li wir go kî kuştîye kî nekuştîye go ezbenî bi Xwedê dibêjin şivanê Keşê, Hovo, Hirçê Cezîrê kuştîye.

Ê go baş e... Bedirxan Beg jî bi bayê bezê peyak ji peyayên xwe bi rê kire dîv Keşê û Hovo... ku mîr sibe we li dîwana xwe dixwazê...

Serê sibehî Keşê êk bi rê kire ber pez li ciwanîyê siwar bû, Hovo jî bi rex ket, û Quto jî da dîv wana û qesta Birca Belek kirin...

Bi rê de Keşe li Hovo zîvirî go Hovo ey Xwedê ji te sitando emê herin dîwana mîrê Botan vî toleyî ji dîv me vegevine, şerm e, tê hetka me bibe, Hovo li pêşîya Keşê zîvirî go Keşe tu dixwaze ez çarenûsa te jî bikim weke yê Hirçê Cezîrê, de bimeşe lê Xwedê ji te nestîne bi izetê navê Xwedê kim ezê vî kopalî di newqa te re bikişînim ku tu ne bide û ne bistîne! Çi serê te ji Quto têşihê.

Belengazê Keşe go bi Xwedê Hovo ye ne dîr e ku wisa bike hema emrê min ji Xwedê re.

Gihîştin Birca Belek derbasî hundir bûn nerîn ku wa ji mîra, mîreka, gundiyan, û xizmetkaran mir mir ji Bircê tê, hemî rûniştîne, Keşe silav li wana kir derbas bû, Hovo û Quto jî di nav pêlavan de qûna xwe berdane erdê... Mîr Bedirxan Beg taştê ji wana re xwest... taştê xwarin... Sebîlên wana dagirtin... bîna xwe berdan..

Mîr go Hovo ka were vir tenîştî min...

Hovo jî rabû li tenîştî Mîr û Keşê de rûnişt...

go Hovo te Hirçê Cezîrê kuşt?

go belê ezbenî...

Hovo de ka ji me re bêje te çawa kuşt, ev Bedirxan Beg jê dipirse?

Hovo go ezbenî weke ku tu Quto bî

U Keşe jî Hirçê bî,

û rahişte darê xwe ku bi ser serê keşê de berde Bedirxan Beg kire qîr,

go gidî vî hirçê Xwedê bigrin wê Keşe bikûje, dibê Sê Çareka xwe zer kirinê dar ji destên wîna der anîn...

bihnek têve çû Mîr Bedirxan Beg go ka ezê mêraniya Hovo biceribînim.

Ji nişkan ve xwe zerkire xavika wîna û go pixk.

Hema Hovo ji new de rabû rahişte dar ku bi ser serê wîna de berde go pixk û kuna Dê...

Dibê dîsa Bedirxan Beg li pasîvanan kire qîr go kuro wîna bigrin bi Xwedê wê min jî bikûjê...

Çîroka min çû diyara

Rehme li dê û bavên xwendevan û guhdaran.

Roja Helbesta Kurdî li derve 2013, li dar dikeve



Ji sala 1993 an ve, her sal, di roja koçirina seydayê Cegerxwînê nemir de, li rojavayê Kurdistanê, roja helbesta kurdî tê pîroz kirin û li dar xistin. Herwiha li derveyî welêt, li Elmanyayê jî tê pîroz kirin û helbest tîn xwendin.

Di roja li dar xistina Roja Helbesta Kurdî li derve ya sala borî 2012 an de ku li bajarê Essen-Elmanya li dar ketibû, komê ji helbestavanên Rojava û hin ji perçeyên din ê Kurdistanê beşdarî rojê bibûn û helbest xwendibûn. Bi çalakiyê re du pêşengeh hatibûne li dar xistin. Du şewekarên jin ên navdar Cihan Brahîm û Jengîman Omer bi tabloyên xwe dîwarên keleha çalakiyê xemilandibûn. Her wiha nivîskarê kurd Jan Dost ji aliyê komîta birêvebir ve hatibû xelat kirin.

Emê di nêzîktirîn wext de dest bi name û vexwendinan bikin, emê hewl bidin ku ne tenê helbestvanan amade bikin, daku helbestan bixwînin, belê emê hewl bidin ku cewerê baş amade bikin daku li helbestvanan guhdarî bikin. Em ji her kesî hêvî dikin ku li vê roja dîrokî amade bibin û li helbesta xwe ya kurdî guhdarî bikin.

Her wiha emê di nêzîktirîn wext de hemû agahdariyan, cih, kat, roj û navîşana roja helbestê biweşînin. Herwiha, emê hewl bidin ku ji bo rengînkirina wê rojê hin hunermendên şewekar amade bikin daku dîwarên holê bi tabloyên xwe bixemilînin, jixwe wê ew roj bê muzîk û strana kurdî jî derbas nebe.

Em wek Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûri û Komela Nûbuhar bang li dezgehên ragihandinê dikin ku li vê roja helbestiyane amade bibin û deng û hêza helbestê ragihînin.

Li dawî, em bi kêfxweşî mizgîniya li dar xistina Roja Helbesta Kurdî li Elmanya di meha cotmehê de radigînin, û dibêjin li bende agahiyên nû bin.

Zimanê me, hebûna me ye.

rojahelbeste@gmail.com

Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûri

Malpereka zimanê kurdî li Îranê hack bû



Zimanê Kurdî pênaseya gelê kurd e û dijminên vî zimanî ji bo binaxkirina vî zimanî bi sedan sal hewl dan lê bi ser neketin. Di roja îroyîn da, gelê kurd hişyar bûye û ji nixên xwe xwedî derdikeve. Yek ji nixên herî girîng a neteweyî zimanê kurdî ye ku sînorê dîn, bawerî, erdnigarî, ... dişkêne û hemû kurdan bi hev va dike. Werîsê herî xurt ê yekîtiya kurdan zimanê wan e û dijminên kurdan ji vê yekê hez nakin.

Dijminên zimanê kurdî hewl didin kurdî wek zimanekî lawaz û bêhêz nîşan bidin lê bixwe baş dizanin ku wisan nîne.

Malpera www.dibistan.ir ku li Rojhilatê kurdisatnê bi kurmançî û farisî taybet li ser kurdiya kurmançî kar dike di du rojan da du caran ji aliyê dijminên zimanê kurdî va hack bûye û sebeb jî çalakkîna vê malperê di warê ziman da ye ku ji aliyê kurdên Rojhilat bi taybet ên Xorasanê va gelekî tê pêşwazîkirin.

Li Xorasanê dijminên zimanê kurdî bikaranîna alfabeya latînî bo kurmançiyê wek sîc û alfabeya gaviran dizanin! hal ku bixwe bo hînbûna zimanê înglîsî bi latînî serê hevdu dişkênin. Armanca wan ew e ku bi rêya qedexekirina alfabeya latînî peywendîya çandî û zimanî ya kurmançên Rojhilat û yên deverên din bi taybet Bakûr qut bikin.

Malpera navlêbirî bi birêveberiya Elî Paksêrêşt (Makûyî) di pêşvebirina bikaranîna kurmançî bi alfabeya latînî da roleka girîng listiyê û loma jî rastî êrişîn nemirovane tê.

Bêkes Têlo

SÎNEMA ...

PASWORDA PÊŞKETINA NETEWAN E !.

*SÎNEMA AX ...SÎNEMA !.

Ji kêlîka damezrandina sînemaya bê deng, ser destê herdu birayên LÛMYÊR ve, ta îro, sînema gavên zêrîn û giranbuha avêtiye. Giringiya sînema ew e ku berhemên gewre bûne film bo bîner an re ,pir berhemên payebilind, çî ji mijar an jî, ji romanên gewre pêşkêş kir ye. Jiyanên cuda ji jiyana mirov û civakan ,ji rûdanên aborî, ramiyarî û çandî, bi rengekî hunerî anî ye ser êkranê .Sînema helwesteke bo dîtina xwe û yê dîtir ,bi rengekî hunerî ji pirsgirêkên curbecur ku di civatê de cîheke digrin. Sînema ked û berhemeke hunerî, afirandinek ramanî xwedî armancên îdeolojî ye. Kare civakan bi şeweyekî spehîti ,exlaqî û bisîxolojî birêvebibe.

Û bibe alavekî derbirînî ji rewşa civakî, ramiyarî û çandî re, an jî ,bîneran bigihîne tahlûkê û encamên ne erênî, normên nizam û hişyeriyeke rûxandî û ne calak li ba mirov çêbike. Xelaka herî giring ew e, ku armanca sînema perwerdeya zewqa huerî û spehîti ye li ba bîner pêkbûne. Loma pêdiviya me bi çanda dîtwerî û çavên zîrekane heye. Pir şaşin ew kesên ku dibêjin, sînema kurdî nîne. Sînema kurdî weke îndostri nîne, lê weke huner heye. Giringiya sînema weke şaxek ji huner û çandê, bi hêmbêzkirina wêje ,dîrok û mûzîk rola wê pir serbez e .

*EM JI CIHÛYAN NE KÊMTIR IN !..

Kes weke Cihûyan ,di hunera sînema, wêje û masmedya de ,serkeftî jidayîk ne bûye. Cihû peredaksal in, çimkî hiştin cihan bi hewara trajîdiya wan ve bê û bilive. Hêza masmedya û sînemayê, bi rengekî zîrekane xebitandin .Lihêviya cihanê ne man, ku bi dilovanî li rewşa wan temaşe bike .Lê ew berê xwe dan cihanê, bi riya masmedya , huner, wêje û sînemayê, qulan di valhiyê de vekirin .Bo cihan wan bibînin û bi trajîdiya wan hest bibe.



Lê em jî nekêmî wan in, cudahî di derfet û îmkanan de ye û nebûna dewleta me .Tevlî veya jî, me di warê sînema de ,cihekî berz girtiye di nav netewên cihanê de, eger em bizanibin ku bêhtir ji 193 dewlet endamên Yekitiya Miletan hene. Tenê navê 10 dewletan di pêşbirk û fêstîvalên navnetewî de derbas û berz dibin. Li pir welatan film sazîkirin tûne ye, mîna dewleta kûweyt ê.



Di pêvajoyê û dîroka sînema de, pir dibistan û şewê sazîkirina film hatiye peydakirin. Mîna dibistana derbirînî a Alamanî, sûryalî, rêyalîzm û sînema filmê reş, a şorêşgerî li Sovyêtê ligel a remyarî li Îtalyayê paşê ya rêyalîzmê û pêla nû ya Firansî û vê dawiyê sînema danêr.

*NIVŞÊ NÛ JI DERHINÊRÊN ME

Bêguman Y. Guney bi tenha xwe ,şorşek lidarxist bi filmên xweyî ên cuda ,bi şopandina dibistana „pêla riyalîzmê „a Îtalî, ku cihekî berz di nav sînema cihanê de girtbû.

Filmên Guney bi giyanekî kurdî têrbû, ligel mûzîk û stranên kurdî tevî ku zimanê Tirkî bikartanî . Pir xelat wergirtine, ta giha xelata fistêvala „KAN,, ser filmê „Rê,, bihevbeşî bi derhinerê Yûnanî Kostas Gavras re û filmê wî „wendabûyî,, xelata zêrîn wergirt in. Guney rê ji nivşê nû re, ji derhinerên kurd mîna Bahmen Qubadî, Huner selîm „Jano Rojbeyanî, Hadan Îpekçî, Jamil Rostamî w. d ,vekir.

Ku şopandina dibistana „pêla Nû „a firansî dikin ,ku derhinerên binavûdeng mîna Franswa Tirîfû û Jan Jak Gwardê rêbertiya wê dikir in û belav kir in. Ev derhinerên kurd bi serberzî xalêten navnetewî wergirtine û bi serberzî filmên kurdî ji asteya netewî, derbasî asteya navnetewî kirin .Ligel ku filmên kurdî dagirtî ne ,ji merez û nalîne ji rewşa ku gelê kurd tede ye, lê di eynî demê de, tîjîne bi peyaman ji ramanên mirovahî û aşitîyê. Bîner bi dil û can bi çarenûsa lehengan re ye ,bi wan kesên ku tekoşînê dikin, hest dibe. Bo parastina nasnameya xwe ku ticarî bê hêvî nabin, bo azadiya xwe bidestbixîn in. Ligel hevçerx bûna ew filmên kurdî di qada sînemayê de, bi pir gavan li pêşiya sînemaya Ereban e, tevî wîqas sal ji avakirina dewletên wan.

*HUNER SELÎM Û BAHMEN QUBADÎ

Huner Selîm xwediyê pirtûka „Tifinga bavê min,, ku bo 30 zimanî hatiye wergerandin. Pir naskirî ye ji rexê rexnegirên sînemayê ve, ku filmên wî di pêşbirk û festivalan de ,an bejdarin û an jî, xelat wergirtî ne. Huner derhinêr, nîgarkêş û nivîskare, ew ê netewa kurd ,çawa pê ne serberz û bilind be?! Huner û Bahmen xwedî nêrîn û helwest in di jiyane de, hewl didin di filmên xwe de vê helwestê nîşanî me bikin. Bi rengekî xweşik, bi afirandineke pir stêle, tevî tûjbûna mijaran ku radîxîn in li hember bîneran bi serfirazî xalêten navnetewî bi destxistin. Ew filmên ku listikavanên wan amator in, kesên ku jiyana ti guhdan ne daye wan û jibîrkir ye. Çawa dijîn, jiyana wan çawa derbas dibe?. Çarenûsa van lehengan ,ev herdu derhinêr tînin beramberî me. Lehengan xwedî rûyên bi keder, mişt şîni û ramanbûyî, serbestiya axaftinê û bêdengî didin wan bi hêviya ku peyama wan bo bîner bête gihandin. Sînor ,zîndan, jin ,zarokên kurdistanê, û civaknasiya civaka kurd cihekî giring di filmên wan de digre.

Bi gelmeperî mirov û çarenûsa wî, navenda hişyara van herdu derhinêr an dikşîne, giyanê xwe dixin film de û şopa sînema welatên rojava dişopînin in. Huner û Bahmen hewl didin xwe ,wê nêrîna ku li ser sînema a nizm heye, biguherînin.

Sînemaya ku riya Holyudê bi filmên şo û akşin û armancên hişbira mirov dikin ,ser rastbikin. Ku sînema alaveke derbirîn û ronîkirina mirovan

e, deku cihê xweyî xwezahî bigire.

Sînema bêriya gel ane, armanca wê berwerdeya zewqa hunerî ye û bedewbûn e. Dem hatiye bi baweriya min ku ev herdu derhinêr ,di qurziya çavên xwe de, pirsgiregên gandalî, siwarbûna yasayê û pirsgirekên ciwan an derbas bikin. Welê jî di ragihandina kurdî de, kêmasiyeke pir mezin heye, ku ta niha kovarek sînemayî ne ahtiyê çêkin. Bo raxistina pirsgiregên sînema ji aliyê pisporan ve û bînerê kurd agahdar bikin. Ji berku em bixwazin, nexwazin sînema pasworda pêşketina netewan e.

Erkek mezin jî li milê ragihandina (nivîskî , dîtwerî, bihistî) kurdî dikeve ku valahiya nebûna lêkolîn û pêveçûnên li ser sînema dagire. Lêkolînên ser sînemaya cihanî, bo afirandina nivşekî kurd, ku xwedî bandor be di tevgera sînema kurdî de .

Filmografiya Huner Selîm :

- 1997 — Her bijî hev jîni û azadiya kurdistanê / Vive la mariee... et la liberation du Kurdistan /
- 1999 — Hilgîrên xewn an/ Passeurs de rêves /
- 2001 — Tenêti / Absolitude /
- 2003 — Vodka lêmon / Vodka Lemon /
- 2005 — Kîlomitir nîne/ Kilomètre zéro/
- 2007 — Li binya peştên Parisê / Sous les toits de Paris/
- 2009 — Paş dawerbûnê / Après la chute/
- 2011 — Eger tu bimirî, ez ê te bikujim / Si tu meurs, je te tue/

Filmografiya Bahmen Qubadî :

<i>Golbaji/Golbaji/</i>	1990
<i>A Glance/kurte bahsek/</i>	1990
<i>Again Rain with Melody/dîsa baran bi awaz /</i>	1995
<i>Party/Aheng/</i>	1996
<i>Like Mother/mîna dayê/</i>	1996
<i>God's Fish/Masiya yezdan/</i>	1996
<i>Notebook's Quote/hin hevok ji tîbîname/</i>	1996
<i>Ding/zîngl lêdan/</i>	1996
<i>Life in Fog/jiyan di mijê/ de</i>	1997
<i>The Pigeon of Nader Flew/Firîna kevoka Nadir/</i>	1997
<i>Telephone Booth/kîyoska telêfonê/</i>	1997
<i>A time for drunken horses/Dema hespên serxweş</i>	/2000
<i>Songs of My Motherland /strana Dayîka Niştîman/</i>	2002
<i>War is Over /Ceng qedya/</i>	2003
<i>Daf/Def/</i>	2003
<i>Turtles Can Fly /Kûsî jî dikarin bifirin/</i>	2004
<i>Half moon /Nîvê heyvê/</i>	2006
<i>No One Knows About Persian Cats/Ti kes tiştêk ser pisîkên Îranê nizane/</i>	/2009
<i>Rhino Season/Demsala kerkeden/</i>	2012

Ezîz ê Cewo

PÊDIVÎYA ME BI RAST AXAVTIN, RAST NIVÎSÎN Û RAST XWEDINÊ HEYE

.... Xelek 1 .



...Piştî gotarên me yên li ser zimanzanîyê û pirsgirêkên rêzimana kurdî li bal xwendevanan pirs derketibûn holê, yên ku divê bihatana bersivandin. Pirsên xwendevanan ne yek bûn û ne jî – du. Di tomerîya xwe da, mirov dikare bibêje, ewan hema piraniya beşên rêzimana kurdî yên sistêmî – bi hemû pirsgirêkên xwe va hemêz dikirin.

Pirs pir bûn, û hemû jî pêdivîya wan bi bersivdayîna zanistî hebûn. Û di dema xwe da me bersivên wan pirsan dan û ew bersiv jî di weşanên me da gihîştin ber destê xwendevanên me (rojnameya „Kurdistana azad“, malpera PENa kurd a „pen-kurd.org“ û ya „www.amidakurd.com“). Lê van demên dawîyê di întêrnêta da xwendevan gelek pirsan didin hev û hewl didin bersivên wan bibînin (bi taybetî jî li ser rûpela „Rêzimana kurdmançî“ – <http://www.facebook.com/groups/rezimana.kurdmanci/permalink/464540673570781/>).

Helbet eva bi serê xwe tiştê baş e, ku ciwanên me bi pirsên zimanê dê va mijûl dibin, lê piştî van govtûgoyan tiştên bingehîn zêde namînin, ango, ew zanînen ku dertên holê, bi zanistî nabin sistêm û peyra jî kêma kes dikarin sîdê jê wergirin (heya xudanên pirs û bersivên bi xwe jî!).

Û, wisa bû, ku em bi xwe jî beşdarî bersivandina hinek pirsan bûn, me nêrînen xwe anîn zimên, lê paşê jî me dît, ku ew pirs û bersiv dibihurin, û di bin da kêma tişt dimîne. Bi nêrîna me, wê çêtir bibûya, eger mirov ew pirs berevî çiyekî bikirana, bi sistêmî parî ser beşên cuda bikira û anegorî wê jî bersivên wan bi zanistî bida. Li ser pêla van mitalan ez hatim ser wê, ku bi bingehîn giraniya wan pirsên xwendevanên me di gotara me ya „Careke din li ser pirsên zimanzanîyê, zimên û rêzimanê“ da hatine bersivandin (<http://www.pen-kurd.org/indexalt.html>).

Û me ew gotara xwe wek bingeh hilda, anegorî pirsên nû hinek sererastkirin di wê da pêkanîn, hinek tişt lê zêdekirin û ew matêriala bi şewazekî nû pêşniyarî xwendevanên heja dikin. Piştî vê jî wê pirs derên holê, û ew pirs jî divê bîn bersivandin. Bersivên wan jî divê di nav çarçoveya zanista di derbarê zimên da bîn dayîn. Helbet, govtûgoyên di întêrnêta da wê bidomin, bila di nav xwendevanan da gengeşiyek rû bide, ew tiştêkî pêwîst û bi kêr e. Lê ji bilî vê, bila xwendevan pirsên xwe ji me ra jî bişînin (kordamad@yahoo.com), emê wan berevî ser hev bikin, bi sistêm bikin û bi zanistî bersivên wan bidin û ew bersiv jî wê wek gotarek a yekgirtî li ber destê xwendevanan hertim amade hebe.

Bi rastî jî pirs pir in. Lê, eger mirov wan bi sistêmî kom bike, ji wana gelek hev dubre dikin, ji bo wê jî heya radeyekê me hewl daye, wan pirsan, ên ku nêzikî yan mîna hev in, bikin yek û şewazekî zanistî bidin wan.

Dibe ku, ew bersiv, ên ku me ji bo pirsên xwendevanan amadekirine, baldariya hinekan têr bikin, lê li bal hinekan jî pirsên nû derxînin holê. Ev jî tiştêkî xwezayî û normal e:

di nava gengeşî û govtûgoyan da bingeha zanistê û rastîya wê hasil dibin û dertên holê. Ango, bi gotineke din, emê hewl nedin nêrînen xwe li xwendevanan ferz bikin. Pirs di wê daye, ku em bi hevra bi zanistî sazîya zimên têbigihîjin û wê bi

zanistî ravebikin.

Ji bo wê jî, berî ku dest bi bersivandina pirsên xwendevanan bikin û wan binirxînin, emê di sêrî da li ser hinek rastîyên zanistê û, di nav çarçoveya wê da wisa jî, li ser zanista di derbarê zimên da rawestin.

...Jimêjva hatye zanîn, ku yek ji hêmanên hêztirîn, yên ku zanistê pêş va dibin, ew pîrînsîp e, ku her tişt (an hema her tişt) dikeve ber şik û gumanê. Zanist wê demê dimire, dema qanûn û pîrînsîpên wê werguhêzî dogmayan dibin. Lê jîyana zanistê bê rawestan didome, lewra ku dawîya dawîyê her dogmayek ji hêla kesên konkrêt va dikeve ber şik û gumanê, û bi saya vê pîrînsîpê zanist li ser pêyan dimîne.

Ji hêla hemûyan va jî baş tê zanîn, ka mirovayî rêyeke çawa dîr û dijwar derbaz bûye, heya ku bi zanistî hatye piştrastkirin, ku ne ku roj li dora cihanê, lê, berovajî wê, cihan li dora rojê digere. Ji wê demê sedsal buhîrîne.

Û îro zanist bi gavên bi bawer berbi pêşva dilive. Bi saya destanînen wê îro pevgerêdana dorgerî (satalîteyî) heye: di navbera çend çavkêlkan (bîstik) da mirov dikare bi çiyekî cihanê yê herî dîr ra bikeve nava pêwendîyan. Em êdî di derbarê wê dorgerê da nabêjin, ya ku di kûraya ersê asmîn da digere. Îro pevgerêdana întêrnêti di navbera mirovan da bûye hêmaneke pêwendîyên herrojî.

Di dewrana me ya pêşveçûnên zanistî – teknîkî da li rex înfomatîkayê, programkirinê û raçavkirina kompyûtêrî zimanzanî hê jî yek ji şaxên zanistê yên here balkêş e û ewê hê jî wisa bimîne... Ji bo çî em gotara xwe bi rastîyêke weha kevn û xilmetbûyî destpêdikin? Ji ber ku li bal hinekan nêrînek a ne rast çêbûye, xwedêgiravî, zimanzanî karekî ne balkêş e, ku mijûliya bi wê va her tenê sergêjî û melûliyê bi xwe ra tîne. Hinek jî dibêjin, ku di derbarê zimên da êdî ji mêjva her tiş hatye gotin.

Her çiqas ev herdu nêrîn jî dîrî rastîyê ne, lê dîsa di bingeha van da heya radeyekê, ji hêleke dinê va, parek a rastîyê heye: bi rastî jî, mijûlbûna bi rêzimanê va bi xwe karekî ne hêsa ye. Û, her çiqas jî bo wê mirov neçar dimînin, ku gelek qanûn û binaxeyên têgînan ezber bikin, lê dîsa jî ew hem di axavtina zarkî, hem jî ya nivîskî da şaşîyan berdidin. Gelek caran mirov têngahîjin jî, ka vê peyvê, yan yeke din a konkrêt divê li ku û bi kîjan şewazî bê nivîsandin. Ka ew sînor, ê ku beşekî axavtinê ji yekî din cuda dike, li kura derbaz dibe? Çima, em bibêjin, di gelek rêzimanên cihanê da rengdêr jî wek navdêran tînan tewangdin, an jî bi zayend û jmarê ji hevdu cuda dibin? Yan jî, em bibêjin, li ku divê mirov cînavên pêwendî bi kar bîne, lê li ku –zêderan?

Dibe kû ji ber vê jî, ji bo ku serê xwe bi van pirsan ra neêşînin, hinek mirov di pirsên rêzimanê da terefê statûkoparêziyê digirin?

Lê dîsa jî dem bi dem pirs dertên holê: “Çima her tişt wisa azurukirî nîne û zelal naê makkirin? Çima mirov nikare yekawa di derbarê qanûnên rastnivîsandinê, an jî çemandina lêkeran da bibêje? Çima ewqas tiştên ji pîvanzagonên giştî der hene? Ev hemû ji encama kêmasîya zanebûnên me tê,

yan dîsa jî hinek dijhevîyên berbiçav hene?”

Hinekê bibêjin: “Ji ber ku her tişt diherike, her tişt tê guhartin!” –Ev jî rastîyek e, ya ku baş tê zanîn, lê dîsa jî her tişt wisa yekawa nîne.

Wisa jî tê zanîn, ku zanista di derbarê zimên da bi sedsalan heye, di derbarê zimanên konkrêt da bi hezaran berhemên zanistî, pirtûkên dersan, rêzimanên akadêmî hatine nivîsandin û weşandin, navend û înstîtûtên zanistî yên zimên lêgerînan pêk tînin, û, dawîya dawîyê, êdî şaxekî zimanzanîyê yê nû (êdî ne ewqasî jî nû!)-zimanzanîya matêmatîkî heye. Lê dîsa jî tiştêk heya dawîyê nehatye gotin.

Çi?

Dibe ku ew qanûnên kevnbûyî, yên ku mirovan demekê ji ber xwe derxistibûne, wek kevrê qesp (sert) guhartinan napejirînin, ji me ra dibin asteng û nahêlin, ku em pirsên heyî têbigihîjin? Ma ne, yên ku bi zimanzanîyê va mijûl bûne, ew jî mîna me mirov bûne. Û ji wana gelek jî ne ku pispors, lê amator bûne û nikaribûne wek profesîonalan her tiştî bibînin û bi zanistî ravebikin. Û ji bo wê jî ewana dikaribûn hinek pirsan têberdin, lê di hinekan da jî şaş bibin! Û em jî îro nikarin xwe ji qeyd û bendên wan „zanînan“ rizgar bikin, ên ku di salên zarotîyê da bi zorê tuje serê me krine?

Pirs in, ppirs in... pirs!

Dibêjin, zanist bi qanûnên xwe yên hindurîn, bi terzê xwe yê împûlsîv (bi teqînan) pêşdikeve:

li ser radeyek a pêvajoya pêşveçûnê gelek matêriyal û encamên cêribandinên zanistî komî ser hev dibin. Ev pêvajoya heya demekê jî didome, û dem pêra digihîje, ku li ser bingeha wan matêriyal û cêribandinên berevbûyî şaxê zanistê yê konkrêt derbazî çawanî (qualite) û naverokeke nû dibe. Û ji ber vê teqîn pêk tê, û tiştêkî nû- vekirina zanistî, dertê holê, ya ku wê serdemê di warê zanistê da dibe şoreşekê.

Piştî vê, demek dibihure, û careke din pêvajoya bîdençiyê tê, û ew, çî ku li ser bingeha wê vekirina zanistî çê bûye, li bal mirovan gav bi gav werguhêzî rastîya dawîyê –qanûna „xwedayî“ dibe û dibe dogma –asteng li ser rêya pêşveçûnê. Û bi wî awayî careke din ji bo teqînen nû bingeh tê danîn.

Û, wisa – her carekê...

Û, bê fitya, dem tînan –dibihurin, û teqîn pêk tînan. Û heya ku raman û sewdayê mirov hene, demajo wê xwe li ber hev biguhêzin. Heya ku mirov li ser heşê xwe be û li tiştên nû bigere û sewdayê wî berheman bide, ev pêvajo wê her bidome ...

Wek ku li jorê jî hate gotin, tu zanist bê pirsgirêk nabe. Berovajî wê, li ku pirs û pirsgirêk tunebin, zanist zû bi zû peyda nabe. Li ku pirsgirêk hene, li wir jî pêdivîya heş û sewda û zanistê dertê holê. Dema pirsgirêk û nakokî çêdibin, pêwîstîya zanistê çêdibe. Bi gotineke din, heya radeyekê, zanist bi xwe hunerê dîtina rêyên çareserîya pirsgirêkan e.

Pirsên Gulçna ji Bazîdê û Meûnê ji Batmanê jî bi vî şewazî digihîjin hev:

-Çi hewce ye, ku mirov wan pênc herfan li alfabêya Bedirxan zêde bike? Ma ne wê xelq bi herfên erebî dinivîsin û dixwînin, û ji ber wê dinya xirab nabe! Xwendevanên heja, di sêrî da divê bê gotin, ku tîpên erebî ji bo zimanê erebî hatine amadekirin, bi wan felsefe, çand, huner û wêjeya ereban hatine sêwirandin. Ew bi her taybetmendîyên xwe va hem ji bo zimanê kurdî, hem jî ji bo raman û gîyan kurdî xerîb in. Di vî warî da jî gotarên mamostayên heja dr.dr. Zerdeşt

Haco ("Alfêbêta Erebi û Zimanê Kurdî", <http://www.pen-kurd.org/>) û Huseîn Habaş ("Li ser elfabeya latîni kurdî", di heman cîyî da) hatine weşandin û li holê ne. Û, yek ji prînsîpên sereke, ya ku birêz Zerdest Haco di gotara xwe da dide pêş, ew e, ku "... *elfebêta latîni ya zimanê kurdî ... elfebêteke fonologî ye, angî tîpên wê fonem in*"

(binihêre, wisa jî: Ezîzê Cewo, "...Dîsa li ser pirsî alfabê",

http://www.amidakurd.net/qunciknivis/d%C3%AESA_a_li_ser_pirsî_alfab%C3%AA).

Li ser wê pirsê, ka wê دنیا xirab bibe, yan-na, bersîvek heye:

-Eger em dibêjin, ku raman, gîyan, çand, huner û wêje ya her netewekê cîhanek e, wê demê, belê, cîhanê xirab bibe-cîhana kurdî.

Naha jî li ser wê, ka hewce ye mirov pênc tîpan li alfabeya heyî zêde bike, an -na? Eger em bi zanistî nêzîkî pirsê bibin, ew pênc tîpên kêm (**ç, k, p, t, r**) divê di alfabeya kurdî da hebin.

Çima?

Ji ber ku alfabeya her zimanekî ji tomerîya fonemên (navdeng) wî pêk tê. Û fonem jî ew deng in, ên ku, dema di peyvê da bi dengê din tîpên guhartin, wateya wê peyvê tê guhartin, angî ew dibe peyveke din, an jî bêwate dibe.

Mînak:

ker-ker, kar-kar, ku-ku, ka-ka, kew-kew;

ker-ker, ber-ber, cêr-cêr, girik-girik, gur-gur, barîn-barîn;

par-par, pê-pê, paç-paç; ta-ta, tep-tep, tê-tê, terk-terk;

çar-çar, çirik-çirik, çeng-çeng, çem-çem.

Wek ku di van mînakan da jî tê xuyanê, ew herpênc deng fonem in, angî, rola wan a wateguhêzîyê heye, û divê her yekî wan, weke 31 dengên din, tîpa xwe hebe. An na, dîskrîmînasyon li wan foneman û peyvên bi wan sazûyî dibe. Dîskrîmînasyon zanistî! Û bêyî wan ew alfabê nivîşkan e.

Ji bilî wê, eger em bi wê prînsîpê nêzîkî pirsê bibin, emê wê demê tîpên **Êê, Îî, Ûû** jî pêwîst nebînin û wê demê alfabeya kurdî wê ji 28 tîpan pêk bê. Ji xwe gelek kurdî, dema nameyan di întêrnêta da dinivîsin, bi wî awayî dinivîsin. Angî ji bo **Ê û E, Î û I, Û û U** tîpên **E, I û U** bikar tînin. Lê ew name ne, û gelek caran yê ku dinivîsin jî di warê kurdî da an nexwendî, an jî nivîxwendî ne. Lê em li vir di derbarê xwendîna kurdî û xwendîtyê da diaxivîn...

Di gelek zimanan da bi tîpekê yek-du peyv hene, lê dîsa jî di ferhengên wan da beşê wan yek-du peyvên e cuda heye... (Binihêre wisa jî: Ezîzê Cewo, "Hinek nêrîn û raman li ser pergala zimanê kurdî û zimanzanîyê", <http://www.pen-kurd.org/indexalt.html>) Pirsî van herpênc tîpên kêm ên alfabeya kurdî bi serê xwe ne armançek e, eger em nivîsek a nenas bidin yekî/ê, yan bi xwe bixwînin, bixwînin, ev cudayîyê destxweda xwe bide xuyan (li pêveka gotara "...Dîsa li ser pirsî alfabê" binihêrin!). Ji bilî wê, em tenê çend mînakan binin, ka ji ber kêmasîya van tîpan xudanên nivîsa kurdî serî li çî rêbazan didin, ji bo ku nivîsên wan ji hêla xwendevanan va rast bêne tîgihîştin û xwendin:

„Silav û rezên germ û **gurr** ji Kurdistanê“

(Ji daxuyanîya Desteya Weşana Agirî)

„... Yek „Bayê Qible“ ye ku ji aliyê başûr ve tê, bayê din jî „Bayê Kur“ yan jî tenê „bakur“ e ku ew

ba ji aliyê çiyarêza Qefqasan ve tê.

Tîpa „r“ ya di peyva „kur“ de qalind tê bilêvkin, yanî **BAYÊ KURR** an jî tenê **BAKURR** tê gotin, lê kes nabêje „Bayê Kûr“.

(Ji gotara Zeynelabidin Zinar a „Bakur û Bakûr“, li ser malpera Amîda Kurd)

„Her şaîrek **surrek** heye

Her şahekî **durrek** heye“

(Ji helbesta Şêrzad Zeynelabidin a „Her şaîrek“, li ser malpera AmîdaKurd)

„Navê gundan: Kemûk, Emerka, Xweşika, Reşika, Kera (**ji kerê nayê, ji kerbûnê tê**), Hewrê, Mala Maşo, Malê Gewra, Geresor, Şerefka, Gerger, Cimika

(Jî nameya Mazhar Zûmrût ê Amedî)

Mînakên weha – çiqasî bixwazin, lê j bo bê tîgihîştin, ev jî bes in!

Ev tê çî wateyê? Angî, li her cîyekî, li ku divê ji wan pênc tîpên kêm hebin, li wir pêdivîya şiroveyên weha dertê holê. Hinek wek wan camêrên jorê şiroveyan dikin, lê bi giranî bîyî wan şiroveyan dimînin, û xwendevan û pirsgerêka „Gelo divê ev çawa bê xwendin?“ bi hev ra rûberû dimînin.

Pirsek jî ji Şamê Bavê Bêrîvanê şandye:

- *Ma ev gotaranan ji bo çî ne, ewqas pirtûk û gotar hatine û tîpên nivîszandin, û hemû jî ji hev fehm dikin, êdî ev pirsgerêkên han ji bo çî ne?*

Dostê hêja, ma, eger em li ser wan pirsgerêkan neaxivin, pirsgerêk wê tunebin? Ew pirsgerêk hene û divê bêne çareserkin (Wek pirsgerêka kurdî!), eger ne îro, zarokên me wê hewl bidin wê çareser bikin. Pirsî hevfehmkirinê tiştek e, rast û bê kêmasî nivîsandin û axavtin- tiştekî din.

Di nava gelên xwedî ziman û wêjeya pêşkevî da jî mirov hene, yê ku dema nivîsandinê şaşîyan têberdîdin, an bi şaşî diaxivin, lê li rex van di nav wan gelan da, yê ku zimanê xwe yê wêjeyî paqij dizanin, hene: pîspor û mamostayên zimên, rojnameger, nivîskar û helbestvan, bîjer û artistên têatro û sînemayan. Angî di nav civakên wan da yê ku zimên dizanin û yê ku nizanin, an jî baş nizanin, jî hevdu cûda dibin. Û pîsporên zimên (û ne ku mirovên amator!) li ser pirsgerêkên rastnivîsandin, rastaxavtin û bîngêrên rêzimanê radiwestin û lêgerînên xwe diweşînin. Anegorî wan qanûnan bi zimanekî paqîş û bê şaşîyên rêzimanî pirtûk, kovar û rojnameyan diweşînin.

Lê rewşa gelê me cuda ye. Wek ku me li jorê jî got, di nav me kurdan da nexwendîtya zimanê dê bi dîrokî bûye “desthilatdar” û hê jî serdest e. Gelê me heya naha jî bi sê alfabeyan dinivîse û dixwîne. Pirsgerêkên alfabeya heyî, nerûniştîbûna qanûnên rastnivîsandin û rastaxavtin zimanê kurdî, dibin sedem, ku mirov nikaribe bi kurdî rast biaxive, binivîse û bixwîne.

Û ev pirsgerêk, ên ku bi obyektîvî hene, divê bêne çareserkin, jî bo em- kurd, wek netew, bi zimanê xwe yê dê rast û paqij biaxivin, binivîsin û bixwînin.

Naha jî em li vir çend mînak ên şaşîyan binin, ên ku di weşanên me ên cuda da rastî mirov tîpên: “Me **te** li jor jî dîtîyê û li jêr jî!”

“Rewşenbîrên Başûrî serkevtina DTP'ê **pîrozkir**”

“... Ez qurbana wê dayîkê, ku te anye dinyayê!”

“Min bihîstye, tu nexweş **e**...”

“Davka minî delal.

Dayka minî helal!...”

“Min **te** dîtî li ser bîrê

Av dikşandî pê zincîrê!...”

„Ax û ava **Kurdistan**“

„Tevgera **jîn**“

„Tu kuda diçe?“

„Helwesta herî rast.“

„Amed xewna min a herî şîrin.“

Me li vir tenê çend mînak anîn. Lê şaşîyên weha ne deh, ne sed û ne jî hezar in. Dibe ku di axavtina rojane da ew jî sedhezaran jî derbaz bibin. Îro zimanê weşan û çapemanîya me di van şaşîyan da xeşivye, û nivîsên tîpên, li ser bîngêrên wan şaşîyan zimanê dê fêr dibin...

Ka emê çî dersê ji van hemûyan derxin, ew êdî girêfêrî helwesta we û asta lêgerînên zanistî û perwerdeya zimanê kurdî ye, xwendevanên hêja!

Huseyn Akbal (Stanbol) dixwaze bizanibe:

- *Balkêş e, ew tiştê ku tu dibêjî, tenê tu dibêjî, yan li cîyekî din jî heye?*

Xwendevanê hêja, dibe ku bi sêwazê ku em dibêjin, li cîyekî dinê nîbe. Ew jî ji wê rewşê tê, ya ku îro em gihîştinê. Lê, bawer bikin, di vî warî da em, wek netew, gelekî paş mane. Dibe ku ew qasî gunehê me nîne, qîqas- bedbextîya me (zimanê me timê bi qedexê û tunekirinê ra rûberû bûye, merc û derfetên pêşketinê nînbûne), lê ew nayê wê wateyê, tiştê ku îro em bikin, nîne. Wek prînsîp, wek pêdivîya bikaranîna qanûnên zimanzanîyê di rêzimana kurdî da, pêwîstîya wê êdî ji zûva pêra gihîstye. Zimanzanîya giştî heye, rêzimanên zimanên cuda yê cîhanê hene, û ev hemû di nava ahengîyê zanistî da tîpên pêkanîn û meşandin. Dem e, ku em, kurd jî cêribandina zanista di derbarê zimên da ji bo lêgerînên zimanê kurdî bîngêr bigirin... Dema serdema sovêti di sazîya Akadêmîya zanistî û zanîngehan da kar û xebateke girîng û hêja di vî warî da hatye meşandin. Divê em van hemûyan ji karê xwe yê lêgerînên zanistî û perwerdeyî ra bîngêr bigirin, an - na,... nizim çawa bibêjim, dikare wisa derê, ku em piştî cêribandin û pêşveçûnên sedên salan ra di vî warî da, „jinûva duçerxê (pîskêlêt) ji ber xwe derxin“.

Li ber çavan e, ku pêwîstîya me (wek netew!) bi rêzimanê zanistî (akadêmî) heye.

Her weha hate gotin, ku rêziman bi xwe ne mijûlîyêka hêsa ye. Heya ew ziman, ên ku êdî bi sedsalan e, bi wan xwendin û nivîsandin heye, li ser rêzimanên wan lêgerînên zanistî pêkanîne, bi wan zimanan dibistan, xwendegeh, zanîngeh hebûne, bi wan wêje, huner, çand û rojnamegerî pêşketine, dîsa hem di axavtinê da, hem jî di nivîsandinê da gelek şaşî û çewtî tîpên berdan. Û ji bo wê jî her netewek bê rawestan hewl dide, ku zimanê xwe baştir nas bike, qanûnên wî ên hindurîn fêr bibe û bide fêrkirin. Ji bilî wê, ewan bi demê ra bîngêrên şaşî û kêmasîyên zimanê xwe dîtine, ew naskirine û ji holê rakirine, an jî di rêzimanên xwe da werguhêzî (rêform) pêk anîne.

Û ji ber ku ziman sazîyêke zindî ye û hertim di nav guhartinan da ye, sererastkirin, guhartin û rêform hertim rêberên jîyana wî ne .

Lê ya zimanê kurdî ?

Li ser vî pirsê, li ser hêlên wê yê cuda di dema xwe da me rêze gotar nivîsîne, heya me hewl jî daye, di weşanên cuda da bersîva pirsên xwendevanan bidin, lê dîsa jî, wek ku tê xuyanê,

her çiqas diçe, li bal xwendevanên me pirsên nû peyda dibin û her carek dibe destpêkeke nû...

Ê, me jî xwest, di nav çarçoveya bersivandina wan pirsan da hinek nirxandin û nêrînen xwe bi xwedevanên hêja ra parvebikira.

Weha, Bedrêddîn ê ji Dîlokê, Sedat ê ji Sasonê û Belgîzer a ji Wanê dipirsin:

- *Tiştê balkêş e: nivîsên te di çapemanîya kurdî da tîn weşandin, di hinek cîyan da ew wan ne wek rastnivîsandina te diweşînin, lê yên ku wek te diweşînin jî, di bin da dinivîsin, ku ew ya te şaş dibînin.*

Ev tê çi wateyê? Li vir kîjan rast e? Emê kengê bi rengê binivîsin?

Dema mirov bi zanistî nêzîkî pirsgrêkên heyî dibe, sedemên wan ên obyektîv têdigihîje: ji ber ku perwerdeya bi zimanê kurdî bi sistêmî tunebûye, û îro her kurdek zimanê biyênî û serdestan ji zimanê xwe yê dê baştir dizane (û, ev yek jî bêtir tragêdî û ne ku gûnehê wan e!); nexwendîtiya zimanê kurdî, ya ku bi dîrokî di nava me da bûye "desthilatdar", hê jî serdest e, û di warê nizanbûna zimanê kurdî da yên zane û nezan heya radeyekê weke hev bûne; heya naha jî gelê me bi sê alfabeyan dinivîse û dixwîne (ew jî wey li wê nivîsandin û xwendinê!); pirsgrêkên alfabeya heyî, nerûniştîbûna qanûnên rastnivîsandin û rastaxavtinê di rêzimana kurdî da dibin sedem, ku îro di warê zimanê kurdî da ewqas pirs û pirsgrêk hebin...

Û ev hemû jî ji hêla xwe va dibin sedem, ku kurd nikaribin bi zimanê xwe rast û bê şaşî binivîsin û bixwînin...

Ji dema pêwendiyên me yên yekem ên bi giranîya weşanên me yên li welêt û derveyî welêt ra û heya îro timê jî li ser pirs alfabê û rastnivîsandina kurdî goftûgo û gengeşî derketine holê.

Di destpêkê da em bînteng dibûn.

Heya em gihîştin wê biryarê, ku, çêtir dibe, nivîsan ji tu weşanekê ra jî neşînin.

Piştî demekê, hinek weşanên me careke din daxwaza gotaran ji me kirin. Wê demê me gotarên xwe ji wan ra şandin, lê- bi mercekî: "Eger hûnê biweşînin, biweşînin, wek ku heye, eger- na, çêtir e, neweşînin!" -Ji ber çi?

Hinek gotarên me di hinek cîyan da hatine weşandin, pirsên alfabê û rastnivîsandinê daynin hêlekê, guhartinên wisa ketibûnê, ku me bi xwe gotarên xwe nasnekin.

Belê, dibe ku heya radeyekê ev yek hinekî girêftî faktora kesî ye, lêbelê, pirsgrêkên zimanê me yên nivîskî ji kûr û dûr tînin. Û îro ev pirsgrêkêna di nav me da hêdî- hêdî dibin qanûn, dibin şewazê nivîsandina kurdî ya bi giştî. Û ya ku netavetiyê dide mirov jî ew e, ku ev yek îro bûye desthilatdar û nêrîneke din nayê pejirandin. Eger carna tiştê bê weşandin jî, divê bê nivîsandin, ku ew bi wî şewazî hatye weşandin, ji ber ku xudanê gotarê bi xwe wisa xwastye, û ew bi xwe jî wê şaş (!?) dibînin. Balkêş e, ne? Ew şaş dibîni! Anegorî kîjan qanûn, an pîvanan, anegorî kîjan zanistê? Ma ne zaniest li hole ye!?

Ma gelo, ev jî bi serê xwe şeweyekî redkirina nêrînen din nîne? Wê demê, gelo emê ji rêjîmên serdestî welatê xwe bi çi cuda bibin? Êdî azadîya gotinê li ku ma, êdî dadwerî û demokrasî li ku ma? Êdî em di derbarê zanistê da nabêjin, a ku bi van rêbazan tê tevîandin.

Lê helwestên ji vê cuda jî hebûne: "**Li ser daxwaza ... me dest nedaye nivîsê û sererast nekiriye...**" Heya radeyekê em têdigihîjin (lê her tenê - heya radeyekê!). Ji ber ku di warê rêzimana

kurdî da em hê negihîştine standartekê, û her yek, çawa dizane, an çawa dixwaze, wisa jî dinivîse. Û ev jî bi giranî ne li ser bingeha zanistê ye. Ji bo wê jî, eger xwendevanek pîrî-hindikî bi qanûnên zimanekî ra nas be, wê dest xwe da pirsê bide:

- Çima?...Kanê pîvanên rastnivîsandina zimanê kurdî? Mirov çawa dikare rêya bi zanistî standartkirina wan bibîne?

Ji bo wê jî, ji bo yek ji yekî/e din ra nebêje ew şaş e, divê li ser bingehên zanista di derbarê zimên da (zimanzanîya giştî) li ser pirsgrêkên zimanê dê bê rawestandî û bê goftûgokirin. Tiştê ku mirov ji cêribandin û encamên lêgerîn û lêkolînên zanistî yên di cihanê da hilde, pîr in. Ji bilî van, di Yekîtîya Sovêtê da ji sala 1921-î û vir va di warê zimanê kurdî da gavne girîng hatine avîtin: sê alfabê hatine amadekirin û bi wan weje, huner û çanda dewlemend hatine sêwirandin, di dibistan, xwendegeh û zanîngehan da perwerdeya ziman û wêjeya kurdî hatye dayîn, rojname, pirtûkên zimên û wêjeya kurdî hatine weşandin, di sistêma akdêmîya zanistî da di warê ziman û wêjeya kurdî da lêgerîn pêkanîne, radîoya Yêrêvanê bi kurdî weşan kirine...

Û, ger em îro van hemûyan daynin hêlekê, li ser réalîta zimanê kurdî çavê xwe bigirin û di bin bandora zimanên bîyanî da, bi çavê bîyanîyan li zimanê xwe binihêrin, gelo emê çi serbixin?..

Belê, pirs û pirsgrêkên zimanê kurdî pîr in, û divê bi bêhna fireh li bersivên wan ên zanistî bigerin, li ser bingeha wan konsêpteke zanistî û hevbeş derxin holê. Her pîrsek jî bersîva xwe heye û ew bersîv jî di bingeha zimên da ye. Her dimîne, ku mirov bikaribe wan bibîne û bi zanistî derxe zanebûnê.

Nûrîye ji Amedê dinivîse:

-Evê alfabeyê em ji pîrhevoka erebî rizgarkirin, naha jî hûn dibêjin ew ne rast e! Çawa dibe?

Di sêrî da divê bê gotin, xwendevana hêja, ku li vir pirs rastî -nerastîya alfabeya latînî naê govtûgokirin. Pirs di wê da ye, ka em wê alfabeyê ji bo zimanê xwe çiqasî rast bikartînin... Hew!

Eger xwendevana me ya hêja gotara me ya „...Dîsa li ser pirs alfabê“ bi baldarî xwendibû ya, wê di wê da rastî van gotinan hatibûya: „... alfabeya erebî piştî êkspansîya ereban li gelê me hatye ferzkirin. Ew hêmanek a erebkirina gelan bûye. Ev alfabê bûye çekekê ji bo bişavtina çandî û tevkujiya sipî. Ji bo wê jî, di dema xwe da Bedîrxanê mezin, dema tîpên latînî ji bo kurdî hîlbijartye, xwestye gîyan û mejîyê kurdan ji êkspansîya erebkirîna û tevkujiya sipî rizgar bike û biparêze. Ji bo wê jî mîsîona dîrokî ya Mîr Celadet Bedîrxan ji bikaranîna vê alfabeyê mezintir e (her weha binihêre: Ezîzê Cewo, "Hinek nêrî û raman li ser pergala zimanê kurdî û ziman zanîyê", <http://www.pen-kurd.org/>, 26. 09. 2006 û wisa jî: "...Dîsa li ser pirs alfabê",

http://www.amidakurd.net/qunciknivis/d%C3%AEsa_li_ser_pirsa_alfab%C3%AA).

Bikaranîna alfabeya latînî bi serî xwe armancek nîne, ew derfetek e- ji bo armanca mezintirîn. Ji bo wê jî, eger îro ji hêla zanistî va hinek goftûgo li dora vê alfabeyê pêk tîn jî, ev tê wê wateyê, ku jîyan ranewestyaye, ku her tişt di nava liv û guhartinan da ne, ku jîyan didome... Û, ka gelo alfabeya erebî di jîyana gelê kurd da tê çi wateyê, ew jî di van gotaran da heye:

„...Ew çeka destê hêzên derva bûye, ji bo dagerkirin û bindestkirina mejî û gîyana me ya netewî; û, eger kurd bixwazin xwe ji bindestiyê rizgarbikin, divê berê pêşin xwe ji wê torê rizgarbikin,

rizgarbikin, a ku dagerkeran bi vê alfabeyê li dora ruh û mejîyê me hûnandine.“ (http://www.Amidakurd.net/qunciknivis/d%C3%A Esa_li_ser_pirsa_alfab%C3%AA)

Bi dîtina me, li vir helwestên me ewqasî jî ji hev cuda nînin. Tenê li vir pirs di wê da ye, ka divê em alfabeya latînî ji bo zimanê kurdî çawa rast bikarbin.

Pirsên Sedrêddîn ê ji Mêrdînê û Berfîna a ji Holadayê mirov weha dikare tomar bike:

-Ev çend dehsal in, kurdan bi vê alfabeyê nivîsîne û îro jî dinivîsin, hûn çima dixwazin wê biguhêrin? Ma ne Bedîrxanê nemir li ser wê û ji bo wê ewqas ked rêye!

Belê, hûn rast in, xwendevanên hêja, lê di dîroka kurdan da ne tenê ev alfabê hebûye. Hê berî serdema Îsa alfabeya kurdî hebûye. Di sedsala XX da tenê di Yekîtîya Sovêtî da ji sala 1921 -1948-an sê alfabeyên kurdî hatine amadekirin (li ser bingeha alfabeyên ermenî, latînî û kîrîlî), û bi wan wêjeyek a dewlemend hatye sêwirandin (li ser vê mijarê wisa jî binihêre: Eskerê Boyîk, „Ji dîroka elfebên kurdî li Ermenîstanê“, ([www.amidakurd.com/index.php?option=veng_content &task=view&id=2522&Itemid=69](http://www.amidakurd.com/index.php?option=veng_content&task=view&id=2522&Itemid=69) û wisa jî: <http://www.celadet.com/modules.php?name=News&file=article&sid=236>).

Ya din jî, em bizanibin-nizanibin, bixwazin-nexwazin, bi obyektîvî zimanê kurdî li holê ye, û sazîya deng an vî zimanî jî 36 fonêman pêk tê, û her fonênek divê di alfabê da tîpa xwe hebe. Ango, di alfabeya heyî da (ew kê jî amade kiribe!) pênc tîp kê in. Û li vir pirs alfabê, rêzimana kurdî û zanistê û pirs kesayetiya Mîr Celadet Bedîrxan tiştne ji hev cuda ne. Di dîroka zimanzanîya cihanê da navbilindên wek *Vilhêlm fon Hûmboldt, dê Sosyûr, Yêsperson, Maks Myûlêr, Mêyê, Hyûbşman, Sêpîr, Şmîdt, Trûbêtskoy, Oratorskî* û yên din hebûne û îro jî gelekên wek wan hene, lê tû kes nabêje, ji ber ku vî, yan wî mirovî ev tiştê han weha gotye, êdî mafê hiç kesî nîne, ku tiştê din bibêje...Baş tê zanîn, ku qanûnên zanistê hene, û ew bi wan qanûnan pêşva diçe, û ne ku bi daxweza hinek kesan.

Lê ji bo xatirê rastiyê, divê rola her mirovekî rast bê qîmetkirin. Û rola Mîr Celadet Bedîrxan jî di dîroka gelê kurd da ne ji bo wê mezin û girîng e, ku wî li ser bingeha tîpên latînî ji bo kurdî alfabeyak amadekirye. Li ser vê jî me di gotarên xwe da nivîsye. Weha, yek ji wan: „*Bedîrxan, bê guman, mirovekî mezin e! Lê ew jî bo tiştê dinê mezin e: ji bo lehengîya di warê ramana netewî û welatparêziya kurdî da. Ew wek rewşenbîr û welatparêz mezin e. Li ser vê rêyê û ji bo vê armancê alfabeyêke wisa ji bo Bedîrxanê Mezin hêmaneke pêkanîne bûye.*

Ew jî, dema ewî alfabê amadekirye, merc û derfetên wê demê yên teknîkî hildaye ber çavan. Û wê demê jî merc û derfetên teknîkî pîr bi sinor bûne. Ji bo wê jî li hember hinek tiştan wî çavên xwe girtine. Armancek li pêşya wî bûye: çi dbe, bila bibe, bi tîpên latînî weşana kurdî pêkbîne, û anegorî zanînen xwe yên zimanzanîyê ji bo kurdî rêzimanekê amade bike. Û di vî warî da Bedîrxan rola xwe ya dîrokî listye. Gelê kurd evê yekê baş dizane û qîmetekî mezin dide lawê xwe yê mezin... Û hiç hewce jî nake, ku vî mirovê mezin bi amadekirina wê alfabê û di çarçoveya wê da binirxînin û qîmet bikin!“

(“Hinek nêrî û raman li ser pergala zimanê kurdî û zimanzanîyê” <http://www.pen-kurd.org/indexalt.html>)

Dîrokê her tiştî û her kesî di cîyê wan da daye.

BÊWAR BARÎ TEYFÛRÎ

OLDAR, MIROVAHÎ Û DEM OL, (BEŞA DUYEMÎN)



Ol ji bo pêşketinan rê vedikin, lê mixabin pêşengên (xizmetkarên)olan ên çewt,nezan ,xûjan hertim mirov şaş kirine,berê hev dane ,netîcêda mirov bûne kujer ê hevdu,OLDARAN MIXABIN DÎROKÊDA ÊN DÎROKÎ LI SER XWÎNÊ BIRYAR GIRTINE,BÎNA XWÎNÊ JI DÎROKA OLAN TÊ...

.Pêdivîya mirovan hertim li rastîyêra heye.

Ol di dema xizantîya mirovahîyêda pêşda hatine,ji bo perwerde û îdare kirina mirovanda ji demên ewlînva heya niha astek girîng leyîstine.Lê dema me dema tîxnolojîyaye,êpoxa zanîstîyêye, bê şilovekirina zanîstî ol gelekî besît û dezî xuya dibe Mirov ji bo ku bizanbin xweda çi ji me dixwaze û ji bo ku mirov jîyanêda têbigêhjin û zanebin û xwe nasbikin pêwîste bala xwe bidin hemû ola jî. Ol jî ji bo tîgêhîstina mirovan hertim xwendinê tovsîye dike.(ra divine),mirov ji bêşikê heya tîrbê pêwîste bixûne.(Îslam , Quran),bi gorî ola îslamê xwendina tîkûz mirovan kamîl dike,digihîne Lê bi hezar salane mirov hela hê jî ji reftara hovîtyê tam veneqetîyaye,rast nayê perwerde kirin.Dema hemdemîda jî hewl didin ola wek ceka bidin kar anîn û dikin jî,hertim jî weha bûye.Hêzên desthilatdar ên menfeetperest û nijadperest ji bo peywîr û berjewendîyê ol parçe-parçeyî kirine, mirov hemberî hevdu rakirine.Ji bo mînak Îslamêda sunî,şîe,vaxahîzm û y.d.,terefdarê van terîqata wek dujmuna hev dişopînin.

Usa jî olên din de cudatî çêkirine ku hertim mirov,bawermend qerebalixêdabin û di navbera wanda nerazîbûn hebe ,dijî hevdu rawestin. Di ola xristîyanîyêda jî çend mil hene,, katolisîzm, provaslav,protestant û çend terîqetê din jî hene,, babtîst,mêtodîst,advêntîst û y.d.Di navbera vanda fikrên cuda hene .Reqebat û nîfaq li nav wanda hertim didome, ev jî zîdîyeta pêşda tîne.

Bûddîzmêda jî parçebûn heye.Lê hemû jî yek xwedêbûnê qebûl dikin.Milyonava mirov rast nayên perwerde kirin wek fanata xwîna hevdu hildîşînin, hevdu qebûl nakin,lê encamêda mirovahî zîrarê dibîne.Weha mirovahî parçe-parçeyî bûye biçûk,bê hêz xuya dibe.Rewşa weha hêzên desthilatdar ên împêrîyalîst re dest dide, lewra çawa dixwazin usa jî mirovan îdare dikin, lewra nava mirovahîyêda yekbûn tunene

.Lê ol ji bo yekbûna mirovan pêşda hatine, ku hemberî zordestan rawestin.

Ol qanûn û zakonên xwedaye (îlahîye).Yên ku zakonên xwedara emel nakin rêya xirab da diçin axîretêda cîyê wan cudaye (cehenem-doje, cinet).Ol hemû jî nîşan didin ku mirov çiqasî zakonên xwedara rîayetê bikin ,saf û paqîjbin hevra baş reftarîyê bikin,xêrxwezbin,yekbin dunya me jî hawqasî yê bi disiplin û rehetbe,aşîtî û aramîyê hebe.

Ol derfeta yekbûna milyonaye a hemberî zulm û zorê lê mixabin îro ji vê mecalê pêk nay anîn.Ji bo ku mirov bi hevra dost û biratîyê bikin,wekhev bijîn,bi hevdura rêz bigirin,bi torebin,ji zulm zorê, ji hovîtyê dûr heriin pêwîste bi zanebin û bi zanîstî nêzînkî olan bin,ol vê ji mirovan cavra dikin.Mirovahî ji gelek xwedêbûnê hatîye yek xwedêbûnê sekinîye.Armanc ji eve hemû yekbin û hevdu fahm bikin.Bi vî awayî bi hezar salane mirovahî tî perwerde kirin.Lê hela hê jî ji exlaqa

antik tam xilaz nebûye.

Mirov hê jî rastî zulmê tîne.êrîşî hev dikin.hewil didin mirovan ,gelan tabê îrade xwe bikin,ji bo vê şera dikin,mirova hemberî hevdu radikin.Wîcdan tîne vemirandin.Wîcdan alema paqîj a hundurê mirovane.Xweda bi rêya olîva hewil dide wîcdana mirovan,alema hundurê mirovan bixemlîne, biparêze û tîr bike.Ji bo ku mirov zîrarê nedin hevdu xweda hertim xwendinê ji mera tovsîye dike.Lewra xwendin mirova digihîne.Mirovên tîgêhîstî,xwedênas ji rêya xweda dernayên,zulmê nakin,xwedanê menewîyatek dewlemendin.

Îro mirov,mirovahî hewceyî perwerda saxlem û zakonên xwedane.

Ji bo ku zulm,zor,înkâr ,êrîşkarî, koledarî, xizantî, desthilatdarîya durî , çewt a nijadperest, tîrs, bandor, bê fehmî cudatî ji hole were rakirin ol pêşda hatine

Dema meda jî bê menawîyyatî hewil dide desthilatdarîyê bike.

Mirov bê xweda nikare bijî.Gerek evîna xweda batîne (hundurê,ruhê)mirovanda hebe.

Lê heya niha mirovahîyê dîn zelal hezm nekirîye . Bi zakonên çewt dunya me tî îdare kirin,pîrsgirêk nayêne çareser kirin,mafê milyonan tî pêpez kirin,heyîn û hebûna gelan tî înkâr kirin,jîyana me rojaneda bûyerên xirab diqewimin,mirov nikarin mafê xwe biparêzin,her tişt tî kirîn firotanê,XWEDA bîra mirovan dertê,mirov ji bo malê dune hemberî hevdu radiwestin,hevdu xapandin,bê bawerî,şer ,bê edebî,bê exlaqî,hovîtyê dunya me radipêçe.Bi van pîrsgirêka,bi van bobelata va mirovahî kuda diçe, heya ku yê here,dawîya dunya me wê çawabe vê derbarêda pêwîste mirov bifikirin,biryarekê bidin,an xweda çi ji mirovan dixwaze gerek emel bikin,qanûnên desthilatdara ên nijadperest, yê çewt ,ên ku bi xwîna mirovan hatine nîvsarê bugehîrin, dunyak paqîj ava bikin,wekhevîyêda,azad,serbilind wek xûşk bira bi hevra bijîn, an jî li bin sistêma kapîtalîzmêda weha bê hêzbe, koletîyêda dunyake bê edeb,bê exlaq, bê sîyanetda yê birize dûrî zakonên xweda bê menawîyyat yê bimîne.Ev jî ji bo mirovahîyê bobelat û mirine.Belê cîhan mala me hemûyane ,xelata xwedeyê dilovane ji mirovahîyêra,em ji parçek ji vê mîrasêne

Lê mixabin em tîda sêwî û bê taqet xuya dibin.Lê heya kengê yê wehabe...

DUNYA ME NEREHETE. Dîwarên mala me berbi hilşandinêve diçe.....Teşvîşeke mezin pêş meye..

Dunya bi hewla hêzên desthilatdar, ên nijad perestva hertim di navbera sistêmada hatîye parevekirin, sînor hatine kişandin û rakirin,qedera mirov û gelanra leyîstine.

Dema hemdemîda jî bi milyona mirov deverên cuda-cuda de hemberî desthilatdarên temahkar, avanturîst dengê xwe bilind dikin,edaletê teleb dikin.mafê xwe teleb dikin.Ev mirovana bi rêya zanebûnêva tîgêhîstine,cav vekirîne,nayêne xapandinê û pê hesîyane ku azadî hestek îlahîye, aramî û dunyak bi edeb xasteke xwedaye. Ev mirovên azadî hes,xêrxwez ,mirovhes bi ruh û vîcdana xweva nêzînkî xwedane.Meydanada ev mirovana bê cek,bê şer bi xasteka xwedava yek

dibin,ji bo pêşerojek bi rûmet,ji bo jîyanek wekhev,ji bo ku dunya meda kole, koledar, zulm,zor,înkâr,îmha,komkujî,tîrs tunebe hemberî desthilatdarên tamahkar û kujer radiwestin,ji bo ku dunya meda rastî ,edaleta xweda were berpa kirin û di navbera mirovanda cudatî were tune kirin,dunya bibe mala mirovan,welatê mirovahîyê kurd îro vê pêşerojê re bi bawer û bi biryarin. Hemberî zulma hezar salan,hemberî qanûnên çewt,derew,sexte ên hêzên desthilatdarin. Rizgarîya gelan dawîya kevneşopîyê,nezanîtyê û dagirkerîyêye. Lê heya ku dunya meda mirovek jî kole hebe aramîyê ser nekeve.

Mirovên berdest,gelên bindest ,ên ne azad,bê welat çi olî dihevîn in bila bihevînin dunya

meda a durî û bi qerez de nayên ecibandin.Ji bo dunyak azad,ji bo zakonên nû kurd serpiyanin...

Mirovên oldar ên tund,nezan,nijadperest dibine koleyê hest û mîfalogîya Antîk.Oldarîtya cuda-cuda, ,parçebûna ola tendurustîya mirovahîyê a exlaqî menewî dukuje.Dunya mera mejûtyê şîyar û mirovên zane,saxlem,bi exlaq, xwedan wîcdan pêwîstin.

Hêzên dagirker û nijadperest hertim ji ola ji bo berjewendîyê xwe pêk anîne.

Lê îro ji bo parastina dunyak azad ,ji bo pêşeroja mirovahîyê pêwîste bi zanîstî ji olan pêk were anîn .Bi cavgirtî nikarî olê din mêze bikî, an jî înkâr bikî, ol hemû jî balkêşin. Ol milyardava mirova digihîne hevdu.yekbûneke zêhnî,menewî di navbera mirovanda diafrîne, çêdike.Jîyana meda ol û ulm hevdu tamam dikin û bi alîkarîya ulm ol zelal tîne şilovekirin . Ol ji bo jîyanê rêya rast nîşanê mirovan didin.Rêya

LAPE RAST JÎ BI GORÎ OLAN RÊYA AZADÎYÊ , BIRATÎYÊ Û WEKHEVÎYÊYE

Azadî û rizgarîya mirovahîyê altindarîya xwedaye.

Belê Ev dunya mirovahîyêra pêşkêşa xwedaye.

Gelo lê mirovahî îro layîqî xwedaye.?

Eger îro dunya meda mirov û gel ê bindest hebin

Eger îro dunya meda şer diqewmin,welat beladîbin

Eger îro mirov hev înkâr dikin,hevdu nasnakin

Tawanbar mirovahîye

Eger îro mirov tîne kuştin

xwîn tî rijandin

Qetlam tîne kirin

weha

XWEDA tî

înkâr kirin

Lê wî çaxî tawanbar kîye.?

Ev ol

ev dunya

.jîyan

mirov

ji bo çîne?

ÎSLAM

Xristîan

BÛDDÎZM

QURAN

ÎNCİL

BÎBLÎYA

MESCÎD, MIZGEFT, DÊR	RABE	zulmê	*** ** *** ** ***
JI BO KÊNE ?	BIPARÊZE	Esaretê	XWEDA JI BO HEMÛYANE
Ji bo kêne....?	XILAZKE....	Dasekinandina mafên mirovan	XWEDA VÎCDANA MIROVANE
Ey mirovahî bese rabe	Ji bo xatirê jîyanê.....	gelan,	LÊ DUNYA ME
Dijî zulm- zor û şera raweste	Ji bo xatirê jîyanê	Serketina rastîyê	A ROJANEDE
Ev dunya mala me hemûyane	*KUŞTINA MIROVEKÎ	Azadîyê	WÎCDAN HERO VEDİMIRE
Dişewite	KUŞTINA HEMÛYANE *	wekhevîyêDumayik heyê.....
bela dibe	WEHA NÎVSARE LI QURANÊ	edaletê	
Her kes dimire...	VEMIRANDINA	Altindarîya xwedayê.....	

Harold Pinter

Kurd dê biserkevin.

Zebaniyan kurdistan kirine cehneme..

“...Ez xwe azad û serbest nahesibînim. Ji ber ku gelekî ji 20 milyona zêdetir. Yanê gelê kurd li ser axa xwe, li welatê xwe nikare bi zimanê xwe bipeyive. Zimanê wî qedexê bûye...mixabin ku dinya bûye cehennem...kirine cehennem. Di vê cehennemê da zebanî, mêrkuj, xwînrej li milekî ne û em yê mayî jî li milekî ne. Em li kû dibin bila bibin, divê em li dijî xirabî û kirêtiyên wan dengê xwe bilind bikin.

Aha berhemên min, nemaza yê dawîn, celebeke dengbilindkirinê ne..“

“...Cehennem û zebanî li wir, li kurdistanê, li ber çavan in. Pir vekirî, aşkera û tazî...min xwest, ez jî bi awayê xwe vê yekê salix bidim..“

Êlûn 1989

Harold Pinter

Wergerandin (malper).

Di cotmeha 1999 ande 60 nivîskar û rewşenbîrên kurd û cihanî; Yashar Kemal, Mehmed Uzun, Ahmet Altan, Orhan Pamuk en Zülfü Livaneli en ook Günter Grass, Costa Gavras, Harold Pinter, Ingmar Bergman, Arthur Miller en Elie Wiesel, dirin Turkiyê li Istanbulê û di kongrekî rojnamevanî de bangeke tevayî li Tukiye kirin, van 60 nivîskar û rewşenbîran “” Wijdanên Cihanê”” gotin: li dawî dive Turkiyê bi tevaya cihanê re û di destpêka sedsaleke nûde bi şeweyekî demuqrat pîrsa kurdî çareser bike û hevvelatîyên xwe bi destekî vekirî wan hembêz bike. Em bawer in ko Turkiyê vê yekê bike dê di civak Em bawer in ko Turkiyê vê yekê bike dê di civak û canda xwe de jî xurt bibe....gereke Turkiyê birîna civakî ya xwînrejîya 70 salî bi dawî bîne.”

Nûçe

Nivîskar, şanoger û listikvanê Înglîz yê navdar Harold Pinter xelata Nobelê ya Edebiyatê girt. Ew dostê Kurdan e. wî li dijî qedexeya li ser zimanê Kurd pirtûkek bi nave Zimanê Çiya nivîsand. Ew pirtûk di sala 1990 de ji aliyê Weşanên Doz ve li Istanbul hate weşandin. Zimanê Çiya listikeke şanoyê ye, ew qedexekirina zimanê kurdî pêşkêş dike. Harold Pinter di sala 1985 de ligel serokê PENa Navnetewî nivîskarê Emerîkî Arthur Miller çû Turkiyê piştigiriya qurbanên zilma 12 Îlonê kir. Wan salan zimanê kurdî qedexê bû, li hember

qedexeya li ser zimanê kurdî Pinter şanoya Zimanê Çiya nivîsand.(avestakurd.net)

Harold Pinter di axiftinekê de li sala 1997-ê dibêje:

“Baweriya min weha ye ko gelê kurd bê hevta ye, kesînî û azayî û hezkirina wan weha kiriye ko teror nikaribe morala wan bişkêne. Gelê kurd rewîşt û taybetmendiyên xwe yê timam hene û baweriya min weha ye ko ew dê serbikevin. Divêt ew serbikevin. Lê divêt wan hemî piştigiriya me hebe“.


Harold Pinter li sala 1930-ê li rojavaya Londonê ji dayik bûye û bêtir bi nivîsîna şanonameyê navdar e û wî berî wergirtina xelata Nobelê çend xelatên din jî wergirtine.(nefel.com).

Nûçe û jînenîgarî (netkurd.com)

Harold Pinter dostekî hêja ê gelê kurd e. Ew di sala 1985ê de bi senarîstê Amerîkî Arthur Miller re çû Turkiyeyê, li wir bi ronakbîr û kesên îşkencekirî dît, li balyozxaneya Amerîkayê li dijî îşkenceyê axaftinek kir, li ser vê ji balyozxaneyê hat derxisti

Xelatgirê Xelata Nobel a îsal Harold Pinter di 10ê oktober(çiriya pêşîn) a 1930î de li Londonê li Hacknesê ji malbateka yahûdî ji diya xwe bû. Bavê wî cildiruyê jinan bû. Pinter di piçûkiya xwe de tûşî erîş û piçûkxistinên antisemîtîk bû, di dema şerê cihanê ê duduyê de ji ber valakirina Londonê mala wan qasî 3 salan li derveyî Londonê ma, di vegeerê de di piyesên xwendegehan de dest bi rollezîyê kir.

Wî di eynî demê de dest bi helbestvaniyê jî kir û helbestên wî cara pêşîn di 1950 de hatin çapkirin.



Piyesa wî ya pêşîn The Room (ode) di 1957ê de hat çapkirin.

Wî ji bo filman senaryo jî nivîsîn û di hin filman de rol girt.

Heta niha Pinter nêzî 30 piyes û bi qasî 20 manusên filman nivîsîne. Buhara derbas bûyî ragihand ku ew ê nema piyesan binivîse, tenê ê bi helbestan bibile. Wî got ku ”min heta niha 29 piyes nivîsîn ma ne bes e.”

Di van salên dawiyê de Harold Pinter bi aktîfî xwe têkilî polîtîkayê kiriye. Ew li dijî wê ye ku DYA û Brîtanya êrîşê bibin ser Îraqê, Wî got ku Tony Blair divê di mehkemayeka dijî şer de bê dadgehkirin, ji Blair re got ”ehmeq”, ji George W. Bush re got ”kujerê bikomî”. Lê gava xelat wergirt ji rojnameyan re got miheqeq Tony Blair ê destegulekê ji bo pîrozbayiyê jê re bişîne. Harold Pinter li dijî şerê Amerîkayê ê bi Afganîstanê re ye, li hember bojkota Amerîkayê a li hember Kubayê ew piştigiriya Kubayê dike û endamê wê komîteya navneteweyî ye ya ku piştigiriya parastina mafê Slobodan Mîloseviç serokê Yugoslavyayê ê kevn dike ku niha li Haagê mahmkeme dibe.

Gava Harold Pinter bihist ku xelata Nebel girtiye wî bi xwe jî got ku dibe ku ne tenê ji ber berhemên wî yê edebî lê ji ber angajmana wî ya siyasî a li dijî şerê Îraqê ev xelat girtibe. Horace Engdahlê Akademiya Swêdê bi qutbirrî red kir ku ji ber angajmana siyasî ev xelat dabinê. Wî got ew xelat bi her awayî ji ber afirneriya wî ya edebî ye Harold Pinter dostekî hêja ê gelê kurd e. Ew di sala 1985ê de bi senarîstê Amerîkî Arthur Miller re çû Turkiyeyê, li wir bi ronakbîr û kesên îşkencekirî dît, li balyozxaneya Amerîkayê li dijî îşkenceyê axaftinek kir, li ser vê ji balyozxaneyê hat derxistin. Arthur Miller jî piştigiriya wî kir û bi Harold Pinter re ji balyozxaneyê derket. Wî wê demê îlhama xwe ji qedexekirin û bindestkirina zimanê kurdî girt û piyesa Zimanê Çiya nivîsî. Zimanê Çiya li ser zimanê kurdî ye, û protestoyek e li dijî siyaseta tirkan a qedexekirin û mehandina zimanê kurdî.

20 deqge berî ku xelat li Stockholmê eşkere bibe, li Londonê gazî wî kirin ku ji Akademiya Swêdê telefon ji bo wî heyê, got ”çima, ew çima li min digerin”, ji xwe hay ji Xelata Nobel tunebû, gava xebera xealtê ket guhê wî jî zimanê wî li hev geriya nizanibû çî bêje, bêdeng ma. Xelata Harold Pinter bi qîmeta 2.8 milyon dalar(10 milyon kron e).

Ji bilî Nobelê wî Xelata **Shakespeare Prize (Hamburg)**, Xelata Ewropî jib o Edebiyatê (**European Prize for Literature (Wien)**) û ya bi navê **Moliere D'Honneur for Lifetime Achievement** girtiye.

(ji erşîfa malpera tirej.com)

Dr. Ehmed Xelîl (Sozdar Mîdî)

Berbanga Şaristaniyê Li Kurdistanê



Kurdistan navê welatê kurdan e, ev welata li navenda rojavaya asyayê dikeve, ji gola Ormiyê de li rojhilatê, dest pê dike ta devera Kurdayê (Efrîn) li rojava, û ji ciyayê Agirî (Erarat) de li bakur ta Luristan û Îlamê li başûr. Zincîrên ciyayên Zagros, Agirî û Toros mofirkên piştî welatê kurdan e, û divyaye li wa erdnîgariyê dîroka pêşiyên kurdan were pelandin.

Ta îro, ji bermayên erkîyolocî û lêkolînên dîrokî, tê xuyan ku zincîra ciyayê Zagros- bi teybetî jî deverên rojava- pînika şaristaniyê bû li rojavaya Asyayê.

De werin em va pêvajoyê bişopînin.

Serdemên Berî Dîrokê

Yekem: Serdema Kevirî a kevin:

Ev serdem, di jêderên dîrokê de, bi navê (Palyolitik) tê nasîn, ew ji kevintirîn hebûna mirovan de dest pê dike, ta sînora (10000 bz), û mirovê serdema kevirî li Kurdistanê dijiya, bermayên xwe li evan deveran hatin xuyan:

- **Li Rojhilata Kurdistanê:** Li gelî sor ê ku li nêzikî Bihestûn û Kirmenşar dikeve, û li ciyayê Bextiyarî.

- **Li Başûrê Kurdistanê:** Li Perde Belge, ê ku bi du mîlan li bakur rojhilata çemçemal dikeve, û li şikefta Zerzî û şikefta Hezarmerd li başûrê Silêmanî, û şikefta Şanîdar li ciyayê Biradost, ew şikeft li kenara çemê Zaba Jorî dikeve.

- **Li Rojhilat û Navend Kurdistanê:** Li ciyayê Nemrûd, û ciyayê Hekarî, û Qarsê.

- **Li Rojavaya Kurdistanê:** Li şikefta Duderiyê ê ku li ciyayê Lêlûn (li kenara çemê Efrîn) dikeve.



(Erdnîgariya Rojavaya Asyayê)

Mirovê serdema Palyolitikî di şikeftan de dijiya, bi nêçirvaniyê û komkirina mewan xarin bi dest xwe dixistin, ne bi rêya çandinê û xwdîkirina acelan, agir bi kar anîn da ku xwe germ bikin û xarinê amade bikin,

alavên xwe ji keviran pêk tanîn, ew alavan ji bo nêçirvaniyê û bidestxistina xarinê bi kar tanîn, wek ûdirgehane (مناقب) sêkoşan, seriyên tîrkevanan, biviran, hin ji ewan biviran qalîn û bêteşe ne (nelihevhatîne), hin jî tenik û lihevhatîne⁽¹⁾.

Duwm: Serdema Kevirî ya Navîn:

Ev serdem bi navê Misolitik (Mesolithic) tê nasîn, ewa ji (10000bz)ê dest pê dike, berhemên xwe li hin deveran hatin dîtin; wek Zawê çemê Şanîdar, ê ku dor 4 kîlometran ji Şikefta Şanîdar dikeve, ev şikefta jî bi xwe li kenara çemê Zaba Jorî dikeve, û wek wargeha Kerîm Şar ê ku li kenarê çemê Gewre dikeve, dur mîlekî jî li rojhilata çermo dikeve (nêzikî çemçemal), ev deveran gişt li Başûrê Kurdistanê ne.

Di va serdemê de, mirovan acil perwerde kirin; wek pezkuvî, pez, giha komdikirin, acil û giha bingeha jiyana wan a aborî bû, bi serde jî di va serdemê de mirovan dest bi hinek çandinî kiribûn, behaneyên va rewşa nû evin; kevirên destaran, mekut, quf, hin firaxên ku cihe, genim, nîsk pê tîr amadikirin ji bo xwarinê, kevintirînên van alav û firaxan, bi piranî, li wargeha Zawê çemê Şanîdar hatin dîtin, di va wargehê de, kevintirîn avahî hatin dîtin, dîwarên van avahiyên ji seyanê ne, ew nelihêvhatîne, bingehên wan ji zixurên mezin in, li va wargehê bermayên avahiyên kilover jî tîr dîtin.

Di va serdemê de, sazkirina alavan hinekî pêşda bû, hinek ji wan alavan bi rêya govaştin, şayikirin û kolandin hatibûn sazkirin, hinek jî ji hestiyên in, wek şûjînan, alavên selixandinê, kêr, destikên qalûçan û seriyên wan ên tûj, gerdenên ku ji hestiyên û diranên acelan hatin sazkirin, hinek alav jî ji sifir sazûne⁽²⁾.

Sêyem: Serdema Kevirî ya Nû:

Ev serdem bi navê Niyolitik (Neolithic) tê nasîn, ew ji (9000bz)ê dest pê dike, bermayên va serdemê li hin deverên Kurdistanê hatin dîtin, wek çermo (li nêzikî Kerkûk), Tepe Serab, Têlke Tepe, Gozana (Tel Helef), Şemşare û li wargeha Hessûne ê ku li nêzikî Mûsilê dikeve.

Di va serdemê de, mirovan çandini û perwerdekirina acelan pêşda birin, ji pergala komkirina xwarinê derbasî pergala berhemkirin xwarinê bûn. Ev rewşa nû kir ku mirov ji pergala graniyê derbasî pergala rûnişvaniyê be, di va pergala nû de, civata gundîtî, û arziya tekekes hat peydakirin, û hestên nêştmaniye di hizra mirov de cihê xwe girt, helbet ev guhartin bi xwe şûreşeka çandî, civatî û abûriy a giring bû, bingehên şaristaniyê di hembêza va guhartinê de hatin dameziramdin; wek pîvana dem (roj, êver, meh,

sal), têgehên mitolocî (olî), berbanga olperestiya xwedayan, bi teybetî xweda- jin (jinên xweda), û baweriya bi nûjiyana piştî mirinê (البعث بعد الموت), û nemirna li cihana din (الخلود في العالم الآخر).

Lêkolînên erkîyolocî didin xuyan, ku şûreşa çandinê li çiyayên Zaxros û deverên Kurdistanê ên din, bi gelek sedsalan berî deverên din pêk hat, ew deveran jî evin (deştên mesopotamiya, beyabanên Sûriyê û Erebiştanê, beravên Derya Sipî, rojavaya Derya Reş û Derya Qezwîn, Bakurê Efrîka); ji ber ku li deverên Zaxros pez, bizin, çêlek û beraz hatibûn perwerdekirin, gelek şînayî, wek genim, ceh, nîsk û nok, lê dihatin dîtin, ev şûreşa çandinê li dor (6750b.z)ê peyda bû, lewre çiyayên Zaxros ji kevntirîn cihên ku mirovan tede xanî ava kirine.

Di va serdemê de, mirovan karînen sirûştê ji bo jiyana xwe bi kar anîn, wek sazkirina alavan kevirî (destar, gîsn, seriyên tîrkevanan, qalûç), avakirina xaniyan. Di pêşî de firaxên sazkirinê bêteşe bûn, ne li hevhatî bûn, bê reng û neqş bûn, û tê xuyan ku mirovan di va serdemê de dest bi rêstin û terzîkirina çilan kiribûn, ji ber ku teşî li wan deveran hatin dîtin⁽³⁾.

Çarem: Çerxa kevirî madenî (mêtal):

Ev çerxa ji (5600b.z) heya (4000b.z)ê domkir, Mirov di vê çerxê de, li kêlek keviran, maden (mêtal) jî ji bo çêkirina alavên malê û zeviyê xebitandin. Bermayên vê çerxê li çend şûnan li başûrê Kurdistanê hatine dîtin, û ewana nîşana pêşdaçûna berhemdariya zeviyê ne, û pîrbûna berhemana ta radeya ku ji xwasteka jiyana mirovan bêhtir bû, û pêre jî ew serdema bû destpêka numabûna pisporiya kar, ji ber ku, di vê çerxê de, hin kes bi zeviyê re, û hinek jî bi çêkirina alavên malê û zeviyê re mijûl bûn, û yekemîn car bû ku tîkiliyên bazirganî, di riya bihevguhertinê re, diyar bûn⁽⁴⁾.

Jêder:

- 1 - Cemal Reşîd Ahmed: Hebûna Kurdan di dîrokê de, beş 1, rû 389 – 408. Fadil Ebdilwahid û Amir Silêman: Rêzikên gelên kevin, rû 10.
- 2 - Jîn Potro: Rojhilata Nêzik (şaristaniyên pêşî), rû 32 – 34. Cemal Reşîd: Diyarbûna Kurd di dîrokê de, beş 1, rû 408-414. Ê Fadil Ebdil-Wahêd, Amir Silêman: Baw û rêzikên gelên Kevin, rû 11.
- 3 - Jîn Potro û hinên din: Rojhilata Nêzik (kevntirîn şaristanî), rû 32. Cemal Reşîd: Diyarbûna Kurd di dîrokê de, beş 1, rû 415-416. Ê Fadil Ebdil-Wahêd, Amir Silêman: Baw û rêzikên gelên Kevin, rû 11- 12.
- 4- Fadil Ebdil-Wahêd, Amir Silêman: Baw û rêzikên gelên Kevin, rû 12 – 13.

Amadekirin: *Ezîz Xemciwîn*

Bingehên gramera kurdmancî

Celadet Alî Bedirxan

Bi navê Yezdanê pak ê dilovan ê mihrevan

Navdêr



34- Navdêr ew bêje ye ko kesekî, heywanekî an tişteki şanî me dide.

Ji lewre bêjeyên **Zîn, pismam, şêr, hesp, post û kursî** navdêr in. Ji ber ko ji van her şeş bêjeyan dido hin kesan, didoyên din hin heywanan û didoyên mayîn jî hin tiştan pêş me dikin.

35- Hevenav û serenav: Navdêr di nav xwe de û di bingehin de bi du biran lewa dibin: hevenav û serenav.

36- Hevenav: Hevenav ji wê navdêrê re dibêjin ko jî yekî bêtir kes, heywan an tiştan dinimîne û wan bi hev re bi nav dike. Herwekî: **rêwî, hesp, çiya**. Bêdiro, gava em **rêwî** dibêjin; ev bêje navê her mirovî ye ko bi rê ve diçe. Bêjeya **hesp** jî welê ye; pê herçî heywanên wî cinsî hene tene seh kirin. Bi bêjeya **çiya** herçî bilindcihên dinyayê hene ko ne gir, ne **mitik in** û ji wan bilintir in tene birê. Ev in çend hevenav:

”Şagirt, xanî, evor, mase, can, binahî, derzî, kerî, pez, kevir, dar, qencî, xelk, zîwan, keskesor, navro, girav, şeh”.

37- Serenav: Serenav ew navdêr e ko bi tenê kesekî, heywanekî an tişteki dinimîne û xweserî wî kesî, wî heywanî an wî tiştî ye. Herwekî: **Sado, Bêlan, Herekol**.

Ev navdêrên ha yeko yeko xweserî **mirovêkî, seyêkî û çiyakî** ne. ev in çend serenav: “**Hevind, Sîpan, Xabûr, Hindistan, Hezro, Kerevon, Zîn, Dêrgul, Kurdistan, Agirî, Cemşîd, Ferzende**”.

Guhêrbariya Navdêran

38- Navdêrên zimanê kurdmancî ji du awirên têvel ve guhêrbar in: **zayend û mêjer**. Ev guhêrbariya navdêran bi tewangê tete pê. Bi gelemperî dūpaşê navdêran li gora zayend û mêjerê wan diguhêrin. Carina jî ev guhêrbariya bi guhêrbariya tîpeke rayekî tete pê.

39- zayend: Di zimanê kurdmancî de du zayend hene: **mê û nêr**.

40- Zayendê nêr: Navên **mirov, heywanên nêr** û navên **tiştine** nerihber yê ko kurdmancan ew **nêr** hesibandine, tev de zayendên **nêr** in. Wek: “**Cemşîd, mês, nêrî, ga, xanî, gir, ferat, can, beran, Xurşîd, derî, êzing, hiş, çem, kevir, law, dirhav**”.

41- Zayendê mê: Navên **jin, heywanên mê** û navên **tiştine** nerihber yê ko kurdmancan ew **mê** hesibandine, tev de ji zayendê **mê** ne. mîna: “**Sînemxan, jin, meh, dar, çêlek, mehîn, tîfîng, bizin, bîr, gol, pehnaw, Herekol, Hezarom, co, enî, top, enjû, Kurdistan**”.

42- Navên heyberên rihber: Di heyberên rihber de, carina **mê** û **nêrê** wê heyberê bi bêjeyine cihê û biserxwe tene nîşan kirin.

Herwekî di bêjeyên jêrîn de:

Bra	Xweh
Pismam	Dotmam
Bûra	Diş
Kur	Keç
Brazî	Brzê
Hesp	Mehîn
Yekane	Mehû
Beran	Mih
Nêrî	Bizin
Dîk	Mirîşk

Lê gava ew heyber bi awayê jorîn, bi bêjeyine biserxwe û cihê ne binavkirî ne, hingê bêjeyên “mê” û “nêr” bi ser wan ve datînin û bi vî awayî zayendê wan, yanî mê û nêrên wan didin zanîn. Di vî şikilî de veqetandek dîkeve navbera bêjeya rayî û bêjeyên “mê” û “nêr”. Veqetandek bi xwe jî zayendê wan şanî dide. Wekî niho:

Kewê nêr	kewa mê
Kerê nêr	kera mê
Pisingê nêr	pisinga mê
Sîxurê nêr	sîxura mê
Hirçê nêr	hirça mê
Gurê nêr	gura mê
Kevroşkê nêr	kevroşka mê
Fîlê nêr	fîla mê

43- Qeyda jorîn, qeyda gelemper e. Yanî mê û nêrên heyberên rihber, nemaze heywanan, bi gelemperî bi vî awayî tene nîşan kirin. Lê kêman caran û ji vê qeydê der, bêjeyên «**mê, nêr, dêl, mak, mang**» dikevin pêşiya bêjeya rayî û bêyî tu tiştî bi wan ve dibin; bêjeyê nêr û bihevketî ditînin pê. Hingê ew bêje bi hev ve tene nivîsandin. Herwekî: “**nêreker, maker, mêkew, dêlegur, man ge**”.

Şanek – Zayendê heywanekî, carina bi veqetandek û tewangê jî tete nîşan kirin. Gava em dibêjin: “**hespa min bîne**” an “**kera min bîne**” xuyaye ko em qala mehîn û makerê dikin. Dîsan gava em dibêjin: “**ez li hespê siwar bûm**” an “**ez li kerê siwar bûm**” gelek kifş e ko heywanê ko em lê siwar bûne “**mehîn**” an “**maker**” e û ne “**hespê nêr**” û “**kerê nêr**” e.

44- Mana zayend: Bêjeyin hene ko gava mana wan diguhêre zayendê wan jî tete guhartin. Mesela “**dar**” gava bi mana dara heşîn e mê ye “**Vê darê ji min re dawêşîne**”. Lê ev “**dar**” bi bi xwe gava bi xwe gava bi mana darê hişk e nêr e “**Vî darî ji min re bişkênîne**”.

45- Di zayendên hin navdêrên ko tiştine nerihber dinimînin kurdmanc ne yek in. hinan ew **nêr**, hinên din ew **mê** hesibandine. Ji wan bêjeyan tiştê ko heta niho me kari bû em bisenifînin bêjeyên jêrîn in. heye ko hinên din jî peyda bibin: **Çax, wext, mixdar, qeder, sîng, kursî, balgih, xeber**.

46- Wezîfeyên navdêrê: Navdêr di komekê de gelek wezîfan dibînin. Bi kurtî ên bingehin ev in:

kirar: **Soro îro ji bajêr hat**.

Bireserê lêkerê: **Min Soro dît. Min ji Soro re got**.

Bireserê navdêreke din: **Kitêba Soro nû ye**.

Pêveberê lêkerê: **Xerîbî ne tu çek e**.

Mêjer

Di gramêrê de mêjer ew xweseriya navdêran e ko navdêr pê heybereke bi tenê an heyberine gelêr dikarin şanî bidin. Bi gotinên din mêjer yekjimarî û gelemperî navdêran şanî me dike û em pê dizanin gelo di qisetê de qala heybereke bi tenê dikin an jî yekê bêtir. Heke navdêr heybereke bi tenê dinimîne hingê ew yekejmar e; û heke ji yekê bêtir dinimîne hingê ew gelemper e.

48- Yekejmar: navdêr yekejmar e, gava ew ji tişt, mirov û heywanên ko dinimîne yekî bi tenê raberî me dike. Navdêrên komekên jêrîn yekejmar in: “**Mîr hat. Ez hespekî dibînim. Ez çiyayê bilind dibînim**.” Ji ber ko ew ji mîran mîrekî, ji hespan hespekî û ji çiyayê çiyakî bi tenê şanî dikin.

49- Gelemper: Navdêr gelemper e, gava ew ji tişt, mirov û heywanên ko dinimîne ji yekî bêtir raberî me dike. Navdêrên komekên jêrîn gelemper in: “**Mîr hatin. Ez hespan dibînim. Ez çiyayên bilind dibînim**”. Ji ber ko ew ji mîran çend mîran, ji hespan çend hespan û ji çiyayê çend çiyayê şanî dikin.

50- Herwekî ji mîsalên madeyên 48 û 49 dixuye di zmanê kurdmancî de yekjimarî û gelemperî navdêran bi çend awayên têvel xuya dibin. Ew nemaze ji mêjerê lêker, tewang û veqetandekê dixuyin.

Yekejmar	Gelemper
Ev mehîn e.	Ev mehîn in.
Min mehîn dît.	Min mehîn dît in.
Ez mehînekê dibînim.	Ez mehînan
Ez mehînekê dibînim.	Ez mehîna
Ezê ji te re mehîneke mehînine	Ezê ji te re
qenc peyda bikim.	qenc peyda
Ev kurê kê ye?	Ev kurê kê ne?
Mehînekê xwar.	Mehînan xwar.
Tu vî hespî dibîni?	Tu van hespan dibîni?

51- Gelemperî serenav: ji ber ko serenav xweserî tişteki, mirovêkî an heywanekî ne, û pê bi tenê ew bi nav dibin, di rastiyê de serenav tu caran nabin gelemper. Lê bi mecazî û ji bo mîsalê bi gelemperî tene gotin. Herwekî: **Ez ji te re Melayên Cezîrî, Ehmedên Xanî û Feqiyên Teyran ji kû peyda bikim. Tu di beyabanên bê dar û belg de li Bîngolan digerî**.

Bîranînên Têkoşerekî Kurd

Ehmedê Ebdirehman Axa Kurê Şahîn Axa Şûzî

Şoreşa Şêx Seîd ,...

Çûna Me Ya Iraqê ,...

Avakirina Xoybûnê

*** Wergerandin ji Rojnameya "ARMANC" jîmara 5^{am} sala 1989 ***



Xorşîd Şûzî



Xelek – 2 –

nizamî ba me yê arîkariya we kiriba.

Şêx bê hêvî veşariya ji bexda û çû cem malên xwe li gundên dora Zaxo. Bi dûv re çû li mûsilê rûnişt.

Pişt re min izna xwe ji şêx Ibrahîm heqî û ji xaleta xwe xwest, ez û hevaleyê min navê wî ebdilla cizîrî – me berê xwe da bexda yê ji bo em xwendina xwe tamam bikin. Wextê em gihîştin bexda me berê xwe da zilamekî navê wî şêx Ibrahîm ê rawî bû, mi jêre reşbelekek nivîsî, û mi tede danî: “ji bo kek şêx Ibrahîm rawî yê berêz... em dû telebe ne, ji axa welatê kurdistanê hatine, ji bo wê yekê kû hûn alîkariya me bikin da em ilmê dînê îslamê bixwînin. Em hêvî darin kû hûn alîkariya me bikin... digel silav û ihtiram”- name ya mi nivîsî bi erebî bû-

Dema şêx Ibrahîm rawî reşbeleka min xwend, gote min: dibistanek heye navê wê dibistana rewas e, mamosta yê wê seyîd xelîl e, herin cem wî û silavê min lê bikin, ewê cî ji were çêke... me riya xwe kirt û em çûne ba mamoste

seyîd xelîl, xwedê jê razî be wî odek da me, û xwarina me ji mala şêx Ibrahîm rawî dihat(cihê wî cinet be).

Ji beriya em herin bexda, şêx Elî riza kurê şêx Seîyd Pîran digel herdû birayên xwe “Selahuddîn û giyasuddîn” ji ber tirka bazda bûn piştî şoreşa 1925 şikest, û bavê wan tevî gelek serokên şoreşê girtin û bi dûre şeniq kirin. Her sê bira bibûn lacîê siyasî li bexda yê. û mala wan li cem mala Ibrahîm rawî bû.

Dema em ji dersên xwe xelas dibûn emê biçûna civata şêx Elî Riz. Ji ber em gelek kêf xweş dibûn bi civata wî, û di her civatî de em hîne qewmiyeta xwe dikirin.

Em mane li bexda yê şeş mehan, me dersên xwe dixwendin, û rojekî şêx Elî Riza ji mere got: “Emê cemiyetêkî çêkin navê wê xoybûn e”, û got: ez hêvî dikim hûn herdû herin Mûsilê ji bo hûn kurdên me yê ji ber tirka bazda ne û yên li qeza Zaxo û Dihokê û Amêdiyê hîni qewmiyeta kurdî bikin. Ji ware bêjin wê cemiyetêk çêbe ji bo ser firaziya kurdistanê **Dumahî heye.**


Dema me berê xwe da Iraqê me pir zor û zehmetî dît, û pirê meşa me bi şev bû, û gelek arîkarî me dît ji millet wextê dibhîstin kû mala şêx derbas dibûn dîber gundê ware, geleka xwarin ji mere rêdikirin. Bi wî awayî em gihîştin bajarê mûsilê, û li cem hikûmeta Iraqê em bûn laciyê siyasî.

Dema şêx Ebdirehman ê garisî bihîst kû tirka şêx Ibrahîm Heqî girt û wî bazda, rabî digel eşîra xwe û eşîra eruh şerê tirka kirin. Leşkerê xwe kirin dû parçe, parçek cûn şerê Dihê û parçê dî cûn şerê Xezxêr.

Dihê û xezxêr jî qaymiqamî bûn, û herdû qeymiqam êşîr kirin di gel dû serekê cendirma. Qaîdê Xesxêr kuştin, herdû qaymeqam digel qaîdê dihê berdan. Herdû seray şewitandin, herdû deboy ên ku sîlah tê de şikandin, û sîlah birin. şerekî mezin kirin digel leşkerê tirka. Heçî leşkerên tirk li Dihê û li Xesxêr teslîm bûn, lê hemî bi dûvre berdan ew ne kuştin.

Heçî şêx ebdirehman bû, zilamek pir zana bû. Dizanî herdû eşîr nikarin bi tena xwe şerê tirka bikin, rabî malên xwe rêkîrin da herin Iraqê, û şer kir heya gihîşte Zaxo, û divî şerî de bihtirî dû sed leşkerê tirka hate kuştin.

Dema şêx giha Zaxo, bere xwe da bexda yê, û çû cem mendûbê samî ê inglîzî, û jê xwest arîkarî ji bo şer bi tirkare ne sekinê, mendûbê samî jê pirsî û jêre got: “şerê we bi tirka re şerekî eşîretî ye an nizamî ye?”. şêx jêre got: “heya ana eşîretî ye lê bi arîkariya we wê bibe nizamî”.. mendûbê samî lê veşariya: em nikarin arîkarî bi were bikin, eger şerê we



Melle Ehmed Şûzî – Şêx Mihemed Emin – Şêx Mihemed Zkî – Melle Ebdilwehab – Şêx Tahir

Kesayetiya kurdî

Lêkolînên civaknasîn * - Xelek 8 -

Çiya kilîtê kesayetiya Kurd e (1)

Cîgeh û mirov: Dr. Ehmed Xelîl

Wergêr: Heyder Omer



Zanyarê alman, Ernst Haeckel sala (1869) têrma (Ecology)yê afirand, mebesta wî jê, lêkolîna têkiliya navbera zindiyên û cîgehê wan de bû. Di vê çarçewê de nema mirov dipejirîne, ku (cîgeh) tenê şûneke erdnîgarî ya pehn û fireh e, da xaniyan û listikgehan li ser ava bike, an jî ji xwe re bike şûnên çêrê û çandinê, û ne tenê bergê û dirêjiyê geology ye, ku ji hin çînen (qat) di ser hevdu re peyda dibe, ku di yekê de av, di ya din de zêr, di ya sisîyê de hesin û di ya çarê de jî petrol hene, her weha cîgeh ne tenê heyam e (ba, germ, serma, şil û zuwabûn), lê têrma (cîgeh) evan hêmanan hemiyên bi awayê hevtewaw û hevbandor di xwe de dicivîne.

Rast e, ku em (mirov) xwe bextewar dibînin, ku me nasnameyên gene, yên taybet hene, em bi wan ji zindiyên din cida dibin, lê divê em ji bîra nekin, ku ew nasnameyan di hembêza şahnişîna (cîgeh) de peyda bûne, û em ji bîra nekin jî, ku berdewamiya me ya jiyânê dengvedana hevbandor û lihevkerina me, ya bi awayê raste rast bicîgeh re ye. Bi ser de jî divê em ji bîra nekin, ku karîna genên me, ji bo lihevkerina li gel cîgeh, sedema berdewamiya hebûna me ye; ev hebûna, ku bê karînen wan genan nikare didome, her weha divê em zanibin, ku para cîgeh di pêkhatina me de heye, ew hevparê peydakirina me ye, ji her warên durv (dirêj, kurt û pehn, reng), hest, mirûz û çandê ve, em, wek mirov, beşek ji cîgeh in, em tê de peyda dibin, û tê de jî bi dawî tên, em ne dikarin jê bazdin, û jî guhên kerr tê yal kin, û ne jî pozbilindiyê lê bikin. Ew çarenûsa me ye.

Heye tu ji van boçûna bi guman bî . Êdî ka ez ji te bipirsim: Rengê çermê te reş e?. Baş e. Rengê te ji destpêkê de, ji beriya ne kêmtirî du milyon sal de qehweregî bû, lê cîgehê, ku pêşiyê te yê yekemîn lê peyda bûye, bi hebûna tava (îşiq) ser benefsec re gelekî dewlemend bû, ewê îşiqê dikanîbû ew bi penceşera çerm nexweş bikira, vê lomê hin genên wî metiryalek afirandin, navê wê (Mîlanîn)e, karê wê mîlanînê jî ew bû, ku çermê wî bi rengê jî bo wî cîgehî layiq e birengîne, vê lomê rengê çermê wî reş kir, da wê îşiqê bimije, û nehêl li hundir gewdê wî belav bibe, pêre jî derfeta berdewamiya jiyânê da wî. Ji ber vê yekê divê tu sipasdarê rengê xwe yê reş bî, û guh nedî boçûn û nerfînên ciwanî, ewên ku zû nixê xwe wenda dikin, rengê te yê reş, ji hêla hebûnê de, ciwantir e, tu ji pişaftin û mirina misoger parastiye(1).

Gelo, rengê çermê te sipî ye?. Rengê te jî ji destpêkê de, ji beriya ne kêmtirî du milyon sal, qehwerengî bû, lê tava rojê li wê devera, ku pêşiyê te yê yekemîn lê peyda bûye, gelekî hindik bû, pê re jî mertisiya nexweşiyên giran li wur pir bû, vê lomê hin genên wî ferman dane (mîlanîn)ê, da rengê çermê wî hinekê sayî bike, da tava rojê di çermê wî re derbas hundir gewdeyê wî bibe, û karînen berdewamiya jiyânê tê de xurt bike, vê lomê, divê tu ji sipasdarê rengê xwe yê sipî bî, lê

ne ji warê ciwanî, belê ji warê hebûnê de, ji ber ku wî rengê sipî tu ji nexweşî û mirina misoger parastiye.

Rengê te encama lihevkerina te û cîgeh e, her weha poz û çavên te jî wusa ne. Te pozekî dirêj û bêvilteng heyî?. Pozê te di destpêkê de ne wusa bû, lê cîgehê, ku pêşiyê te yê yekemîn lê peyda bûye gelekî sar bû, bayê sar jî ji bo cegerê ziyandar e, vê lomê hin genên wî, li gor lihevkerina li gel cîgeh, pozê wî dirêj, û bêvil jî teng kirin, da ba hino hino tê re derbas bibe, bi rê de jî hinekê germ bibe, ta wek mêvanekî xoşewîst digihîn cegera te, û uksicîna, ku jê re divê, pê de ber dide.

Baş e, te pozê dirêj û bêvilteng nînî, lê pozê te kurt û bêvilfireh e. tu jî ji destpêkê de ne wusa bû, lê cîgehê, ku pêşiyê te yê yekemîn lê peyda bûye, gelekî germ bû, ba jî, wek ku hatiye zanîn, çiqas germ be, ewqas ji hev dikişê, û uksicîn tê de kêmbibe, cegera pêşiyê te, di wê heyama germ de, hewcedara uksicîna pir bû, ku bi bêhnkêşanê re derbas hundirê wî bibe, vê lomê ew hewcedarê pareke pir bû ji wî bayê germ û jhevkeşayî, pêre jî hinek genên wî, li gor lihevkerina li gel cîgeh, pozekî kurt û bêvilfireh jê çê kir, da bayê pir bi hêsanî derbas cegera bibe, û uksicîna pêdivê bidê yê.

Di çarçewa destlata cîgeh de, bê ku em guh bidin pêwîr û mêzînen ciwanîyê, em dikarin fireh û tengbûna çavan jî şirove bikin. Nîrên daristana pir dar ji pêşiyê te yê yekemîn re çavine fireh peyda kirin. Heye tu bipirsi: Çawa?. Daristan pareke pir ji tava rojê (ronahiyê) digire, pêre jî bergeha çavan fireh dibe, da pareke pir ji tavê werbigirin, û dîtin baş bibe . Her weha, tava ku bi ser berfê de dikeve, û li çavan werdiger jî ji bo çavan ziyandar e, vê lomê hinek genên wî pêşiyê te, dîsan li gor lihevkerina li gel cîgeh, çavê wî teng kirin, da pareke hindik ji wê sipîbûna berz (ronahiya pir), a çav-êş, werbigire. Eger tu dixwazî vê yekê bi xwe biçespîni, ka li ronahiya giran û sert biner, û ji hêla firehbûn û tengbûnê de, bala xwe bide goşeyên çavên xwe.

Çîpên te dirêj an kurt in? Nîvê gewdeyê te, ji newqê heya ser milan, dirêj an kurt e? çenga te kurt an dirêj e? tu sermezîni an serbiçûkî? Ser milên te(Omiz) fireh e an teng e? tu bejindirêjî an bejinkurtî? Ta çi radeyê gewdeyê te lihevhatî ye? Mirûzê te (pergala derûnî) çawa ye?

Taybetmendiyên hizra te (zihniyet) çi ne? Çi bingehên efsaneyî di çanda te de hene?

Da ku tu bersivên sûdar ji van pirsan re bibîni, divê tu berê xwe bidî cîgeh, bi wateya wî ya êkologî (ecology), û hewil bidî ku bi kûranî têbigihîni. Ez nabêjim, ku tu dê her dem bersivên durist ji bo pirsên xwe bibîni, lê teqez tu dê gelek kilîtên zanîni bi dest xîni, û tu dê gelek deriyên girtî bi wan vekî.

Çiya di çanda gelan de

Êdî werin em li ba hêmanekî giring ji yê cîgeh; ew jî çiya ye, rawestin. Tiştê rast ew e, ku çiya di çanda gela de, li rohilat û roava jî, şûneke nixbilind û berbiçav heye, ta pileya ku di çanda gelan de bûye zîmbola xwedî wateyên cûrbeçûr, pirên wan wateyan jî li derdora bilindî, gewrebûn, hêz, şungirtin û ramankûr û şaxên wan digerin.

Di çarçewa van wateyan de, an jî ya hinekan ji wan, em dikarin tê bigihên, ku çima Someriyan (Ziquratu / perestgeheke pir qat hene) û Bircê Babil li deştên Mezopotamya, û Misriyan Ehramat li deştên derdora çemê Nîl, û Hindiyên Sor Ehramat li deştên Emerîkayê, Boziyan perstgehên di ser hev re ta ezmanan bilind dibûn, ava kirin. Her weha qubeyên kiristiyên û minareyên li kêlek perestgehên wan bilind dibûn jî. Ev zîmbol, di nîvê duwem yê yekemîn sedsala koçî (misilmanî) ya beramberî heftemîn sedsala zayînê, derbas avahiya misilmanan jî bû, pêre qube û minareyên bilind di endizyariya mizgeftan de jî diyar bûn.

Amadebûn û hebûna (çiyê) di kelpûra efsane û ayînî de jî balkêş e. Belê.. ma rawestina geştiya Ziusudra / Ziyosodra (Nûhê Somerî) û Utnabeshtem / Otnabeştim (Nûhê Babilî) li ser (çiyayê Nîsir), û geştiya Nûhê Ibranî /Hibrî li ser (çiyayê Ararat) û ya Nûhê Îslamî li ser (çiyayê Jûdî) ne balkêş e? Ma ne balkêş e, ku yekek ji paşnavên (Aşor) xwedayê netewî yê aşoriyan (çiyayê mezin) be? Ma ne balkêş e, ku civata xwedayên Girîkan/Yonan li ser tepela çiyayê Olemp yê tewrî bilind dihate girêdan ? Ma ne balkêş e, ku Ziyos; xwedayê Girîkan yê mezin ji Piromisyos; xwedayê biçûk xeyidî, ji ber ku wî agir bi dizî diyarî mirov kir, vê lomê jî Ziyos Piromisyosî ceza kir, ku bi zincîrê li gel hîmekî li ser tepela (çiyayê qefqas) were girêdan(2).

Ma ne balkêş e, ku Xweda (çiyayê Tor) vebjart, û li wur bi pêximberê hibrî Mûsa re axivî ? Ma ne balkêş e, ku pêximberê hibrî yê din, Îsa pirêcaran bi şagirtên xwe re li (çiyayê Zeytûn) li Qudsê dicivîya ? Her weha Zeredêşt; pêximberê Med şikeftek li (çiyayê Oshidarêna / Oşidarêna) deh salan kiriye perestgeh, û gava temenê wî gîha çel salan. Li wê deverê melek Fahomano îlham ji banî de, ji hêla Ahoramezda de jê re hanî, û pêximberê Ereban Mihemed jî şikeftek (Xar Herra) li çiyayekî Mekke kiriye perestgeh, û gava temenê wî gîha çel salan, melek Cibrîl îlham jê re ji hêla xweda de hanî.

Çiya û pêkhatina kurdî

Hêmanê cîgeh (êkologî) yê tewrî bi bandor li ser kesayetiya Kurd çiya ye, ta radeya ku em dikanin bibêjin:

Kesê kurd û çiyê hevalên her li ba hev in, ji serdemên kevirî de, û yên di pey re jî wusa bûn, û heya îro jî wusa mane.

Eger tu bala xwe bidî cîgehên Kurdan, di vê serdema me de, tê bibînî ku ewana bi piranî an li çiyên an li jî li pesaran û deştên nêzîk çiyên dimînin, û komelên wan, yên li deştên jî çiyên dûr in, an jî li çol û beriyên rûdînan, gelekî kêr in, ev yeka jî pergaleke awarte ye, ji ber ku ewana an ji ber zulm û zorê baz dane, an jî hin dewletan ew bi darê zorê, an wek ceza ji bo serhildan û şoreşên wan, an ji bo ku wan bidin hember êl û gelên ser-êşî ji wan delwtan re peyda dikirin, birine li wan deveran bi cih kirine.

Werin em, ji bo ravakirina tîkiliya navbera Kurd û çiyên, veşerîna serdemên pêkhatina komelên mirovanî yên pêşîn. Berê jî bi me re derbas bû, ku gelê kurd (netew / millet)ekî bi serê xwe ye, ku ne kêmtirî bîst û pênc sedsalan bi navê Kurd hatiye naskirin, her weha bi me re derbas bû ye jî, ku pêşiyên Kurd, ji serdema kevirî ya kevin (Paleolithic) de, li çiyayên Zagros û pesarên wan rûdînişt, û şaxên mezin yên bavpîrên Kurd (Somer, Lolo, Sobart, Gotî) ji wan pêşiyên Zagrosî ne.

Her weha bi me re derbas bûye, ku şaxên Arî (hind-ewropî) di demên cûrbecûr de, ji detpêka duwemîn sedsalên b. z de, koçî welatê wan pêşiyên Zagrosî kirine, û tev li wan bûne, û rêvebirîya pêkhata nû, nemaze ji hêla politîkî û çandî ve, bi dest xwe xistine, berzîrînên wan şaxan jî (Kaşî, Mîtanî, Man-nay, Xaldî û Med) bûn. Hêjayî gotinê ye, ku ev şaxên Arî hatibûn çiyayên Zagros û paşê jî çiyayên Toros, ji ber ku ewana bi piranî ji erdnîgariyê çiyayî hatibûn. Bongrad Lîvîn dibêje: „*Êkolojiya welatê bavpîrên (hind-ewropî) bi bêjeyên hind-ewropî yên kevin tê salixdan, ew bêjeyên ku zimanzanane dane ser hev, yên ku bi taybetî li gel çiya, heyam, û cîhana geya ûsewalan (heywan) girêdayî ne, û boçûn û destkeftên zanista zimanewanî, yên li gel êkolojiya welatê bavpîrên hind-ewropî dirêdayî ne, weha diçin ku ew welatekî çiyayî ye, tora çemên wî li hevgerî ye, û heyama wî naverast e, û geyayê wî jî pir e*“ (3).

Bongrad Lîvîn dibêje jî: „*Gelek lêgervanan tepelên çiyayî yên welatê wan bavpîrên hind-ewropî çespendine, û piştî lêkolînên Gamkirîlîdze û Îvanov diyar bûn, guman li ser vê yekê neman, ew listeya bêjeyên kevin yên hind-ewropî, ku wan herdu lêgervanan daniye, me bawer dikin, ku hind-ewropî li deverên çiyayî an jî pesarên wan rûniştibûn*“ (4).

Ev agahiyan û hinên din jî teqez dikin, ku çiya pareke girîng yê êkolojiya pêkhata Kurd bû, hem di serdema pêşiyên Zagrosî û yên pêşiyên Arî de, û hem jî di serdema yekbûna wan pêşiyên Zagrosî û Arî, ewên ku bi tev lihev bûna xwe, li derdora sî sedsalan berê, gelê kurd yê bi vê nasnameya xwe hatiye naskirin, pêk hanibûn. Her weha, çiya gav bi gav, ji her warên efsaneyî, ayînî, hizrî, aborî, politîkî, civakî, derûnî û ciwanî de, bi rêveçûna Kurd ya dûr û dirêj re bû, ta radeya ku em dikarin bibêjin: Çiya kilîtê kesayetîya Kurd e, û da ku em ji der û hundir ve di kesê kurd bigihên, divê em di (çiya) bigihên.

Di navbera hûnerînan re ji min vê tê xuyakirin, ku kesê kurd li kû derê be, çiya jî pê re ye, çiya di durv û mirûzê wî de, di bawerî û ramana wî de ye, di cil, stitrên û mizûka wî de ye, di rista wî ya civakî de ye, di şoreş û serkeftin û binkeftinên wî de ye.

Ev hevokan ne derbirinên helbestî ne, ku ji xeyalan

dihêrin, belê nîşanên rastiya her gotinekê hene, de di şûn û dema layiq yên vê lêkolînê de berpêş bibin.

Çiya û efsaneya kurdî

Êdî ka em ji efsaneya kurdî de dest pê bikin. Di pirtûka pîroz ya Zeredestiyê (Avesta) de gelek nîşanên belgeyan li ser tîkiliya (çiya) û erdnîgariya pêkhata Arî, bi gelemperî, û ya pêkhata kurdî, bi taybetî, hene, çî jiyana pêximber Zeredest (Zaratoştira) di navbera salên (660-573 b. z) de be, çî jî di navbera salên (630-553 b. z) de, an di navbera salên (628-551 b.z) de be, an jî di navbera salên (618-541 b. z) de be(5), tiştê piştrast ew e, ku ew (Zeredest) Medî ye, û ewî ayîna xwe li welatê Med, nêzîk gola Urmiyê ragihand, bi ser de jî hatiye çespendin, ku gelek hizr û raman û têgeh û nirx û zîmbolên efsaneya (mithology) arî ya kevin di ayîna zeredestî de hebûne, beriya ku Arî welatê xwe yê pêşî Aryana-Vîdca (Aryanam-Vaydca) bi şûn xwe de bihêlin. Hinek nîşanên li gel efsaneya kurdî tîkildar in, ev in:

* Gava qurban tê pêşkêşkirin, ev banga zeredestî tê gotin: „*Em radigihênin, û van qurbanan nemaze ji bo çiyayê Oşî, yê ku Mazda yê nûranî ye pîroz afirandiyê, û ji bo hemî çiyayên, ku bi ronahiyê pîroz in, ewên ku Mazda afirandine, pêşkêş din*“ (6).

Bangeke zeredestî ye din weha dibêje: „*Ka em bi bextewerî nimêj bikin, ji bo stêrka Tîştîrya (Eştar) ya navdar, ku bi lez di ser deryaya Varokaş re difire, wek tîrê esmanî yê ku Erxîş li çiyayên Ariyan, ji kevanê avêtiyê*“ (7).

* Welatê Aryana-Vîdca di Avesta de wusa hatiye salixdan: „*Rêberên jêhatî leşkerên xwe yên cûrbecûr bi awayê refên leşkerî li wan çiyayên bilind, ku geya (çêr) û av pir in, radixin*“ (8).

* Di ayîna zeredestî vexarîna şerbeta (Hawma) gelekî pîroz e. Ev şerbet jî geyayê (Hawma) yê rengê wî zerê zêrî e tete çêkirin. Navê (Hawma) di gelek axaftin û bangên ayînî zeredestî bi navê (çiya) re derbas dibe: „*Ez wî ewrê, ku te avdide, pîroz dikim, wê barana, ku dike tu li ser tepelên çiyên şîn bibe, pîroz dikim, wan çiyayên bilind, ku şiqînên te lê belav dibin, pîroz dikim*“ (9). „*Ey Hawma! Li wur, li ser zincûra çiyayî tu pircûreyî şîn dibî, nûka jî tu bi rengê sipî yê şîrînî, şîn dibî, nûka tu bi rengê zêrînî şîn dibî, û paşê jî şerbeta te wek derman ji bo îlhama bawermendê paqij diherike*“ (10).

* (Mîsra) yê ku gelên hind-ewropî ji dema duwemîn hezar salên b. z de perestvanên wî bûn, ew xwedayê peymanan bû, ji nêzîk de zêrevaniya bi cihkirina wan peymanan dikir, ewên di navbera êlên arî de li ser parvekirina çêrê û avê dihatin girêdan, ew xweda demekê bi şûn de wek xwedayê cengê, û wek xwedayê tavê (roj) hate pîrozkirin, û bi tavê re, di rêçûna wê ya esmanî de dibe hevalrê. Bêjeya (mîhra /mîra) li gel bêjeya (mîsra) tîkildar e, ew Mîsrayê : „*ku Ahoramezda mala wî li ser tepelên çiyayê Hara ava kiribû; maleke bilind û bi ronahî bû, tarî û şev, sarbûn û qeşa, nexweşî û mirin, û pîştîya îblîsan tê de tune bûn*“ (11).

* Zeredestiyê rê nedida avakirina peykeran, belê zeredestiyên serjêkirgehên pîroz li ser tepelên çiyên, û hin caran jî sera (qesir) ava dikirin, agir di wan serayan de ji bo rûmetkirina Ahoramazda pêdixistin, her weha bircên bilind li ser tepelên çiyên ava dikirin, termên miriyan dibirin wur, ew bircan bi (Dekme) dihatin navandin(12).

* Her ku çavên min li qubeyên ser perestgehên Kurdên ezdahî dikevin, ewên bi durvên xwe yên zirav û dirêj û rengê xwe yê sipî li ser serên perestgehên Laliş û yên din ber bi jor de bilind dibin, wêneyê (çiya) û tepela wî ya berfane ya sipî, ku ber bi esmanan de bilind dibe, tete ber çavên min, û ez dibêjime xwe, vaye (çiya) bûye zîmbola efsane, ku heye ji bêtirî du hezar salan de b. z weha ye, û bi çanda kurdî re gav bi gav çûye, heya gîhayê van qubeyên ezdahiyên.

Çiya û pêşiyên Kurd

Çiya û nasnameya Somer:

Berê jî me hizra, ku Somer pêşiyên Kurd in, dagerandibû, û em weha çûbûn, ku ewana ji devera şaristaniya Helef li Kurdistana navend dagerîne deştên başûrê Mezopotamy û şûn girtine, ew şûna ku ava kendavê jê vekşiyaye, û ji bo çandinê layiq bûye. Rastî ew e, ku ewana ji çiya veneqetîn, belê çiya di wan de û bi wan re dageriya, ev yeka di gelek warên jiyana wan de, çî eşkere û çî jî bi awayê zîmbolan hatiye xuyakirin. Van nimûneyên jêrîn vê yekê diçespin:

* Someriyên şûna xwe ya nû li başûrê Mezopotamy bi Kur-ra, ango (welatê bilind) navandin. Tevî ku ew devereke deştî ye jî, le ev pîrseke derûnî (psychology) ye, û çiya jî di wan de, di ageha wan de şûn girtî ye, û ewana dixwastin bîriya welatê xwe yê kevin û payebilind biparêzin, her weha xuya ye, ku ewana tîkilî li gel hemwelatyên xwe yên kevinên çiyayî nebîrîn, belê ewana gelek kes ji wan ji bo karên cûrbecûr dihanîn, û navê Lu-Kur-ra; ango (Kurên/lawên çiyên) li wan dikirin, bi ser de jî ewana kevir bi piranî di kolandinê û avakirina xaniyan de, wek ku derbirin û zîmbola hevgerêdana wan e li gel welatê xwe yê çiyayî ye kevin, dixebitandin(13).

* Dr. Samî Seîd El-Ehmed li ser Someriyên dibêje: „*Di her pergale de, em dibînin ku ewana çiya û welêt bi heman nîşanê (Kor) diderbirin, heye ku herdu jî li nik wan yek wate hebe, ku çiyayîya welatê wan nîşan dike, her weha ewana zîquratan bi piranî di perestgehên xwe de ava dikin, û darên birinc û serweyê, û lawirên çiyayî mîna pezkûviyên xwedî qoç û bizinên çiyayî yên qoçdirêj li ser mohrên wan yên gulover û berdirêj hene*“ (14).

* Çiya di efsaneyên Somer de jî diyar dibe. Xweda (Ênlîl), an jî (Êllîl) mezinê xwediyên Somerîya ye; Ev navê hevedudanî (Ên-lîl) wateya (mezin/serek ê ba/bahoz) dide, bi bawerîya wan ba ji çiyê de tê, vê lomê jî (Ên-lîl) di efsaneya Somer de bi paşnavê (Kur-gal) ango (çiyayê mezin) hatiye navandin(15).

* Di helbesteke somerî de wusa hatiye gotin:

„*Ey Somer! Ey gewreyê welatên cîhanê!*

Mezinê te yekekî berêz e, û şahê te li gel xweda (An) li ser dika esmanî daniştîye.

Şahê te ew çiyayê gewre ye, ew bavê xwedayên gewre Ênlîl û Enonnakî ye“ (16).

* Di helbeste din de li ser bajarê Or yê Somer wusa hatiye gotin:

„*Ey bajarê xwarinpir...*

Tu dika xêra welatî, tu wek çiyê keskî.

Tu daristana (Xwaşor) ya sihpîrî...

Çiyayê gewre; *Ênlîl navê te yê payebilin li erd û esmên ragihand*“(17).

* Di tabloweke Somer de wusa hatiye: „*Û piştî alava avakirinê û avakirina xaniyan, Ênkî (Engî / xwedayê erdê) deşt bi geya û jiyana lawiran tije kir, û xweda (Sumugan), ê bi navê (şahê çiyê) tê salixdan, wek rêvebir jê re nîşan kir*“(18).

Ciya û nasnameya Horî:

Horî jî pêşiyên kurd yê kevin in. Jînot Vilhêlm dibêje, ku ewana li derdora dawîya sêyemîn hezar salên b. z ji deverên çiyayî yê li bakur-rohilatê welatê du çeman (Bakurê Kurdistana navend) dikve, bi derketin. Tiştê nûka bala me dikşîne ew e, ku ewana li bakurê Sûriyê belav bûn, û gîhan hundir û başûrê wê, û li deverên çiyayî, an jî li kêlek çiyên cih digirtin, ewana li kêlek çemê Asî, nemaze li Elalaxê cih girtin, û gîhan Sûriyeya ber deryayê (Fînîq) nemaze jî (Ogarît), û ber bi başûr de çûn, û li bajarê Yebos (Orşelîm/El-Quds); ew jî çiyayî ye, danîştin, paşê jî bêtir bi başûr de çûn û li devera çiyayê Seîr, li geliyê Erebê (Başûrê Urduna nûka) şûnwar bûn(19).

Ciya û nasnameya Kaşî:

Berê jî bi mer derbas bû, ku Kaşî şaxekî mezin î din bû yê pêşiyên Kurd yê kevin, û ewana niştevanên çiyayên Loristanê bûn, (başûr-roavayê Îrana nûka), û dest dan ser welatê Babil, û bajarê Babil (90 Km bi başûrê Beydê de dikeve) ji xwe kirin paytext, û paşê jî şah Korîgalzowê duwem (1345-1324 b. z) paytexteke nû ji Kaşiyên re nîşan kir, navê wê (Dor Kalîgalzo) bû, bi (32) Km li roavayê Bexdê dikeve.

Tevî ku Kaşî li deştan cihwar bûbûn jî, lê çiya her tim bi wan re bû, di zîmbolên wan yê efsane de diyar dibû, xwedayên wan, nêr û mê, di awayê avakirinê de diyar dibûn, cerê avê di destan de li pêş sîngên wan bû, av bi awayê sulavan jê diherike. Xwedayê, ku di wan wêneyan de xuya dibû, cilên bi awayê baskên masiyan hatibûne neqşandin, li xwe kiribûn, û dihate nîşankirin, ku ew(xwedayê çiyê) ye, ew baskan jî li ba pêşiyên Kurd zîmbola (çiyê) bûn(20).

Di serdema Kerendeş; şahê Kaşî yê ku bi piraniya avahiyan li bajarên Babil navdar bû, di serdema wî de peykerên xwedayan di qulafetên avahiyan de diyar dibûn, „*seriyê her xwedayekî û nivê gewdeyê wî yê jor bi temamî dihate çêkirin, lê nivê jêr bi awayê kincekî dirêj, ku beşên wî zîmbola pileyên çiyên bûn ji bo xwedayên nêr, û zîmbola pêlên avê bûn ji bo xwedayên mê, dihate çêkirin*“(21).

Ciya û nasnameya Med:

Gelo li ba Medan; mezintirîn şaxê pêşiyên Kurd, li ser (çiyê) çi heye?. Bi rastî ewana çiyayînen resen bûn . Em li ba diyardeyên (çiyê) yê di navbera hezkirina wan ji azadiyê red diyar dibin, ranawestin, û ne jî li ba wan diyardeyan di hêza wan de, di rikberî û mêldariya wan ber bi serhildan û şoreşên dij zulm û zorê, di jêhatîbûn û giyana wan ya cengewerî de, di hizra wan ya polîtîka navend, di rista civakî û êlî de, di cil û bergên wan de, em li ba van mofirkan hemiyan ranawestin, ji ber ku ew hemî dê, di siyaqên layiq de bi me re derbas bibin. Vê lomê em dê tenê li ba diyardeya, ku Med bi kû ve diçûn, û li kû derê bi cih dibûn,

(çiya) jî her tim bi wan re bû. Wek nimûne em dê li ba çîroka (Gulistanên/baxçeyên Daleqandî) rawestin.

Berê jî, gava me dîroka Med bi kurtahî tev da, me dît, ku ewana çî caran serî li pêş şahên Aşor danenîn, belê her tim car li pey carê serî li hember wan hildidan, û şahê Med; Kai-Khosru/Keyxisrew, an Cyaxsares/Key-Exsar (633-484 b. z) gîhabû wê pendê, ku eniyê herêmî hev girtî, ku hemî gelên bîndestên Aşor di xwe de dicivîne , ava bike, û di pey re jî dest bi şerê Aşoriya bike, vê lomê ewî, bi boneya ku herdu gelên Faris û Med mirovên hev in, Faris tev li dewleta Med kirin.

Di pey wê re jî, Keyxisrew berê xwe da Babilîyan, hevpeyman li gel şahê Babil; Nabopolassar (627-605 b. z), ewê ku ji hêla şahê Aşor; Ashurbanipal de bûbû waliyê Babil, girêda. Da ku Keyxisrew tîkiliyan li gel şahê Babil xurt bike, ew bi zemawenda keça xwe; Omîd (Amutida/Emîts) û Nabukhadnazzar / Neboxiznessir kurê Nabopolassar qayîl bû(22).

Gulistanên (Baxçe) Babil yê daleqandî gelek navdar bûn, Yonaniyan ewana yekek ji heft susretên cihanê dijmartin, û dihate gotin, ku ew baxçena li ser stûnên gulover û di ser hev re hatibûne çêkirin, bi awayê her çînek li ser çîna din bû. Will Durant wan dîpesine gava dibêje: „*Ew keça mîr nikarîbû bi xak û tava Babil ya germ re li hev bihata, her tim bîriya keskayîya welatê xwe yê çiyayî dikir, vê lomê Nabuchadnazzar/ Neboxiznessir ji comerdiya xwe ev baxçeyên susreyî jê re ava kirin, çînek girîna şov li ser xaka wan bi qalindiya çend lîngan raxist, da ne tenê ji bo gulên û çiçekên cûrbecûr, û ji bo tîrkirina wan layiq be, belê ji bo mezintirînên daran û dirêjtirînên rehan û tîrkirina wan jî*“(23).

Bi ser de jî Will Durant dibêje: „*Bi alavên ku di wan stûnan de veşartî bûn, û gurûpên koleyan ew badidan, av ji çemê Ferêt ber bi bilindtirînê wan çînan de hildidan, û digihandin ser wî banê, ku bi qasî heftê û pênc lîngan ji erdê ve bilind bû, jinên serayê jî dêm û ser vekirî, dûrî çavan di nav wan geyayên bê hemta, û gulên bêhn xweş de, seyran dikirin*“(24).

Omîd (Amutida) keça bajarê Egbitana (Heygmetana / Cemezana / Hemezana) paytexta şahnişîna Med e, ew bajarê, ku li geliyekî qeşeng dikeve, û ava ji berfa tepelên çiyên de bi ser xaka wî de diherike, û wê xakê dewlenemd dike. Bi gotineke din: Omîd keça çiyayên Med yê bilind e, keça latan û çeman e, keça daran û gulên e, ew şûn heşt û çû deştên Mezopotamya, yê germ, lê ne bi tenha, belê çiyayên Med, tev kevir û latan û çeman, tev daran û gulên jî pê re çûn. Heye tiştê dîroknivîsan negotibe ew be, ku Omîd dar û gul, û belkî perendeyên welatê xwe jî bi xwe re birin, da her sibe û êvarê çavên xwe pê kil bide. Belê... Ma Babil ji kû ve dikane wê ji nasnameya çiyayî biqetîne ? Û eger çiya di jiyana Omîdê de, hema bi awayê zîmbolî jî tune be, ma wê çawa jiyana bi wê xweş bibe?!

***** **** *****

- (1) Jîfrî Barnder: Baweriyên ayînî li ba gelan (El-Muqedat El-Dînîye leda El-Şuob), rû 24, 66. Nûrî Simaîl: Ayîna Zeredeşt (El-Diyane El-Zeredeştîye), rû 12. B. Komlan: Efsaneyên Girîk û Roman (El-Esatîr el-Ixîrîqiye we El-Romaniye), rû 23, 88.
- (2) Bongrad-Lîvîn: Agahiyên nû li ser Rohilatê kevin (El-Cedîd hewle El-Şerq El-Qedîm), rû 273.
- (3) Bongrad –Lîvîn: Jêder û rûpela berê.
- (4) Semoîl Nûh Kirêmer: Afsaneyên cîhana kevin (Esatîr El-Alem El-Qedîm), rû 294. Jîfrî Barnder: Jêdera berê, rû 133.
- (5) Avesta, Yasna, Haytî 4, bend 19, rû 61.
- (6) Avesta, Yaşt 8, bend 6, rû 442-443.
- (7) Avesta, Yaşt 10, bend 13, 14, rû 471.
- (8) Avesta, Yasna, Haytî 10, bend 4, rû 79.
- (10) Jêdera berê, bend 12, rû 80.
- (11) Avesta, Yaşt 10, bend 50, 51, rû 484.
- (12) Will Durant: Çîroka şaristaniyê (Qisset El-Hedare), cild 1, 2/433. Nûrî Simaîl: Jêdera berê, rû 59.
- (13) Cemal Reşîd: Diyarbûna Kurd di dîrokê de (Zuhor El-Kurd fi El-Tarîx), 1/175. Mihemmed Mehran Beyyomî: Dîrka Îraqê ya kevin (Tarîx El-Îraq El-Qedîm), rû 9.
- (14) Samî Seîd El-Ehmed: Somer û kelpûra wan ya şaristanî (Somer we turasuhum El-Hedarî), rû 42. Û Fadil Ebdîl-Wahêd Elî: Ji Somer heya bi Tewratê (Mîn Sor îla El-Tewrat), rû 22 jî biner.
- (15) Siptîno Moskatî: Şaristaniyên Samî yê kevin (El-Hedarat El-Samiye El-Qedîme), rû 253, not 21.
- (16) Semoîl Kirêmer: Ji tablowên Somer (Mîn Elwah Somer), rû 179-180.
- (17) Semoîl Kirêmer: Jêdera berê, rû 180-181.
- (18) Semoîl Kirêmer: Jêdera berê, rû 182.
- (19) Jînot Vilhêlm: Horî, dîrok û şaristaniya wan (El-Horiyyon; Tarîxuhum we hedaretuhum), 24, 107. Jîn Potro û hinkên din: Rohilatê nêzik, şaristaniyên pêşîn (El-Şerq El-Edna, El-Hedarat El-Mubekkîre), rû 200. Bongrad-Lîvîn: Jêdera berê, rû 162. Peymana kevin (El-Ehd El-Qedîm), beşê pêkhatin, not 36, ayet 20, 21.
- (20) Mihemed Beyyomî mehran: Jêdera berê, rû 301.
- (21) Mihemed Beyyomî mehran: Jêdera berê, rû 305.
- (22) Diykonov: Med (Mîdiya), rû 283. Taha Baqir û hinekên din: Dîroka Îranê ya kevin (Tarîx El-Îraq El-Qedîm), rû 40-41.
- (23) Will Durant: Jêdera berê, cild 1, 2/199.
- (24) Will Durant: Jêdera berê, cild 1, beş 2, rû 199.

Kemal Tolan

ERDÊN ÊZDIYÊN LI BAŞÛRÊ ROJAVAYÊ KURDÎSTANÊ (Sûriyê)

KURTIYEK JI DÎROKA CÎH Î WARÊN ÊZDIYÊN LI

BAŞÛR-ROJAVAYÊ KURDÎSTANÊ (binêre li:*) ... Xelek – 2 –



ÊZDIYÊN LI DERÛDORA HELEB Î EFRÎNÊ (Cûmê-Cebel Sim an)

“Navê vê herêmê , ji berê û paşê de, bi navê Kurdan ve girêdayî ye. Hên di dema Yûnaniyan û Romaniyan de jê re hin caran KARDÎYA û hin caran jî KURDÎKA hatiye gotin . Ereban jê re gotine: Cebel-ûl Ekrad; û Osmaniyan jî jê re gotine: Kürd-Dağ (yanê dîsa Çiyayê Kurdan). Kurdan jî her gav gotine: Çiyayê Kurmênc. Herêma Çiyayê Kurmênc beşek e ji herêma Mîrîtiya Kurdan ya Kilisê . Ji Mîrîtiya Kilisê re, li gor mîrên vê herêmê, Mîrîtiya Mand yan jî Mîrîtiya Canpolatan hatiye gotin . Lê belê, ev mîrîtiya Kurdan, di dema geşbûna xwe de, ji herêma Çiyayê Kurmênc gelek firehtir bû. Di dema mîrê mezin de, Mîrê Mand, ji bakurê bajarê Hemayê heyani bi başurê Meraşê; û ji Derya Sipî heya bi rojhilatê Kilisê û Ezazê axa vê mîrîtiyê bû. Mîrê Mand, di dema şerê Xaçperestan (Selîbiyan) de, arikariya Kurdên Eyûbî kiribû û wan jî, wek spasî, herêma Qusêrê diyarî dabûn wî. (18:Malpera Efrîn) ”

“ Di havîna sala 1994 de Şêx Husên, yê ji gundê Xezîwê dibêje: Êzdiyên li kurdaxê li van gundan rûdinên û jimara wan weha ye;

Navên gundên Êzdiyên yê ku li navça Şikaka (Nahiya Şera) ev in:

Navê gund	Gund çend mal e ?
Qestela Elî Cindo	120 Hemû Êzîdî ne
Bafûn	70 Hemû Êzîdî ne
Qitmê	70
Şînka	14

Navên gundên Êzdiyên yê ku li navça Cumê ev in:

Navê gund	Gund çend mal e ?	Navê gund	Gund çend mal e ?
Feqîra	100 Hemû Êzîdî ne	Çeqela Cumê	10
Xezîwê	60	Îska	10
Qîbarê	50	Endarê	10
Turundê	20	Aşka Şerqî	6
Şadêrê	10	Keferzîte	5

Navên gundên Êzdiyên yê ku li navça Şêrewan ev in:

Navê gund	Gund çend mal e ?
Basûfanê	130 Hemû Êzîdî ne
Kîmarê	10
Gundê mezin jê	

Li kurdaxê cîhên Êzdiyên yê rêzdar û pîroz ev in :

Navê cîh	Li kûderê ye ?
Şêx Berekat	Li başurê gundê Xezîwê ye
Çêlxane	Li başurê gundê Qîbarê ye
Parsa Xatûn	Li gundê Qestela Elî Cindî ye
Şêx Hemîd	Li gundê Qestela Elî Cindî ye
Şêx Rikab	Li gundê Şadêrê ye

Di tevaya waqas gundan de dora 600 – 650 malên Êzdiyên hene. (16: Rûpel: 207-211)”

ÊZDIYÊN KU LI DERÛDORA HELEBÊ Î EFRÎNÊ DÎMAN

	Li gorî çavk.	Eşîrên lê diman		Çend Malên	
		Navê Gundan ev in :	Ji Binemala	Ji Xwedanê	Êzîdî
	3 : 269-273:				
1	Qestel	Dinadî Reşkan (Feqîran)	Şêxu Bekirî Şêx Mendî	51	3
2	Sinkellê	Dinadî	Şêxu Bekirî	20	80
3	Bafilûn	Dinadî Reşkan (Feqîran)	Şêxu Bekirî Şêx Mendî	7	
4	Qatme			25	40
5	Ersê Qîbar	Reşkan (Feqîran) Dawûdiyê(Feqîran) Mala Xidir (Feqîran) Mala Qaso (Feqîran) Çavreşika (Feqîran) Kaçaniye (Feqîran) Xalitî (Feqîran)	Şêx Mendî Şêx Hesenî Şêşimsî Şêx Hesenî Şêxu Bekirî Şêxu Bekirî Şêx Hesenî	55 - 60	30
6	Turunde	Şerqîyan (Feqîran) û çend malên	Şêxu Bekirî Şêx Mendî	15	15
7	Jdêdê	Feqîran	Şêxu Bekirî	4 - 5	
8	Basûta	?	Şêşimsî	2	50
9	Kimar	Xalitî	Şêx Hesenî	20	20
10	Borc Evdala	Reşkan (Feqîran) û çend malên	Şêx Mendî Şêx Fexredînî	20	25
11	Bira	Êzdiyên qelibî	Şêx Mendî	7-8	15
12	Kefîr Zêt	Pîrê Behrî ne	Şêx Hesenî	20	

	Li gorî çavk. 3 : 269-273:	Eşîrên lê diman		Çend Malên	
13	Karabaş	Xalitî (Feqîran) Reşkan (Feqîran) Şerqiyân (Feqîran) Çend malên Çend malên	Şêx Hesênî Şêx Mendî Şêx Bekirî Şêx Hesên Pîrê Omer Xalîd	30	
14	Xezewiyê	Xalitî (Feqîran) Reşkan (Feqîran) Çend malên Çend malên	Şêx Hesênî Şêx Mendî Şêx Hesênî Şêx Mendî	15	20
15	Şêx Xidir	Reşkan (Feqîran) Çend malên	Şêx Mendî Pîrê Eslanika	12	Çend mal
16	Îskan(Êzdiyên qelibî)	Xalitî û Êzdiyên qelibî	Şêx Hesênî	2-3	gelekin
17	Celkan (Êzdiyên qelibî)	Reşkan (Feqîran) Êzdiyên qelibî	Şêx Mendî	2	gelekin
18	Bi'ê(Êzdiyên qelibî)	QopanîReşkan (Feqîran)	Şêx Nasirdîn Şêx Mendî	2	gelekin
19	Bosûfan	Şêxên	Şêx Nasirdîn Şêx Mendî	20	2
20	Kibêşîn	Qopanî	Şêx Nasirdîn	5-6	Çend mal
21	Farfatîn (Êzdiyên qelibî)	Qopanî	Şêx Nasirdîn	Berî pênc sala 5	tev
22	Kefîrşîn (Êzdiyên qelibî)	Qopanî	Şêx Nasirdîn	Berî çend sala 20	tev
23	Gundê Mezin(Zoq el Kebîr)	Şerqiyân	Şêx Bekirî	25	10
24	Başemra	Qopanî	Şêx Nasirdîn	4	10
25	Borc el Qas	?	Şêx Bekirî	10	1

” Çend navên gundên Êzdiyan ku li derûdora Kilîsê diman ev in:

Mehrevî	Burc-ul Qaz	Baskal	
Abu Kaab	Kifrmazin	Kifr Yezîd	
Kevkeb	Qatmî	Qastal	Arşuqîkar

Navên gundên Êzdiyan ku li derûdora EFRÎNÊ ne ev in:

Gundên ku Feqîr lê diman: Kimar, Basufan , Bavlovan û Qeza El-Ma'ara, Azez, El-Cevme.

Hêjayî gotinê ye, di salên 1950 de 40 gundên Êzdiyan ku li derdora qezên di nava Suriyê de bi tevayî qelibîne bune Musilman. (5 : 272 - 273) »

“Navên eşîrên Êzdiyan yê li derûdora Heleb, Azaz û EFRÎNÊ diman ev in:

Dinadiyan	Dawidî	Kaçanî
Şerqiyân	Reşkan.	Xalitî

(3:196-213)”

“Hin malbat ji êlên herêmên Kurdistanê yê din jî li Çiyayê Kurmênc peyda dibin wek: Dinî, Hevêdî(Hevêrkî), Zagî û hwd.. Gundên bi navê Xerzan, Xaltan, Dimiliyan û Behdînan xweş didin xuyakirin, ku pêwendiya wan bi kîjan êl û herêmên Kurdistanê re heye. Êzîdî berê li vê herêmê gelek bûn, lê niha ew ne ewqas pir in. Bi tenê çend gund mane, ku bi giştî hên êzîdî ne. Li hin gundên din ew nîve-nîv in.(18:Malpera Efrînê)”

« Zilm û zordariya ku li kurdên Êzîdî dibe, ji ya kurdên Misilman du cara zêdetir e. Qedexekirin di jiyana van kurdan de ji hemû aliyê ve rû dide û dibe kelemekî mezin di riya pêşveçûnê de.

Di warê civakî de, komara Sûriyê timî hewil daye, ku civata Êzdiyan ji hev cuda bike, da qena tu têkiliyên xurt di nav wan de çê nebin, lewra avakirina komele, navend û civat di bin çî navî de bin, qedexe ne. Çi pîrsgirêk di nav Êzdiyan de peyda bibe, gereke di bin çavdêriya organên parastinê de werin çareserkirin.(Heger çareser bikin ?).-Çavk. :17 . Rûp. :71-72 »

Belê, em dizanin û ji bîra nekin, hemû netew û dewletên ku Kurdistan dagirkirine, naxwazin tucara meriv di derheqê Êzdiyan de tiştê rast bizanibe. Dagirker û Paşweruyan gelê Kurdistanê yê herî kevnare di nava xwe de helandin û ew mecbûrî koçberiyê kirine. Ji bo ew dikaribin cî û warên Kurdên Êzîdî li hev parebikin û şopa hebûna Êzdiyan tam wenda bikin, ewan hemû qanûn û nizamên xwe li gorî menfêatên xwe çêkirine, lewma jî çiqas navên gund û paşnavên Kurdan hebûn qedexe kirin, çî mulkê Êzdiyayî hebû, tev ji destên Êzdiyan derxistin, tapû û qoçanên wan yê heyî çirandin û bi sedan gundên Êzdiyan li hev parevekirin.

Her weha weke ku ez dibînin, êdî kesek di nava me Êzdiyan de tûne ku dikaribe di derheqê hêjmara Êzdiyan de agahdariyeke rast bide. Gelek ji van agehdarî û tiştên hatine yan jî tene gotin, tenê gumanên evdan e.

Bila xwandevanên hêja min afubikin:

Gelek ji we dizanin ku ez ne ji başûrê rojavayê Kurdistanê me û min ev herêmên Êzdiyan nedîtine. Ji ber vê yekê jî, ez mecbûrbûm ku di hinek cîhan de nav û bajarên Kurdan weke zimanê xwediyê nivîs û gotarê binivîsînim.

Qamişlo

Di evîna welat de dilekî pir jen e

Mihemedê Mele Ehmed

Xelek – 2 –



Civata Qamişlo

Ji bo em civata Qamişlo nas bikin, emê di sê qunaxan re lê binêrin.

1. Dema mandata Firansa
2. Qunaxa yekem ji hikmê erebî (ji serxwebûnê ta sala 1958 an)
3. Qunaxa didowan ji hikmê erebî (ji sala 1958 an ta niha)

1. Dema mandata Firansa

Ji bo ku Firansa desthilatdariya xwe li Cizîrê xurt bike, siyaseteke gelekî xirab li ser xelkê wê gerand. Milet berdida hev û ew jev cuda dikir û kir ku bi çavên neyartiyê li hev binêrin. Ev xirabiya he gihand kesên Qamişlo jî, û ew pê hatin êşandin. Malbatên ku siyaseta Firansa li sûriyê, an li cizîrê, ne dipijirandin li cem desthilatên firansî ne di cihê layiq de bûn. Lê zilamên meylardên wan di gurbûna xwe de bûn, zordariya xwe li xelkê dikirin; kêman bûn ew kesên ku kari bûyana li wan vegeştin.

Ev siyaseta he hêşt ku ferq, cudabûn û newekhevî di taxên Qamişloyê de jî bîn xuyakirin. Hin tax biçûk bûn, xelkê wan ji nijadekî, yan ji olekî bûn, xwe li hev digirtin; cuda ji xeynî taxan, weke Gîto ji xwe re çê dikirin, mîna Cuhîwan, behra gelek ji wan, tenê bûn. Kenîsa wan di nivê taxa wan de bû, civata wan taybet bû, lê peywendiyên wan û bazirganiya wan bi miletên din re hebû. Bêhtirê wan karê firotina qumêş û eterî dikirin.

Ermenî jî welê ji xwe re bûn, xwe li dora hev girti bûn, dêra wan nîzîkî wan bû. Lê hinek ji yê de vera Bişêriyê li taxa Bişêriyê rûdiniştin û malên xwe li wê derê ava kiri bûn, evên he bi Kurd û Siryanan re dijîn. Gelek ji Ermenîyan, nemaze yê ji Heleb û Dêrezorê hati bûn karê pîşe (sin'et) ya hesinî dikirin. Wan ev kar di nav xwe de dihêştin û xeynî xwe şehrezayê wê ne dikirin. Bi rex hinek ji wan, nemaze yê ku ji Bişêriyê hatine, karê çandinya zadî dikirin.

Lê Siryan, yê ji Ezex û çiyayê Torê, Midyat, Mêrdîn, Diyarbekirê û ji derên din hatine, di rojavayê sûka navendî û taxa Cuhîwan de rûdiniştin.

Di taxa Qedûr beg û Bişêriyê de jî bi Kurdan û Ermenîyan re malên xwe ava kirin. Wan jî dêra xwe di nav xwe de ava kirin û karên cuda cuda dikirin. Lê hemû wan, di karên xwe de, bi xeynî miletan re danûstandin û bazirganî dikirin.

2. Qunaxa hikmê erebî yê yekem (Ji serxwebûnê ta yekîtiya bi Misirê re)

Di navbera salên 1946 û 1958-an de Cizîr, nemaze jî Qamişlo, bû bû bajarêkî vekirî ji hemû kesan re, ji hemû nîşan re, yê ku bikarin xizmetê ji bo miletê xwe bikin û sûd û kelkê bigihînin welêt. Lewre birex kesên wê yê berê, weke Kurd, Ermen, Siryan, Cuhî, Aşûrî, Çerkes û Kildanan, gelek kes ji bajarên Sûriyê weke Heleb, Udlib, Hema, Hums, Şam, Horan, Siwêda, Ladiqiyê û xeynî wan jî, ji bo kar li Qamişlo, bi piranî dihatin xuyakirin, nemaze di Havînê de, dema dest bi kar û barên çinîne dikirin. Herwiha jî di sûka Qamişloyê de, navenda bazirganiya Cizîrê, û gihandinheva riyana û şopan, weke xeta tirêna ji Tirkiyê diçe Bexdayê (Tirêna Rojhilata Lezok) û ya ji qamişlo diçe Şamê, û birex xeta firokan navbera Qamişlo û Heleb û Şamê de, û riyên otomobîlan di nav bajarên Cizîrê de, û Tirkiyê de, bi riyê Nisêbînê, û bi Mûsilê re.

Bi rex hebûna bengên peran, weke benga Sûriyê û Libnan, û benga Sûriyê ya bazirganî û benga deynên gelêrî. Ji bilî firmên makînen çandinyê weke ya Katîpîlar û ya Intirnasyonal, an weke firoşgehên parçên otomobîlên biçûk an mezîn, an makînen çandinyê, weke makînen çinîne an yê hûrkirin û bêjîngirin an yê dîskên rakirna şovan, an terektoeren her awayî. Bi van karan re jî, hebûna pitrolê di Qereçoxê Cizîrê de.

Bi vê rola aborî ya mezîn re, me ji destpêka salên pênciyên de dît ku Qamişlo bibû navendeke siyasî-çandî ji bo hemû Cizîrê. Partiyên wê yê gelek, weke Partiya Demokrat a Kurd, a Komonîst, a Be'is, a Niştîmanî, a Gel, a Qewmî Sûrî; a Îxwan el-Muslîmîn û partiyên siryanîyan û yê ermenîyan jî. Van hemûyan tevgereke siyasî û çandî lê peyda kirin û hêştin ku Qamişlo di demokratîyê de û di danûstandina civakî de ji xeynî xwe belûtir bibe, û li ser peywendiyên Firansa yê cudabûn û ne wekhevîyê ket. Lewre rûkî bajarvanî yî geş nîşan da, hêşt ku navê Qamişlo bilind û belav bibe. Û bajar di aliyê avakirne de pêş de çû, fireh bû, û xelkên wê hemûyan bi hev re kirin ku navê wê bi tîkilyên wan ên dostanî, hevaltî û biratiyê bi ser keve û bajarvaniya wê berçav bibe.

Di aliyê aborî de hemûyan bi hev re kirin ku pêş de here, di ked de bilind bibe, bazirganiya wê di Cizîrê û Sûriyê de fireh bibe, xêr û bêr li kesên wê bibare û bi xweşiya destfirehiyê bihesin. Hemû li dora hev kom bûn, paywendiyên xwe bi hev re xurt kirin û rê ne dan ku çavreşiya dema Firansa, an zikreşiya nû, di nav wan de peyda bibe. Partiyên wê hemû di nav milet de dixebitîn, lê xirabî di nav de ne dihêştin (weke çawa Firansîzan dihêşt).

Holê me dît hemûyan di cadên Qamişlo de ruhê welatperweriyê xwedî dikirin, di qucikên xaniyan de hestên netewî gur dikirin û di civatên xwe de ruhê mirovantiyê dijenandin.

Bi vî awayî Qamişlo bû bû bingeha bajarvaniya

hevkar. Gavên mezîn di paqijî û tendurustiyê de avêtin, û durhên bajarvaniyê lê xuya kirin. Boriyên ava paqij û xetên elektrîkê di nav hemû bajêr de belav kirin; avahiyên nûjen lê peyda bûn, cadeyên fireh, dirêj û rast hatin xuyakirin; xelkên wê zêde bûn, taxên wê fireh bûn, baxçe di nav bajêr de hatin çandin û saz kirin; dibistanên keçkan û kuran, yê seretayî û yê navîn, yê dewletê an yê milet, pîr bûn; yaneyên werzişî û civatên arîkariyê belav bûn; rojname lê peyda bûn (Kurd ji van bê behr bûn); sîneme, çayxane û otel pîr bûn; pirtûkxane, navenda kultûrî û firoşgehên rengeng di nav bajêr de belav bûn.

Hemû kesên bajêr, ji salên çilan û penciyên û destpêka şêstan ve, beşdarê vê tevgera bajarvaniyê bûn, ji wan navên jêrin tên bîra min:

û Bijîşk. Ji salên sihan û çilan dr. Ehmed Nafiz, dr. Pol Silavaykov (Bulxar) û dr. Momocyan. Ji salên pênciyên dr. Mihemed Xêr el-Wahidî, dr. Ednan Begdaş, dr. Refîq Ebû el-Sî'ûd, dr. Qenewatî, dr. Hebaş, dr. Miskî, dr. Seysiyân, dr. Dara Arif, dr. Qasim Miqdad û dr. Ebdilcebar Yûsifan. Di dû wan re gelek bijîşk li bajêr peyda bûn.

û Serokên desgeha bajarvaniyê (belediyê): Ebdilmesîh Sefer, Can Tewîl û endezyar Ferid Anawîs.

û Parêzer. Bêhtirê parêzeran ji bajarên hundurê Sûriyê bûn; weke: Elyas Dubaî, Corc Endirawîs, Corc Ebû Eselî, Kemal Qedûr Beg, Mişêl Eso, Ebdilezîz Hesên Beg, Corc Sefer, Nihad Eclûnî û dû wan re gelek parêzer li bajêr peyda bûn.

û Efser: cinêral Tewfîq Nizamedîn, serheng Tel'et Qedûr Beg, kaptên Osman Haco, cinêral Nihad Ebdilrezaq, kaptên Mecîdê Haco, û xeynî wan jî, yê ku navên wan nayên bîra min.

û Ji navdarên bajêr, ji bilî yê me bi nav kirin, gora tê bîra min: Arif Beg Ebas, Cegerxwîn, Osman Sebrî, Mela Ehmed Zivingî (miftiyê qamilo), Silêmanê Haco, Mela Ehmed Namî, Mela Ehmed Şûzî, Mela Ehmed Êrsî, Mela Tahir Mela Hamid, Yûsif Mîrza, Ehmed axa Derwîş, Ebdê Têlo, Hesên Hişyar, Ezîzê Zazî, Eliyê Zazî, Mihemedê Pilîko, Xelîlê Osman, Mihemedê Heskê, Mihemedê Remîko, Hisênê Es'ed, Cemîlê Bîrahîm, Ebdilbaqî Nizamedîn, Zekî Nizamedîn, Reşad Hac Elî Beg, Subhî Hac Elî Beg, Zekî Çelebî, Ebdîrezaq Çelebî, Tewfîq Çelebî, Ebdîrihman Perê, Ebdîlrezaq Perê.

û Ji xelkên Dêrezorê li Qamişlo: malbata Humîş, malbata Sabit Medad, malbata Hedîdî, malbata Hibîl û xeynî wan jî.

û Ji Siryanîyan: mala Esfer û Necar, mala Hedayê, mala Mî'marbaşî, mala Terzî başî, mala Esmer, mala Gelo Şabo. Û ji dema firensîyan ve: Mişêl Dom, Mişêl Eso, Dawûd Hana, Çermûklî û Qewmê û xeynî wan jî.

û Ji Ermenîyan: Xaço Şero, Manok Gerebêtyan û xeynî wan jî.

û Ji Cuhîwan: Moşê Zixeyîr, m'elim Barox, Izra yê etar, Ferec Samih, Samihê berber, û xeynî wan jî.

û Ji Helebiyan: Zekeriye Cemîlê û birayên wî, mala Hesên Cibare, mala Ebdo Refî'e û xeynî wan jî.

û Ji navdarên Partiyan. Ji Partiya Komonîst: Arakêl Madoyan, Remo Şêxo, Osman Birahîn, Cegerxwîn û Mîşêl Eso û Nûrî Ferhan û xeznî wan jî. Ji Be'îsyan: Bedrî Simaîl, Hesên Ebdilfeta, Amanûel Lebîb, Ebdirehman Besîr û xeynî wan jî. Ji Partiya Qewmî Sûrî: Enîs Midêwayê, Corc Hermûş, Ilyas Rehawî, Zekî Nizame dîn. Ji Partiya Ixwan el-Muslimîn: Hac Reşîd Yûsifan, Mihemed Şêxê û xeynî wan jî. Ji Partiya el-Nasiriyûn: Silêman Haco, Xelîl Sabit Medad û Ebdilrah Xelûf û xeynî wan jî. Ji partiya Gel: Ebdilbaqî Nizamîdîn. Ji Partiya Niştimanî: Hesên Haco, Reşad Hac Elî Beg û Kemal Qedûr Beg. Ji Tevgera Demokrat a Kurd: Mihemedê Mela Ehmed, Ebdilezîzê Eliyê Evdê, Derwêşê Mela Silêman, Samiyê Mela Ehmedê Namî, Ebdilayê Mela Elî, Xalidê Meşayix, Mihemed Mistefa, Ebdilsemed Mela Xelîl, Mela Mihemed Neyo, Mecîdê Haco, Mihemedê Fexrî, Ezîzê Dawê, Tahîrê Sifûg, Yûsif Simaîl, Ebdilletîf Elî Ebdê, Ebdilbaqî Elî-Xan, Hesên Bişar, Ezîzê Omerî, Nûrî Hacî, Selah Bedrîdîn, Ebdilrezaq Mela Ehmed, Êdîb Heybet, Şemsedîn Mihemed û xeynî wan jî. Dû re bêhtirê serdarên partiyên Kurdan hatin li Qamişlo rûniştin, weke Hemîdê Hacî Derwêş, Ismaîl Omer, Ismet seyda, Fûad Elîko, Hesên Salîh, Ebdilbaqî Yûsif, û berî wan Kemalê Ehmed-Axa û Nezîr Mistefa li wê derê bûn. Û holê Qamişlo bû navenda tevgera siyasî ya kurdî li Sûriyê.

Ev kesên he hemû, û kesên Qamişlo yê din, bi hev re beşdarê pêşdeçûna wê bûn. Wan hêst ku bajar ji aliyê avakîrî, paqîjî, tendurustî û di hemû aliyên bajarvaniyê de pêş de here, ta navê wê bilind bû. Heryek ji wan roleke xwe di aliyê jiyana bajarê de leyîst, weke hîlbijartina jîbo perlemanê Sûriyê.

Di wî çaxî de dibûn bir, li hember hev disekinîn û ji bo serketinê berberîtiya hev dikir (destê hukûmetê di hîlbijartinan de gelekî dirêj bû), weke ya sala 1954-an û ya 1962-an, lê dema ev bûyera he bi dawî dibû vedigeriyan weke berê, heryekî ji bo pêşdeçûna welat û bajarê karê xwe dikir.

3. Dema hikûmeta erebî ya didowan (ji sala 1958 an, ta roja îro)

Dema dora dewletê ji bo avakîrîna bajarê û pêşdebirina peywendiyên civakî, çandî û aborî hat, û ji bo gavan bal jiyaneke demokrat û şaristanî ve bavêje, mixabin, ronahiya berê bi siyaseta xwe ya çewt vemirand û bi kêlbên nijadperestîya xwe û bi cudabûna li nav welatîyan kar anî, şewqa hevkaîya bajarvaniya wê çilmisand, civata wê jê xist û taromaro kir; ew veşerand dema Firansiyan, ji cudabûn, bendîtî, çavreşî û newekheviya li ser bingehê cudabûna netewî, nijadî û endamtiya partiya Be'îs.

Holê siyaseta jêxistina millet û dîrkirina wî ji hev bû karê dewletê, digel ku ew serdestê wî welaî bû. Bi ve re zilamî, keysdarî, paşgotinî û qelewêzî pir bû bû; durûyî û bêbextiyê, hember rastî û dilsoziyê gur bû bû. Holê mirov dibîne ku bermayê wê siyaseta qirêj gelekî li ser welatîyan giran û xirab bû – şûna wan bike yek, ew berdand hev, ew ji hev dûr kirin. Xelkê wê, bi siyaseta xwe ya aborî, belengaz kir. Rûmet di bin siha şeperzetî û bertîlan de şikest, ta radeyekî li pariyê nanê xwe digriyan, ewê biyaniyên hejmara wan zêdebûyî dixwarin, an di Havîna germ de midîkarê misteke ava paqîj bûn, lê diman heyirî, û biyaniyan di nav gola wê de sûbahî dikirin.

Û holê ji aliyê aborî ve, hember siyaseta dijîtî, bêarîkanî û bêamadakirina pirojên aborî, bajar bi paş Cizîr ket.

Bazirganiya wî, çandiniya wî bi paş ket. Çanda wî jî xurû bû çanda nijadperestîya be'îsî.

Havîla zordariya desthilatên nijadperest û zora dezgehên parastinê hêst ku birêvbiriya bajarê, an ya parêzgehê, an ya perlemanê di destê Be'îsî û hevalbendên wan, yê binav tenê, bimîne, bê ku guh bidin tu kesan, an tu netweyan, yê mafên wan her û her winda.

Aboriya Qamişlo

zemîneke deşt e, ji zemînen Sûriyê yê bi xêr û bêr e. Bi rex dewlemendiya wê bi pitrolê, têtê naskirin ku ew cihê çandina genim, ceh, pembû û xeynî wan e jî.

Bajarê Qamişlo di nivê bakur de dikeve, roleke wî girîng di gihandinheva bajar û gundên rojhilat û rojava bi bajarên hundirê Sûriyê ve, û bi yê Tirkîye û Iraqê ve jî, heye. Çimkî xeta hêsîna ya tirêna ji Tirkîyê diçe Bexdayê (Tirêna Rojhilat a Lezok) di ber re diçe. Yeke di jî diçe Dêrezor, Heleb û Şamê. Herwiha xeteke sazîkî ye firokan di navbera Heleb û Şamê de jî heye. Yê otomobîlan jî di navbera bajarên Cizîrê û yê hundirê Sûriyê de heye. Bi Tirkîyê (bi rêya Nisêbinê û bi Mûsilê re jî heye.

Çandiniya zadan di pêpelûka yekemîn ya aboriya Cizîrê de ye. Ew, bi rex xwedîkirina pezan, cihê herî girîng digre. Evên he, û bazirganiya bi gundan re, aboriya Qamişlo timam dikin. Hukûmetê tu karxane lê ava ne kir, ne jî hêst tu kes ava bike.

Çandinya wê bi ava baranê ve girêdayî ye. Lê hinek omîda xwe bernadin ser ava baranê tenê, ya ku sal bi sal kêr dibe – ji xwe re bîrên *irtimazî* dikolin û çandinyên xwe pê av didin. Lê gelek bûna van bîran dihêle ava binê erdê kêr bibe û têra avdana hemû çandinyan neke. Lewre eva, kêmbûna baranê û hin sedemên din dihêle ziyaneke mezin bigihe aboriya Qamişlo û welêt, û şûnemayên xwe li ser jiyana xelkê bihle. Digel vê jî desthilatên dewletê ava çemê Dide yê nîzik nakşînin û erda Cizîrê pê av nadin. Hin taxên Qamişlo di Havîna germ de bê, an kêr, ava vexwarinê dimîne.

Ji aliyê aboriya pezan ve, hozên ereb bêhtir ji ên kurd guh dan xwedîkirina wan, ew jî bi sedema siyaseta nijadperestîya hukûmetê. Çimkî Kurd man bê erd û çêregeh, nemaze piştî ku hukûmetê dest danî ser erdên wan. Ev xwedîkirina pezan roleke xwe ye girîng, bêhtir ji ya çandinyê, li cem Ereban heye, digel ku hukûmet gelekî dike ku Ereban bi erdê ve girê bide, lê pê re naçe serî. Çimkî ew Ereben ku dibin xwedî erd nikanin xwe pê mijûlbikin û bi barê wê rabin. Lewre wê bi behîr didin dewlemendên bajarê. Ew jî bê kar li mala xwe rûdinin, an bi pezên xwe ve mijûl dibin.

Di salên çilan û pênciyên de li Qamişlo tevgera bazirganî ye fireh di navbera wê û gundên wê û bajarên Cizîrê de hebû. Di bingehê xwe de li ser kirîn û firotina genim, ceh, birinc, nîsk, nuhk û pembû; ya pezan jî, goşt, çerm, hirî, rûn û xeynî wan jî bû.

Dema guhdan ji zêde re zêde bû û erd hemû hatin çandin, makînen çandiniyê pir bûn û gelek dikanên serastkirina wan vebûn; weke ya terekoran, diskan, yê çinîna wan, yê rakirina şûvan û yê reşandina tovan, û hemû nîfşên wan û yê otomobîlan. Bi rex van hin karên kevîn ên bi dest jî li Qamişlo hebûn, weke çêkirina merşên biçûk yê malan, çêkirina kulavan, bûyaxkirina qumaşan, çêkirina qunderan, dirûna çilan, karê necarî û ya hesînî, çêkirina zêran û xeynî wan jî. Hember van hemûyan, ji hundirê sûriyê,

sûriyê, nemaze ji Heleb û Şamê, hin tiştên gerekên malan, zînet û xweşikîrî tanîn.

Dibistan

Dema Firansiyan dest bi avakîrîna Qamişlo û saziyên wê kirin, dibistan jî lê ava kirin. Di salên sihan de dibistaneke seretayî ji kuran re ava kirin (niha cihê wê mekteba Partiya Be'îs, ş'uba gundan e). Di destpêka salên çilan de me dibistaneke seretayî ye fêrmî ye keçan, nîzikî dibistana kuran û mala misteşarê firansî, dît (niha xaniyê hember baxçeyê ye ku bi navê Bilûdan têtê naskirin). Dibistana keçan ya dewletê ta salên pênciyên – dema dewletê hin dibistanên din jî ji keçan re ava kirin – yeke tenê bû. Xwendekarên dibistana seretayî bi pênc polên xwe ve, bi rex polek ji herî biçûkan re (hedane), zimanê erebî dixwendin (zimanê firansî di polê pêncan de dihat xwendin). Xwendekarê dibistanê piştî xwendina pênc polan (sefan) belge nama (şhada) sertefîka bidawîkirina xwendina seretayî distand. Ew jî piştî ku dewletê *fehseke* giştî ji hemû xwendekarên sefê pêncan re, yê li qeza Qamişlo, bi hev re di cihekî mezin de, weke odên (salon) qîşla leşkerî ya li Qamişlo, çê dikir. Weke çawa bi min û hevalên min re di sala 1949-an çê bûyê. Niha ev awayê fehse bi xwendekarên sefê nehan û yê diwanzdehan re çê dikin.

Di wê demê de, ji bo hînkirina xwendekarên dibistanên Cizîrê, xwendin û nivîsandin bi zimanê erebî bû, û bi sedema ne bûna mamostayan li cizîrê hukûmetê hin mamostayên xwendegehan ji bajarên hundirê Sûriyê tanîn Cizîrê.

Sala 1944–1945 ji xelkên Qamişlo tenê çar mamosta hebûn: Henne Midêwayê birêvebir (mudîr) bû, Kerîm Gebriêl û Cubraêl Hayîk û Fehmî Stembûlî jî mamoste bûn. Ta destpêka salên pênciyên ji kesên Qamişlo tenê ev mamoste man, dema Henne Eslan jî bû mamoste. Dû wê salê re ez û hevalê xwe Osman Segvan, di destpêka sala xwendinê ya 1953–1954 an de bûn mamoste (ez li Qamişlo, û ew li Tirbispî). Di sala dû re, yanî ya 1954–1955 an de, hevalê min Xelîl Sabit Medad bû mamoste. Û di salên dû re heval Ebdilfeta Salîh û Hesên Hisên û Isa Xemîs û xeynî wan jî ji xelkên Qamişlo bûn mamosteyên dibistanên wê. Ji destpêka sala xwendinê 1958–1959 an ve xwendina seretayî, ji dêlî pênc salan, bû şeş sal.

Dema şagirtên dibistanan xwendina xwe ya seretayî li Qamişlo bi dawî dikirin, neçar dibûn herin bajarê Hisîça, da ku xwendina xwe ya navîn di xwendegha wê (techîz) de ta sefê diwanzdehan berdeham bikin. Çimkî li Qamişlo, ta sala 1950-î, xwendegha navîn tune bû.

Dibistana seretayî ya dewletê ji bo kuran li Qamişlo ta sala 1947-an yeke tenê bû. Dema şagirtên dibistanê zêde bûn, hingê hukûmet neçar bû dibistaneke nû veke. Cihê wê li ser cada navbera qîşlê û seraya hukûmetê, nîzikî girtegihe, di xaniyê karmendekî firansî de bû (dema zîndan nû kirin, erdê wî xanî berdand ser erdê zîndanê). Di sala di de, yanî sala 1948-an, dibistan ji wê derê guhastin û birin hewşa dêra erman a katûlik (niha hember seraya hikûmetê ye) cih li wê derê jê re çê kirin. Di sala dû re jî ew birin taxa Qedûr Beg.

Bi sedema zêdebûna şagirtan di sala 1951-ê de sefê şeşan vekirin, weke destpêka sefên xwendegha navîn..... **Dumahî heye.**

Hevpeyvîn bi

Tîtalê Kerem re

Bi rêzdar Tîtalê Kerem, edîtor û redaktorê rojanama „RYA TEZE“ ra hevpeyvîneke zindî!

Sedîqê Basî: Birakê Tîtal, ez xwe gelekî bextewar dibînim ku, ez îro(29.07.13) di nav vê avaya radiyoya Êrîvanê de li te bûme mêvan. Kekê Tîtal ev çend salên ku hûn di vê rojnama „RYA TEZE“ de dixebitin?

Tîtalê Kerem: - Wexta rêzdar Grîşayê Memê di payîza sala 2010 de emrê Xwedê kir pê ve, rewşenbîrên me qirarkirin, wekî ez vî karê „RYA TEZE“ bigrime ser milê xwe. Lê xebata min a di radiyo ya dengê Êrîvanê de, ji sala 1990 ve despêkiriye.

Sedîqê Basî: Di beriya vê rêwîtiyê de, min û Pîr Xidir bi hevûdinê ra xeber da û ewî xwast ku tû bersiva vê pîrsa wî bidî. Pîrs jî wehaye: Weşana „RYA TEZE“ her roj, heftiyê anjî ji mehê carekê û çend hêjmar têneçapkirin?

Tîtalê Kerem: - „RYA TEZE“ heta sala 1991-92 di her mehekê de, heşt caran û ji bo tamamiya hêla Sovyetê derdiket. Ev hêjamar paşê bere bere, di ruyê finansê ne baş de kêmbû, êdî em nikarin wisa zêde derxin. Em niha di her mehê de, hêjmarekê bi 500 hebî derdixin û wan jî di nava cîmaatê de belaş baladikin.

Sedîqê Basî: Birayê Tîtal, gelo ji bo derxistina 500 hebî çiqas pere lazime ?

Tîtalê Kerem: - Em niha „RYA TEZE“ reş û spî derdixin, lê eger em wê bi reng derxînin, hingê ji bona 500 hebî nêzîkiya 300 dolarî lê mesrefê dibe.

Sedîqê Basî: Raste ku Bingehê Laliş ji te ra jî gotine, emê eseh piştgiriye bidine „RYA TEZE“ û divê hûn jî hêjmarên çapa wê zêdebikin?

Tîtalê Kerem: - Belê kekê Şêx Şemo, serokê Bingaha Lalişê jî di rêya telefonê de ev daxwaza ji min ra got. Min berî niha tenê ji bo mesrefê çapê got 300 dolar e, încê ji xeynî wê derxistinê jî, hîna mesrefê kiriya oda, elektrîkê û hinek xercên hûre din jî hene. Ji ber ku di zivistanê de gelek elektrîkê tê şixwîlandin û em nikarin hewqas mesrefê elektrîkê bidin, em nikarin di oda sar de de zêde kar bikin. Şêx Şemo gote min, emê li ser vê pîrsê bisekinin û dawiyê de xeberekê jî bidin te.

Sedîqê Basî: Emê jî, bêjine serokê Bingaha Laliş Şêx Şemo, em hêvîdarin ev „RYA TEZE“ weke symbolekê di nav civaka mede bimîne, bigihîje wî cîhê ku layîqe û bikaribe hêjî temenekî dirêj di nav civakê de bimîne?

Tîtalê Kerem: - Ez jî we zor zor spasdikim ji bo vê yeka we. Hela ji xeynê wêyekê jî, ez bêjime birayê xwe Sedîq, kek Derwêş Ferho, serokê Estîtuya Kurdî a li Brûkselê jî ji sala 2009 hetanî 2011 alîkarî dida me. Her weha ez birêz Kemal Tolan ra jî, spasîyê xwe eyandikim ku wî hinek pere ji bo alîkariya rojnama „RYA TEZE“ dabûne te û spas ji te ra jî ku te ew bi xwe ra anîn teslîmî min kirin.

Pey wê ra, wele em belaş kardikin û em dêjên, bila ev rojnama „RYA TEZE“ ya ku emrê wê 83 saliyê neyê girtin. Miletê başqê yê ku emrê çapemeniya wan bêjim 10 anjî 20 sal e, gelekî pêşanazin û ya me 83 saliyê heyf ku meriv bigre. Gelek kes nabêjin anjî nabînin ku rewşa aboriya rojnama „RYA TEZE“ ewqasî çetîne û nabêje ka emê jî bi van zahmetiyan ra alîkariya aborî bikin. Ez bi rastî bêjim, di nava van çend salên ku ez tê de kardikim, gelek cara ez jî acis bûme, lê ez dibêjim bila ev keda hêja bi destên min neyê girtin. Ez gelekî şerm dikim wekî hinek bêjin, rojnama emrê wê 83 salî bi destên redaktor Tîtalê Kerem hate girtin.

Sedîqê Basî: Ez jî di nava civata me Kurdan de dêjim, Kurdên me hêjî di bin bandora serokê partiya xwe de ne. Serokê partiya çewa bifikire, endamên di bin wî ra jî weke wî difikirin. Kurdên me hêja li bakur, başûr, rojhilat û rojavayê Kurdistanê de ne bûne netewî. Eger ku ew bi netewî bifikiriyana, hineka ji wan jî yê bikaribûna mîna birêz Dewrêş Ferho nêzîkê vê rojnama Kurdî ya herî kevn bibûna û ew biparêstina. Gelo tû karî ji me re bibêjî, ka ji xeynî birêz Dewrêş Ferho kî nêzîkê vê rojnamê bûne ?

Tîtalê Kerem: - Belê di pêşiya karkirina min de, kî çiqas alîkarî kiriye ez baş pê nizanîm. Lê min bihîstiye ku birêz Emerîkê Serdar çûbû Kurdistanê, mam Celal Telebanî jî li Silêmaniyê hinek alîkarî dabuye wî ji bona „



RYA TEZE“. Wekî din jî çawa min gudarkiriye, hinek lestick jî li ser „RYA TEZE“ hebûne, hinek rewşenbîran ji min ra gotin ku, ewan hinek alîkarî ji bo „RYA TEZE“ şandibûn, lê ev alîkarî ne gihîşte ber destên me. Jixwe wexta ez jî carekê çûm li Kurdistanê tevî konferansa 14 sal vegeriya rojnamegeriya Kurdî bûm, min hingê derheqa wê pîrsê da xeber da û got hal wezîyet çewa ye. Lê, li wira merivan ji min ra gotin, „RYA TEZE“ kirine ticaret“. Min jî ji wan re û gote birêz Hesên Silêvanî, hûn niha wisa dibêjin û dizanin ez berpirsyarê rojnamê me. Çima hûn bi gura merivên başqê dîkin? Wekî hûn rast dixwazin bizanîbin, tû ticaret nîne û berpirsyarê rojnamê ez im. Divê hûn tîkiliyên xwe raste rast bi min ra girêdin û ne bi destên merivên başqê ku yek wiyalî, yek wiyalî ji bona „RYA TEZE“ dike qareqar, lê ew xwe bi xwe jî li vira kar nakin.

Sedîqê Basî: Ez wê rojê li Êrîvanê çûme dawetekê û min bihîst ku gelek dewlemendên Êzdiyan li nav Rusya, Gurcistan û Ermenistanê jî hene. Gelo pêwendiyên we bi wan re ji bo alîkariyekê bidine „RYA TEZE“ hen e?

Tîtalê Kerem: - Sala par, wextê Mîr Tahsîn hate vir, min ji yekî diduyan dewlemendên ji Moskovayê, Rusya yê ra got, ewan jî gotin, erê emê li ser vê pîrsê bisekinin, lê tiştê jî nekirin!

Her wisa dîsa gava ez par di 23-24 meha heziranê 2012 an de hatime „Konferansa Akademikarên Ezidiya a li bajarê Bielefeld“ê de amade bûm, min li wira jî derheqa rewşa rojnama „RYA TEZE“ de xeber da, gelek hêjmarên ku min bi xwe ra anîbûn li beşdarî belakir û gote kekê Xêrî Bozanî, serokê „Rûveberiya giştî ya karubarên Êzîdyên li Herêma Kurdistanê“ keremkin binêrin, em hê jî viya derdixin. Kekê Xêrî Bozanî jî li wira gote 200-300 mirovên beşdarî „konferansê“, werin emê niha alîkariyê ji bo rojnama „RYA TEZE“ kombikin û dîra gava ku ez vegirime welat, ezê jî li ser vê pîrsê bisekinim. Lê baş ra giş belabûn, çûn û yekî jî nehat tu alîkarî neda....

Êdî ez jî ketime dereceyê wisa na, wextê ku ez sava rojnamê alîkariyê ji yekî dixwazim, ji wî kesî werî ku ez ji bo aboriya xwe alîkariyê jê dixwazim. Ez jî êdî şerm dikim.....

Sedîqê Basî: Ez di dawiyê de dêjim, bila Xwedê qiwetê û sebrê bide te ! Tû her bijî di nav xêr û xweşiyê de!

Tîtalê Kerem: - Zor zor spas ji bo we, ez jî pir şadbûm ku hûn hatine vira û hûn ser çavên me ra hatine!

Ez jî vê Êrîvana Ermenîstanê gelek silaven germ ji bo birêz K.Tolan, Pîr Xidir û hemî ho girên me ra dişînim!

Kemal Tolan : Ez jî dêjime birayê Sedîqê Basî û Tîtalê Kerem, gelek spas ku we di nav vê gotebêja xwe ye zindî(ev filmê video yê li cem birê Sedîqê Basî ye) de, rewşa aboriya rojanama „RYA TEZE“, a ku di nav rojnamegeriya Kurdî de, ya here jiyandirêj û maka Kurdolojiyê ye ji me ra daxwanêkin!

Hêvîdarim ku gelek weltaparêzen Kurd jî bikaribin, ji vê rewşa aboriya rojnama „RYA TEZE“ re bibine alîkar û em nehêlin, ronahiya vê çira ku eva serê 83 salan ji bo parastin-pêşxistina ziman û çanda Kurdî pêketiye vemire. Kesên ku bixwazin hîn zêdetir agehdarî li ser rewşa rojnama „RYA TEZE“ bizanîbin, bila kerembikin binêrin li mînaka : [DENGÊ RÛSYA http://kurdish.rur.ru/2009/04/30/449486/](http://dengê.rûsya.ru/rur.ru/2009/04/30/449486/) û hwd.

Belê xwandevanê hêja,

weke ku hûn jî dibînin, erka ku di vî warî de kete ser milên min, min ev hevpeyvîn ji ber filmê video ya gotebêja zindî nivîsand û ezê zahf dilxweş bim ku ev berhevkirina min jî bi dilê we be !

Têbînî: hevpeyvîn bi riya rêzdar Kemal Tolan giha me..(Rojname).

Hevpeyvînek zindî bi

Tengezarê Marînî re

* kesê kevinê wî tune be, nûyê wî jî tune

* Pirê rewşenbîran dûvê hêlên siyasî ne

* ferheng bi wateya zanistî tune ne

P1- Tore neynika jiyana gelan e, heya çi astê toreyê kurdî ev pêk aniye?

Bersiv: Ez ne behwer im, ko tore neynika jiyana gelan e, belkî tore, nêrîn û awateya nivîskêr yan jî torevan e, li ser jîn û jiyane û dahatûya gelan. Bi wateyeke din, tore şeweyê derbirîna torevanî ye, ji quncikeke din li jiyane. Lê nayê wê wateyê ko ev nêrîn wê bi hin nêrînên din re hev xaç nebe, lewra jî em pir caran û di gelek nivîsên toreyî de, dibînin ko şeweyê hilgirtin û rahiştina babetan li ba hinek nivîskaran nêzîkî hev e, lê ne wek hev e.

Pêdivî ye ew jî bête gotin, ko di her ekolekê ji ekolên felsefê û toreyê de, li vê babetê cuda tê meyzekirin.

P2- Astengiyên zimên ko bi taybetî bi du ebcediya tê nivîsandin {Latînî, Erebbî}, ta çi radeyê ev yek bandora xwe li gelê me dike û ji aliyê zaravên cuda çine?, çi bandora du ebcediyan li wêjeya kurd heye?

Bersiv: Bêguman e, ko nivîsîna bi 2 elfebayan kartêkirineke wê nêgatîv heye û bi taybetî, li ser kurdên bakurî welêt, çimkî ew bi elfebeya erebbî-farisî nizanin bixwînin û ji wî mîrat û nivîsînên nû yên hatî û tîn nivîsîn bêpar in. Em dizanin ko ew şewezarave û nivîsîn bayix pê hatiye danê û ta radeyê pir pirsgerêkin zimanewanî çareser bûne.

Eve rastiyeke, ku ji herdû hêlan ji xwendinên nivîsan bêbehr in û ragihandin bi şeweyê tê xwestin nabê, lewra jî em dibînin ku em ji Nalî û Mehwi û yên nû mîna Bextiyar Elî, Mihemed Seîd Ferîq Hesên, Mehdî Xoşnaw, Kerîm Deştî, Enwer Mesîfî, Cîl Qubadîzade, Kejal Ehmed û gelekên din bêbehr in yan jî me kêr xwendiyê. Herweha ew jî xwe bi xwendina her berhemekî bi pîten latînî hatine û tene nivîsîn mendû nakin û jê bêbehir dimînin.

P3- Tu çawa helbesta kurdî {kilasîk û nûjen} li başûrê rojavayê kurdistanê bi taybetî û li kurdistanê bi tevayî dinerxîne?

Bersiv: Li vir jî dixwazim bibêjim, eger mebest ji wê yekê be, ew helbesta ko bi rêzband û terazû(kêş), tete nivîsîn. Ev cure helbest jî heye, xwênerê wê û ya bêhtir guhdarên wê hene, lê eger em ji hêla hunerî û ciwanî binerixînin, ev pêdivî bi lêkolîneke taybet e. Tenê dikarim vê bibêjim, ko kêr mane yên vî şeweyî dinivîsîn(mebest baş dinivîsîn), û her yekî ji wan stîleke xwe heye û bêhtirîn ji wan helbestvanan helbestê xweş dixwênin, mîna xwedê jêrazî Seydayê nemir seydayê Tîrêj, Salihê Heydo, Dildarê Mîdî û seydayê Keleş, pêdiviye ko em ji bîr nekin ko helbestvanê hêja şêx Ehmedê şêx Salih helbestvanekî bi şeweyê rêzband û kêşê dinivîse, lê xwedî taybetmendiyekê ye. Berî ez ji vî şeweyî xwe çemî şeweyê din bikim, dixwazim rexneyeke biçûk bikim, ko ew jî ew e, pirtirîn ji wan helbestvanên birêz xwe ji bandora seydayê nemir Cegerxwîn azad nekirine.

Li ser yên ko dibêjin em bi şeweyê azad, nû, serbest, serberdayî, helbesta pexşane ya deqê helbestî dinivîsin, ew di nav liv û tevgerê de ne û ji liv û tevgerê ewê tiştê derkeve.

Ev ên (Nûxwaz) pirtirîn ji wan di bin bandora helbesta wergerandî bo erebbî, yan jî helbesta Mehmûd Derwêş, Edonîs û Selîm Bereket de serê xwe hildan, ango ne li ber hilma helbesta Qedrî Can, Dr. Kamîran Bedirxan, Reşîdê Kurd û Mîr Celadet Bedirxan, xwe perwerde kirin û ew jî mixabin. Ez nabêjim sedem çi ne, ji ber ev ne cihê wê yekê ye. Lê tevî wê jî hinek ji wan bi xwe ve giyan û şiyana xwe derbas bikin û hêdî hêdî hewldanên cegerdarî bikin û xwe bi giyan, xewin, hest û nestê kurdîniyê stirehan û helbestên kurdîgiyan afirandin, her çende hindikin yên bi ser ketin, lê dîsan jî radeya helbesta kurdî ji hêla êstêtkî, hunerî û fantazî û xeyala helbestî ve bilind kirin û li vir taqet û tewana û hêza zimanê kurdî diyar bû.

Divê em ji bîr nekin, ko ew ragihandina ji 1991 ê ve û bi şûn ve peyda bû, kartêkirineke baş peyda kir û ew nimûneyên li başûrê Kurdistanê heyî, yên Divê em ji bîr nekin, ko ew ragihandina ji 1991 ê ve û bi şûn ve peyda bû, kartêkirineke baş peyda kir û ew nimûneyên li başûrê Kurdistanê heyî, yên mîna Ebdulrehman Mizûrî, Dr. Bedirxan Sindî, Mihsin Qoçan, Mueyed Teyîb,



Mehîfûz Mayî, xwedê jêrazî Selman Kovilî û Remezhan Îsa û hd..

yên bi hizr û bîrên kurdewarî xemilandî, dikarîbûn ta radeyê xwe bihin givên in hiş û bîr û boçûnên nivîskarên başûrê rojavayê Kurdistanê. Li vir pêdiviye em rola hêja

Dildar Şekô û wergerandina wî ji dîwana helbestvanê kurd yê tirkînivîs re Ehmed Arif ji bîr nekin, ko bi rastî bandoreke mezin li nifşê me û bi şûn ve jî kir. Ta niha hinek ji wan helbestvanên me ji bin kartêkirina helbestên Ehmed Arif û stîla wî derneketine.

P4- Gelo bandora kevnetor li te çi ye?, û bi tevayî çi bandora kevnetor li nivîskarên kurd heye?

Bersiv: Niha li vir pêdiviye em bibêjin, kesê kevinê wî tune be, nûyê wî jî tune. Bi wateyeke din, her nivîskarê ko klasîkên kurd nexwendibe (mebest ta qunaxa Seydayê Cegerxwîn) ew ê ferhenga wî ya kurdîniyê qels û zelûl be, herweha ew ê hûnandina wî jî dûrî vehûnana tevina kurdî û kurdewarî be, ango bi hişê din, bi kultûreke din û bi giyanekî din wê helbestê binivîse.

Ez nebehwer im ko nivîskarekî kurd bibêje: -Ez helbestvanim, an jî bide ser wê rêkê û bi kêmanî Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, seydayê Xanî û seydayê Cegerxwîn nexwendibe. Her weha pêdivî ye ko helbestvanên kurd li Folklor û gençînên gelê kurd yên din vegerin wek qewl û beyt û sebeqeyên olî û yên ola êzdîtîyê bi taybetî û bidin ber xwendin û lêkolîne, da ferhenga xwe ya kurdewariyê fereh bikin. Lê piştî vî qasî pêdiviye yê nûxwaz dabrînekê di navbera xwe û kilasîkan de peyda bike û bi alavên nû, yên taybet bi wî tevina Heyberên(deq) xwe vehûne û hewl bide di hundurê zimên de peqandinan bike û tîkiliyên nû li ser astê zimên pêkbîne, ji bilî ko ziman bistirehê û li ber peyv, syntax û hevokan asoyên nepeniyê û nû vekê. Eger weha nebê, ew dê nivîskar di xelekeke vala de bigere û bi alavên kevin, nivîskar nikare berhemên nû biafirîne.

Ez wekû projektekî nivîsînê (ez nabêjim nivîskar) min hewldaye, ko ev xalên min li jor nivîsî di jiyana xwe ya nivîskariyê de pêkbînim û belkî hîn bêhtir jî, ji ber ew derfetên bo min, dibe ji yên pir rêzdarên bêhtir bin, bi hikmê zanîna hindêk zimanên biyanî û şopandina rexneya modern û postmodernîtê û nivîsîna toreyî ya cihanî jî, çimkî bêyî wê jî nabe û zanîna nivîskarî zêde dike ev çende dewlendkirina giyanê nivîskarî ye. Le ta çi radeyê ez bi serketime an na ev pîrseke din e û ji demê re dimîne.

Li ser pîrsa ko ta çi radeyê kartêkirin li nivîskaran heye, ancex heryekî bi xwe re rastgo be, lê ez vê dibêjim, bê ez kesekî bi nav bikim, pir (helbestvanê) me hene, xwedê girevî helbestên nû dinivîsin, lê bi alavên kevin, wêneyên kevin, zimanekî cûtî û dubarekirî û nîgaş û xeyaltenig nivîsên xwe rêz dikin.

Ez vê jî dibêjim: -Di civata me de, xwênerê her nivîsekê heye.

P5- Ger û lêkolîn û rexne, wêje û çanda gelan zengîn dikin, di nav me kurdan de tu vê yekê çawa dinerxîne?

Bersiv: Ev pîrseke, ko bersiva wê pîr zor e û pêdiviye bersivdêr agah li hemem hemem hemî cureyên nivîsîna kurdî û bi hemî zaraveyan hebe û ez vê idî, ayê nakim, lê li gor agahiyên min, lêkolînerên kurd di warê edeba kurdî ya kilasîkî de, hebûn û hene û wek nimûne Qenatê Kurdo, Enwer Mayî, Sadiq Behadîne Amêdî, Prof. Marûf Xeznedar, Dr. Izzedîn Mustefa Resûl, Perwîz Cihanî, Seîd Dêreşî, Heyder Omer, Jan Dost û Deham E. Fettah û hinekên din.

Lê rexne, ez dikarim bibêjim, ko ev jî bi şeweyê rexne dibistanan in, ne eolan û tarîqan in ta radeyê peyda bûye û nimûne jî Mamoste Heyder Omer û Deham E. Fettah.

Rexneya rasteqîne û modern..., ev şewerexne pêdivî bi zanîn û zaniyariyên berferê in û pêdivî bi şopandina rexneya cihanî ya nû ye, ka gîhaye kîjan qunaxê, her weha pêdivî bi fêrbûna zimanên biyanî (wek Ingilîzî û Ferensî û Elmanî...) jî heye.

Di vir de, ez behwerim, ku ev cure rexne li ser asteyê ko rahêjin deq û ciwanî (estêtkî) û hunerîya wî şirove bikin, ne hukûm bikin, ev heme heme nîne, di

zaravê kurmanciya jêrîn de Dr. Kemal Mîrawderî heye. Li başûrê rojava di destpêk û navîna 1990 de çend nivîsên wek têbîniyên rexneyî derketim û rahiştin deqan bi şeweyekî sturukturalîst û Sêmantîk û hermentûtîkî, lê rawestiyên mixabin.

P6- Win çawa toreya kurdî di celebên - çîrok, roman, rexne, wergerandinê de dinerxînin?

Bersiv: Wek bersiva din, pêdiviyê her kes ko nêrîna xwe li ser pîrseke weha bide agah li hijmareke mezin ji wan berhemên ko hatine weşandin hebe û bi hûrbîni li ser wan raweste, vêca di bersiveke lîlah-bîlah de çênabe û ez layîq jî ji bo edeb û zimanê kurdî nabînim. Tenê dikarim weha bibêjim, berhemên ji roman û çîrok û kurte-çîrokên min xwendin, û bi taybetî di warê peşanê de, ez, geşbîn im û min berhemên hêja jî ko em kurd serê xwe bi wan bilind bikin xwendine û nivîskarên kurd dikarin bi hemî cure û stîlan berhemên baş biafirînin. Di warê Romanê de, romannivîsên me wek Bavê Nazê di romana xwe de (her çende wî navê romanê lê nekiriye jî) (Stockholmê te çi dîtiye bêje), Helîm Yûsiv (Sobarto), Mihemed Uzun (Evdalê Zeynikê, Mirîna kalekî Rind) û Ibrahîm Sîdo Aydoğan di romana xwe ya bi navê (Leyla Fîgaro) de, bi hemî pîvanên ciwanîyê, hunerîyê û ji hêlan tevin û hûnanê û vebêjiyê û buyer û fîguran ve berhemên cihê şanazîyê afirandine. Di warê kurte-çîrokê de pîr nav hene, lê hinek ji wan bi rastî dilxweşker in, mîna Pîr Rustem, dîsan Helîm Yûsiv, Kamîran Hajo, Enwer Kerehan (Duaya Êvarê), Yaqob Tilermanî (Belmeqlûb).

Di hêla wergerandinê ve, di van demên dawî de, vî curehunerî serê xwe rakiriye, lê kêma kesên ko wergerê dikin, Wergerandin ne bûye pîşe û kar, tenê belkî wek êrêkî niştîmanperwerî û ji ber di vê qadê kar û xebat kêma heye, rahiştine vî karî.

Tevî vê çendê jî, niha em dibînin, ko tiştê herî baş, ji zimanê orîjînal berhemên wergerandin ser zimanê kurdî, ev jî nîşana hindê ye, ko êdî kurd nema dixwazin pirtûkên dupelo-sêpelo bixwînin. Eger wek nav niha ez hinan bînim hizra xwe, bêguman navê seydayê nemir Şukur Mustefa tete pêşberî me û hêja Mustefa Aydoğan, ko ez bi xwe wek baştirîn wegêrê edebî navê wî li qelem didim û Ehmed Huseynî û Ebdulrehman Effî jî di van demên dawî de di gel hinek astengên peyva kurdî li cem wî.

P7- Toreya biçûkan{zarokan} li nav nivîskarên kurd pîr kêma û li paş e, gelo ji çi ye?, çawa nivîskarên kurd dikarin biçûkan perwerde bikin bê ko ji wan re nivîs û berhem hebin?

Bersiv: Ev celeb ji toreyê pîr zor e, û pêdivî bi pêdagogîkê(zanista perwerdekirinê) heye, pêdivî bi nasîna derûniya zarokan heye. Di warê folklorê kurdî de, pîr çîrok û çîvanok hene, ko nêzîkî giyanê zarokan in, lê mixabin ta niha jî sîde li wan nehatiye wergirtin.

Tu raçêteyê amade nîne, ko mirov bibêje 1+1=2, lê dahênan dahênan e, çi ji bo biçûkan be û çi ji bo mezinan be û her yekî ko giha wê behweriyê ko dişê bo zarokan binivîsê, dikarê, lê hêjayî gotinê ye, ko ev cure tore berpîrsiyariyê mezin e û divê nivîskar hayedar be û pîr nivîsên xwe kontrol bike û bide ber xwendin û lêkolînê.

P8- Çi rola rewşenbîrê kurd li gelê me heye, rewşenbîr kîye û gereke çi bike, ma ê nivîskar dibe ko rewşenbîr be?

Bersiv: Ne her nivîskar rewşenbîr e, herweha ne her rewşenbîr jî nivîskar e.

Rewşenbîr ew e, yê dikarê derbasî hundurê babet û pîrsan bibe, belkî pîrsên jiyanê biafirîne, ew e yê rêyên tarî rewşen û ronî bike.

Ev terim û zarawe, gelekî şax û şivîlên wê belawela ne. her yek dikare di hêlekê ji hêlên jiyanê de rewşenbîr be, lê di hêleke din de nezan be. Li cem kurdan rewşenbîrên giştî hene, ji hemî tiştan û di hemî biwaran de, hinekî jê dizanin, lê di biwarekî de hemî tiştî nizanin û ev malkambaxî ye.

Me îro pêdivî bi rewşenbîrên pîspor heye û ta niha rewşenbîrên kurd, rola xwe ya pêwîst di civat û komelgeha kurdî de nelîstine.

Pîrê rewşenbîran dûvê hêlên siyasî ne, û ji dêvla wan rêyên siyasî pak û pakij bikin, ew jî wek her kesekî didin pey wan û bi çavkoratî (Ev jî sedemên wê hene, lê bersiv ne li vir tê dan), alê û şûrên siyasîmedaran hildigirin, eger nebin mertalên wan.

P9- Rêziman û ferhengên ko hene, tu çi li ser wan dibêji, ta çi radeyê ji bo zimanekî standard bandora xwe kirine?

Bersiv: Rêziman û bi taybetî di kurmanciya jor de, pîrsgirêgeke mezin e û kelemekî tûj e. Ev kêşe bi nivîsîna texlîtên cuda ji pîtan dest pê dike û di rênivîsê re derbas dibe, ta bigihê nebûna dezgehên taybet bo çareserkirina kêşê. Ev herdû şewenivîsîn, nahêlin ragehandin û komîkasyon li gor tete xwestin peyda bibe, ta ko xwêner di êkûdu bigihin û gav bi gav zimanê me yê stander, belkî yekî nivîsînê hevpişk peyda bibe.

Ez dixwazim bibêjim ko ji hêla ferhengan ve, ferheng bi wateya zanistî tune ne, belkî pirtûkên synonyman in.

Pêdiviya me bi ferehengeke kurdî- kurdî heye û me pêdivî bi wê çendê heye, ko nivîskarê me ji zimanê çarçewe û qewara gund û bajar û herêma xwe derkeve û ji dêvla ko peyvek farisî, erebî yan jî turkî bi kar bîne, bila ji zaraveyên kurdî yên din bi kar bîne.

Ez nebehwer im, ko ferhengan radeya têgihîştinê zêdekiriye, lê bêguman TV yên kurdî roleke baş di vî warî de lîstine, lê ew jî pêdivî reforman in û pêdiviyê, ko li hev rûnin û guftûgoyê li ser çend xalên sereke bikin. Bo nimûne: peyva HEWA, SEQA, BA.- Nûçe Xeber û DENGû BAS, BÎNER û TEMAŞEVAN û pîr peyvên din hene pêdivî nîne serê bînerên xwe bi wan peyvan gêj bikin. Karê Kolektîv di navbera dezgehên rewşenbîrî û ragehandinê de, ew ê pîr alozî û pîrsgirêkên me çareser bike, ta êdî desthilatdariyek kurdî ava bibe û hinga ew dê pîr asteng bi hêsanî û biryaran bîne çareserkirin.

P10- Ji bo wan kurdên ko bi zimanên biyanî((erebî.tirkî, farisî) dinivîsin, tu çi li ser wan dibêji?, ma cihê wan di çand, huner û wêjeya kurdî de heye, tu wan di ku de dibîne?

Bersiv: Ev pîrseke, ko bersiva wê pîr aloz e. Li vir divê rewşa kurdan, parçekirina xak û giyan û civata wan, bête ber çavan. Nivîskar an jî dahêner bi daxwaza xwe zimanê biyanî hilnebijartiye, ew li ser wî ferz bûye û derfet jî bo wî peyda nebûne, ku zimanê xwe bi şeweyê zanistî fêr bibe, ji dibistanê- Zankoyê. Li vir çi dimîne, ka wî ta çi radeyê hez ji zimanê xwe kiriye?. Ev jî bi pîrseke din ve tê girêdan ka çi kar bûye, ji hêla pêşkêşên vê pîrsê ve, ku motîvasiyonên mezin li ba dahêner peyda kiribin. Ez van pîrsan vekirî û bêbersiv dihêlim û tîm xaleke din.

Nabe em bi yek awirê berê xwe bidin nivîskarên ko bi zimanê serdestan dinivîsin

a- Yên babetên wan kurdî ne, ji binê ling ta gopîtka serî û êş û azariyên gel û xelkên xwe derdibirin û bi dahêneke hêja, ev nivîskar kurd in û pêdiviyê em bi şanazî bibêjin ev nivîskar kurd in û berhemên wan jî kurdî ne û hewl bidin berhemên wan wergerênin bo zimanê dayikê. Ji xwe di wergeranê de bo çi zimanî be, ew dahêner dibe hilgirê navê niştîman û netewa xwe. Bo nimûne Selîm Berekat, ji pirtûka wî ya yekem û ta ya dawî, kurdîniya wî û komelgeha kurdayetiyê diyar e û ji xwe di her delîveyekê de jî dibêje ez kurd im. Nimûneya diwan me kurdan hemîyan şanazî bi derhênerê Filmê Yol kir nemir Yilmaz Günay, dema xelata li ser filmê xwe li KAN wergirt û kesekî ji biyaniyan û ji kurdan negotin ev ne filmekî kurdî ye, ji bilî toraniyan. Di vir de, eger em rewşa nivîskarên Cezayîrê û kurdan berwerde bikin, em dê li hev bikin.

b- Yên Babetên wan ne kurdî, lê ew bi netewa xwe kurd in. Edeba van dikeve bin xaneyê edeba wî zimanê, ko ew pê dinivîsin. Nimûne: Yeşar Kemal, (çimkî Mihmedê Zirav, dikare li ser wan kaş û çiyayên bajarê turkan jî be) û gelekên din yên dibêjin em kurd in. Ev kes pêdiviyê rêz li wan jî bête girtin.

c- Yên ne berhemên wan kurdî ne û ne jî xwe bi kurd dideynin, ji xwe pêdivî nîne em behsa wan bikin û dema xwe li ser wan wînda bikin.

Lê divê ji bîr nebê, ko di van demên dawî de, hijmarek ji nivîskarên me, niha vegeyriyan û bi zimanê xwe dinivîsin, wek Helîm Yûsiv, Ebdulrehman Effî û gelekên din, ko eve hingaveke baş e û me pê xweş e, eger ew nivîskar rojekê bi zimanê kurdî binivîsin, lê bi ya min em nikarin bibêjin kesekî nivîskar ka bi vî zimanî binivîse û bi vî nenivîse, ji bilî ko hinek ji wan ji sînorê zimên derketin, bo nimûne Yeşar Kemal û Selîm Berekat, nema ew nivîskarên kurd, Turk yan jî ereb in, û ne jî pêdivî bi wê hindê hene, ew bûne nivîskarên cîhanî û edeba wan ketiye rêza edeba di xizmeta mirovayetiye de.

Dixwazim li vir tiştêkî bibêjim, berê eger embizaniya yan bibîstaya ko yek ji yên navê wan heyî nêzîkî kurdan e, me yekser digot ev Kurd e nimûne Ehmed Şewqî û gelekên din, tevî wî qet behsa kurdîniyê nekiriye û rist ji hemî dîwanên wî behsa kurdan nake. Yeke din Seydayê hêja Şerefexanê Bedlîsî şerefnameya xwe bi Farisî nivîsî em wî çi bihesibînin?????

P11- Internet dergehêkî nû li tore û nivîskarên kurd vekiriye, tu tecrubeya xwe ya taybet bi malperên kurdî re çawa dinerxîne û wekû nivîskarek çi ji malperên kurdî re dibêje û bi taybetî malpera tîrêj.com?

Bersiv: Niha alav û amûrên ragehandinê ji hev cuda ne û şeweyê nivîsînê bo wan jî cuda ye. Nabe em ji TV, Internê û Govar û rojnameyan weke hev binivîsin, çimkî şeweyê xwendina wan cuda ye. Bêguman Internê û malperan dergeh bo herkesî vekirin û nûçe zû belav dibe, eve erênî ye, lê neyênîya wê ew e, ko yên ez-eziya wan xurt e û gelek jî nexweş in dikarin di seet û deqe û saniyan de bibin xwediye malperan û wek nivîskar û rojnamevan navê wan li qelem bête dan, bê ko **Abya** nivîskariyê û rojnamegeriyê zanibe, ji xwe kesek li xwe nadeynê ku bibêje, bes tenê ez di warê teknîka Internê û malperan de jêhatî û dikarim vê xizmetê bikim. Xweska herkesekî taqet û zîrekiya xwe binasiya û xwe nexapan dana . (Hevpeyvîna: **Malpera Tîrêj-erşif**)

Hoşeng Broka
hoshengbroka@hotmail.com



Hewlêr.. baş li xwe binere!



Ehmed mustefa

roj.ava2011@gmail.com



Hewler

Hewlêr paytexta mine
Paytexta şehîdan e
Şehîdên me nemirin
Bilind seri em radikin ...

Hewlêr paytexta dilan
Helebçe dîroka şehîdan
pêşmerge Rabun L'koerdistan
Ji bo axa te tev Bune Canfîda

Hewlêr tu tîrêja RoJê ye
Banga me ji bo azadîyê ye
Bilindikin ala Kesek û sor û zer
pîroz dikin bi gul û sorgulan gora
shehîdan

Hewlêr peytexta mine
Paytexta şehîdan e
Şehîdên me nemirin
Bilind SERI em radikin

Keskesor

Roka Azadîyê ye
Tîrêja ronahîyê ye
Kevokeke sipahî ye
Nîşana serbestîyê ye

Roja aşitî û serxwebûnê ye
Sitrana dîlberê ye
Ronahîya şevê ye
Bûka rojê ye
Rengê rojê û jînê û evînê ye
Keskesor

HEWLÊR

çavên te Nêrgizên Si behên e
çavên te sibeha şefeqa xwedê ye
Gava roj hiltê sibehan
ji rûyî teyî fedok kenê xweş tê
Her sibehan demê xûnav di berê
bi ser lêvên te yî gezok de şêl di kî
Birîna herdu lêvan derman dik e

Her ku sibeh tê

Bîraînên maçan tînim bîra xwe
Her ku sibehê tê...
di hambêza te de
Bîraînên Zaroktîya xwe tînim bîra
xwe

Û li ser sînga te a spî
Xilmaş di bim
Û di kevêm...

Teqînên dawiyê, ku di nivê cergê Hewlêrê de, bi çend seetan paş ragihandina encamên dawî yên hîlbijartinên Kurdistanê, rûdan, bê guman ne tesaduf bûn. Ew nameyêke pirralî bû ji serkirdayetiya Kurdistanê re, û di di serî de ji serok Mesûd Barzanî û partiya wî PDK re, ku 38 kursî ji 111an bi dest xistin.

Pirraniya çavdêran van teqînan vedigerînin du sedeman:

1. Serkeftina PDK di hîlbijartinan de, ku 34,2 % ji heimara giştî a kursiyên parلمانê, bi dest xistin.

2. Binkeftina partî û tevgerên islamîst ku niwênerayetiya „islama siyasî a Kurdî“ dikin, ku para hemiyana ligel hev 17 kursî derbas nekirin (10 Yekgirtûyî Islamî + 6 Komeleyî Islamî + 1 Bizûtneweyî Islamî), wate rêjeya tevaya tevgerên islamî li Kurdistanê 15,4% derbas nekir.

Helbet ev herdu sedem dikarin wek sedemên dîrekt yan jî rastûxo li paş teqînên „Hewlêra dawî“ werin dîtîne, lê bi ya min ew ne sedemên tenha ne.

Hin sedemên in dîrekt û nerastûxo jî li paş van teqînan, helbet hene.

Krîza Sûryayê ku Kurd wek aliyekî sereke tê de cî digirin, ji van teqînan ne bêrî ye . Wek tê zanîn, di Sûryayê de kesê (yan jî gurûpa) bêalî êdî nema ye. Her kes li Sûryayê êdî mecbûr e , li gorî şert, nîr, helûmercên şerrê navxweyî (tayîfegirî), ku li seranserî du sal û nîvan li dar e, wek alî xwe biguncîne.

Şerrê Sûryayê wek tê zanîn, ji şerrekî di navbera „Sûrya rejîmê“ û „Sûrya gel“ de bihtir, êdî ew şerrekî xurû mezhebî û tayîfegirî, di navbera du Sûryayan de ye: „Sûrya Elewî-Şihî“ (Elewîstan/ Şihîstan) bi piştgiyariya „Bloka Şihî“, ku îran serkêşiya wê dike, û herweha „Sûrya Sunî“ (Sunîstan) bi piştgiyariya „Bloka Sunî“, ku Tîrkiye û dewletên kendavê rêbertiya wê dikin.

Hin lêkolînên stratejî didin diyarkirin , ku berê herêmê û herweha nexşeya wê a siyasî ber bi guhertinên mezîn ve ye. Her kes li deverê êdî diçe ber maka xwe, anku her kes li gorî berjewendiyên xwe yên „tayîfegirî“ û „atnîkî“ yên berteng beşdarî siyaseta û konseptên ku li deverê tîne meşandin, dibe.

Dîn, her ku diçe, di nakokiyên navbera xelkên herêmê de, serî hildide û wek „îdeolojiya“ dewletê xwe dide pêş.

Her kes êdî bi dine xwe, daxwaza dewleta xwe dike.

Her kes êdî dewleta xwe, di serî de wek dewleta Xwedayê xwe, nas dike.

Her kes êdî di dine xwe de, parastina dewleta xwe, û herweha di dewleta xwe de jî parastina dîne xwe dike.

Şerrê tayîfegirî ku li seranserî 30 mehan li Sûryayê rûdide, nişana herî nêzîk û berbiçav a vê yekê ye: Dîn êdî dewlet e..dewlet jî dîn e!

Gelo şensê Kurdan di guhertinên ku li herêm dibin de, çiqas e ?

Gelo çiqasî Kurd dikarin di van guhertinan de, ji bo xwe bibin şens?

Iro ev pîrsa mezîn ne tenê pîrsa Kurdîstana Rojava, belkû a hemî Kurdan û hemî Kurdistanan e.

Ji van teqînan û Hewlêra wan a dawî, mirov dikare sê nameyên sereke bixwîne:

1. Sîstema civakî û siyasî a sekuler ji hêla gurûpên terorkar yên mîna „Al-Qayîde“ û xwişkên wê ve, êdî rû bi rû di bin gefên mezin de ye. Daku rê li ber van tehdîdan were girtin hişiyariyêke civakî û siyasî a sîstematik ji aliyê hem desthelatê hem jî rikeberiyê ve, tê xwestin, ku rê di Herêma Kurdistanê de, li ber hambêzkirina fikrekî islamî î tûndrew, were girtîne.

2. Koalîsyona Kurdan (ku pirraniya wan Sunî ne) bi Şihîyên Iraqê re, nema ji hêla „Sûniyan“ ve, tê qebûlkirin û ew dê ji aneha û şûn ve, bi piştgiyariya hindêk dewletên herêmê, bi darê zorê û terore were tehdîdkirinê. Lewre mebest ji van teqînan ew e, ku Hewlêr jî mîna Bexdayê bibe aramancî êrişên terorkar. Bi mantiqê „Terora Sunî“ Kurd şirikê Şihîyan e, lewre gereke ew jî wekî wan bedelê vê Şirikatiya bi „Şihiyatiya siyasî“ re, bidin.

3. Kurdistan wek welatekî „pirrdîn“, „pirrbawerî“ û „pirnetew“ li kuderê dibe bila bibe, ew dê piştî van teqînên „Hewlêra dawî“ aramancî terora yekta, a xwedanbaweriya yekta, Xwedayê yekta, dîne yekta, pêxemberê yekta û pirtûka yekta be.

Teqînên „Hewlêra dawî“ sîgnala wê yekê ne, ku „Kurdê sipî“ û „Kurdê reş“, li gorî konseptên li herêmê tîne meşandinê, tune ye.

Kurd, li gorî xwediyên van konseptan yek Kurd, yek netew û xwediyê yek xewn, yek al, yek dîrok, yek ciyografiya û yek Kurdistanê ye.

Rêxistina „Dewleta Islamî a Iraq û Şamê“ ku rêxistineke terorkar a ser bi „al-Qayîda“ ve ye, berpirsariya teqînên Hewlêrê hilgirt ser xwe, heman rêxistina heman terore ye, a ku bi mehane şerrê Kurdên Sûryayê li Efrîn, Kobanê, Serê Kaniyê, Qamişlo, Tirbespiyê û Dêrikê, dike, daku Kurdîstana Rojava têxe bin desthelatdariya „mîrîtiya“ xwe a „islamî“ û deverê bi darê „dadgehên şerîhetê“ 1400 salî vegeerîne paş û wê di dawîya dîrokê de asê bihêle.

Li vir Kurd in, li wir Kurd in!

Li vir xwîn bi Kurdî diherike, li wir jî heman xwîn bi heman Kurdîyê diherike!

Li vir Qamişlo, Efrîn û Kobanê ne, li wir jî Hewlêr, Silêmanî û Dihok in!

Li vir Kurdistan aramancî terore ye, li wir jî heman Kurdistan aramancî heman terore û heman terorkaran e.

Hewlêr..xwîna te sax be,

Hewlêr.. birîna te sax be,

Hewlêr.. giyanê te sax be,

Hewlêr hemîşeyî te sax be.

Gelo te anuha ji Qamişlo û xwişkên wê Efrîn, Kobanê, Serê Kaniyê, Amûdê, Tirbespiyê û Dêrika Hemko bawer kir, ku dijminê wan dijminê te ye, erîşkarê wan erîşkarê te ye, birîna wan birîn te ye, û hewrweha xwîna wan jî xwîna te ye?

Erê te anuha ji terora ku ne sînor, ne dîn, ne jî dinya jê re heye, bawer kir, ku dostên Kurdan, ji Kurdistanê heta bi Kurdistanê, tenê çiyayên wan in?

Hewlêr.. baş li xwe binere.. ew der Kurdistan e!

Hewlêr.. baş li Qamişlo û xwişkên wê binere.. ew der Kurdistan e!

Qamişlo, Mehabad û Amed.. baş li wir binerin.. Hewlêr Kurdistan e!

Sarhan Isa

Pênûsa Min îro



Noşa pêjna te û mirina min

Her ku di ber rûbarekî re diçim,
û çîroka dildariya xwe jê re di bêjim,
xwe vedixwe?

Her ku di ber gulîstanekê re diçim,
û bîna binefşan a li ser gumlekê min mayî,
bi ser de difûre,
keskahiya xwe dixwe?

Her ku siya min li zinarekî dikeve,
xwe diherivîne?

Her ku falkerek li fincana min dinere,
binê fincanê ditalêse û dernixwîn dike?

Her ku di ser peravên deryakê re dimeşim,
û wêneya min tîp bi tîp,
bi ser gewdê wê yê şîn de noq dibe,
hemî şorahiya xwe bi ser rûkê zemîne de dipijiqîne?

Her ku pêrgî karwanên ahoyan dibim,
stirihên xwe dişkînin,
û xwe di sîpanê xelatê de werdikin?

her ku pêrgî sirûdekê dibim,
û helbesta xwe jê re dixwînim,
tîpên xwe diciwê?

Her ku li welatekî dibim mêvan,
xwe ji min vedi di ze xwe dinixumîne
û min ji hembêza xwe zer dike?

Her ku ji pêjna baranê bê pêjin di bûm,
û hilma Vodka li Kepoyê min dixist
min henasa dilê xwe bi vê soza meyger ditanî:
wisa Meygerê Vodkayê
yê ku ji pêjna baran,

hezikirin,
giya,
kesk,
sêv,

endîkof,
minareyên razayî,
û gelek tiştên din bû,
carekê di kerika guhê min de
kulmek peyvên kesk şandibûn,
eger şevên biyanistanê li te xeybîn
ez ê te di tûrikê dili de bilorîn im,
min jî wê çaxê bawer kir,
û cerihek Vodka bi zehir xwe dakir.

Pêjnooo pêjno
Ez tenê şêtehel bestvanekî ji rê ketî me,
li dûv şopa peyvê,
qeftên kincên min bi dar û beran ve mane,
li ber her diwarekî,
kulmeke ji peyvan,
min li şûn xwe hêlane,
li pêxê her bajarekî,
karwanek ji helbestan min dêraye,
di nav pirça her zerîyeka
ku li bextreşiya min bûye mêvan,
bi dehan navnîşan min hûnane,
û nuha jî
ji boyî ku ez werim hişê xwe,
di ber Êma Têlî re,
ez ê careke din pêjna te ya ji pêjna mayî
mîna cerihek vodka bi zehir xwe dakim,
û noqa pêjna te û mirina xwe ya mîna tivingek siwarkirî
hildim Noş Noş.

Hazim Ehmed



Bi evîne bijî

ji peyvên buharî
ji çavên çirîsî
ji dilê xwîn ri jî

yên di eşq û evîna te de mirî
yên di nav destên te de digirî
yên wekî çûk û bilbilan tenê navê te dixwîn

îro hemî helbest û awazên dilê xwe bo te dikim diyarî
bila ev can bo te pîr bibe
bila ev can bo te tenê be, ne bo kesî
bila bimirim, tenê bi evîna te bijîm

Boniye Cegerxwin



Min di ronîya çavê xwe de

Min di ronîya çavê xwe de veşêre, min hilîne konîkê çava b' ser min de bigre, mijanka raxîne.
Bi salaye, bi agirê evîna te Dişewitim Bese agirê xwe Sarke ,roniyê li min vemrîne bi evîna min hambêzke, jînê

Li min vegeirîne
Kirasekî ji reşa şevê
Bi ser min de Berde
Dora min bigre hênik bike
Laviya j' min re bêje
bi dilovanî, min di ber xwe de êdî bilorîne
Birînê min pir kûrin êşê dilê min bê dawîne
Dixwazim
Di ronîya çavê Te de edî, binivim di heyva
Jiyana te de Derûn herdem xwe bibîne
Ji lewra va ez

Di rê de me dilezînim
Tême cem te Tenê bi te re
Dilê min dixwazî Xwe vehesîne
Û bi te re tenê hoşê min karî xwe vejîne
De ka êdî min di Nav hestên
Xwe de rapêçe Derûn rihetke
Dilê minî birîndar
Di xew xîne
Da karibim bi Te re dîsa sîbera Vehûnînim
Dîsa xewna ji nav baskê şevê ez

Birevînim
De bese êdî delalo
Hêviyê min Bi cî bîne
Bi te re Ez her demî Paye bilind û aza me
Dilê minî evîndar jî
Her ew , xwe Bi te dibîne
De zûke Ji min re di dilê xwe de cî bibîne
Da di hambêza henasê te de Çavê min Her te Bibîne

Dîlan Zêbo



Şerê Birakujî

Keç û xortên dilovan
Jin û mîrên bi êş û jan
Kal û pîrên bi axîn û keseran.
Guhdar bikin, guhdar bikin
Çîroka Dayîka we Kurdistan
Ji min re dibên Mezra Botan
Gulistana hundurê her du Çeman
Behîştê Încîl û Quran
Ez,
Dayîkek jîr û çeleng bûm
Seriyê min li Qars bû
Lingên min li Sincar
Destên min li Efrîn
Navika min Gola Wan

Ji çavên min yên şîn
Diherikî ava Zela
Li ber çandin rez
Avakirin bajar
Vedixwarin jê
Çi yad û çi xwemal.
Çar Zarokên min hebûn
Kurmanc, Zaza, Loran û Soran
Diparistin bejna min
Li Ararat, li Sîpan, li Geliyên
Ziving û Zîlan.
Çav berdand min neyaran
Hêriş kirin wek lawiran
Gur, Keftar û çeqelan
Goştê min xwarin,
Û hestiyên min dane Sehan
Ketin mala min
Ez mame şevder
Ew bûn xudî Welat
Ez bûm penaber
Zarên wan bûn Mîr
Yên min paratin der

Ê wan bûn Serbaz
Ê min Boyacî
Banga min ji Te re
Banga min ji Te re
Ey kesê Rewşenbîr
Ka aw Soza!
Ku Te dayî Diya pîr
Da Tu bibê
Pira Azadiyê
Ji bu serkeftin û yekîtiyê.
Bese...Bese
Qurbane we bim bese
Bese ev şerê birakujî
Şikestin li min milûpî
Cigera min kizirand kire xwalî
Porê min sipî bû mîna hêrî
Kî, kê dikujê... Kî kêêê dikujê?
Jibîrnekin, jibîrnekin
Wîn her du Birane
Xûna we yeke
Û Welatê we Kurdistanê.

Bêwar BARI TEYFURI



Êdî bese

Êdî bese

Ey lawê kurd

Ey geça kurd

Ey gelê kurd

Kanî WELAT?

ÇIMA SEKINÎ?

Çima heya niha xewda mayî ?

Çend sed salin paşda mayî

Belangaz û bê şoleyî

Gelek şer me kole mayî

Bê resen bê net ewî

Bê rêz, bê hêz, bê niştmanî

Êdî beseeeeeeeeeeee

LI dijî me dunya genî

Rawestîyaye bi hezar fêlî

Em xapandin hezar carî

Nadin mera derfet

Cîhana me dikin tarî

Vaye dîsa hev girtine hovên keftar

hêzên gemar

Ên bêbext û xwînxar

Êrîş dikin bi top.tankan

Bi çekên Kîmya bi balafirên

Wêran dikin axa kurdan

Çiya banîyan

Winda dikin şopa kurdan

Vedi mirînin xwezaya kurd

dîroka kurd

Vedi mirînin şerefa kurd

hebûna kurd

Dişewtînin çol û bestan

Dane ber bombebaran

heywan û daristan

Zindîyên hezar salan.

Hevgirtine hêzên qirêj hemberî me

Ên sextekar, ên koledar

Li ser tune kirina me girtine biryar

Li me dikenin

Resen a me înkâr dikin

Zulm û zora hezar salan li ser me di domînin

Ji mera eşkela fermana kuştinê

Fermana mirinê tune kirinê dixûnin

Heyîn û hebûna me dikin talan, dikin wêran

Warê me kirine warê qijikan

Êdî b e s e.

Ey lawê kurd

Ey geça kurd

Ey gelê kurd

Bê deng mayî

Li dunyayê bela bûyî

Ji axa xwe raneqete

Ji gelê xwe veneqete

Ji resena xwe dîr nekeve

Rabe, rabe ser xwe

Yekbûna xwe îlan bike

Li ser axa welatê xwe

Yekbûna xwe ava bike

Bi yekbûnê her kesê kurd silav bike

Bi yekbûnê welatê xwe hemêz bike

Yekbûn

gel ê kurd ra pêşeroje

jîyana pîroze

Jîyanek bi rêze

Êdî b e s e.

Êdî bese cudatîyêra

Êdî bese tayfetîyêra

Dujmintaya sed salanra

Kîn xezeba mezheban ra

Îxaneta berekan ra

Êdî bese ez eztîyê ra

Sûc buxtanên nezanan ra

Xizantîya netewîra.

Ey lawê kurd

Ey geça kurd

Bi yekbûnê ji holê rake

Dujmintaya li nava kurdan

Bi yekbûnê tu qut bike

Muxenetîya hezar salan

Li meydanê bi cesaret bibe çeleng

Raweste dijî hovan

Îxanetê tu alt bike

Dunyayêra yekdeng bêje

Durîtîyêra zulm zorêra derewyêra

Êdî bese.....bese

Ey lawê kurd

Ey geça kurd

Bi yekbûnê bi cesaret

Êrîşkara

Dostên derew ên sextekar

Xwefiroşan rexîz bike

Bi yekbûnê tu behjîne

Dunya derew, dunya gemar

Bi yekbûnê tu vemrîne

Dunya xwînxar û qetilkar

Bi yekbûnê tu alt bike

Dunya bedkar û sextekar

Bi yekbûnê rawestîne

dunya durî a fîtnekar

Bi yekbûnê tu vejîne

Gelê bindest, gelê kevnar

Bi yekbûnê holê rake

Xwefiroşan û xaînan

Bi yekbûnê biparêze

Tu şerefa niştimanê

Bi yekbûnê eyan bike

Azadîya **Kurdîstanê**

Bi yekbûnê bişopîne

Yektîya niştimanê

Bi şareza biparêze

Tu hebûna Kurdistanê

Bi zanebûn xuya bike

Tu dîroka niştimanê

Bi yekbûna gelê xweva

Ji bindestîyê tu dur keve

Bi yekbûnê tu êrîşke

Ser neyara ser kotîya

Ber hukmê te bila behje

Dunya derew, dunya xedar

Êdî bese

Êdî beseeeeeeee.....

Ey lawê kurd

Ey geça kurd

Ey gelê kurd

Vaye deme

Yekser rabe

Yekbûna xwe îlan bike

Ava bike

Dunyayêra bi îsrar bêje

Va em jî hene

em maqûlê gelan bûne

Berxwedana dîrokîne

Hewildana jîyanê

Serhildana cîhanîne

Serketîyê mirovahîyê

Torîvanê edlayêne

EY KURD

Êdî bese

Li welêda ala reng reng bilind bike

Dunya xedar

Dunya gemar

Dunya durî şer mezarke

Ser axa welatê xwe

Altindar û serketîbe

Dilşad û serfîrazbe

Koletîyêra, zor destîyêra

Êdî beseeeeeeeeeeee

Welat te cavra dike

BINDEST Û BERDESTE

Ebdulsalam Xoce



Tu Yê Bimînî

(Diyarî milyaketan... yezdanan.....û ...Ehmed Huseynî... Helîm Yûsiv Yasîn Hisên... Beşîr Mele... Nisre' dîn Birahîm û hinin din)

Ezê agir, bi buhar
 û şînkahiya Amûdê xînim.....
 Bîrarînên zaroktiyê..
 Name... Wêne... Cilên tozgirî..
 Ji palgeha li ber serê dayika te, derxim..
 Biqetînim. Bidirînim..
 û li ber bê bîfrînim..
 Zemawenda şîniya helbestên.. Penaberên te..
 Li bin siya Şermola, li darxînim..
 Hestên te yî nazik..
 ez ê bihejînim... û te himbêz biki m..
 Ramûsanekê bidim çavên keça te..
 Ew çavên bi hêstir ...
 - Keça min tu çi dikî?
 - Yaboo ... min germ e..
 Wê ev dîmen bi te re here gorê..
 Ji bo hêstirên keça te..
 Wê Xwedan..
 Dilovaniyê têxe dilê milyaketan..
 Wî ne êşînin.. ne êşînin..
 Çemê Amûdê..
 Riya Darê..
 Gola E'nter..
 Naxwazin tu dîr herî..
 û ger bû..tu çûyî..
 Ji bîr neke ku tu lawê Amûdê yî..
 Şeva çû..
 Min xewnek dît..?
 Tu di bû mîna teyreki baz..
 Di sînga ezman de..
 Tu rûdiniştî..

Li berjêr te dimezand..
 Tu digiriya û te digot: Amûdê..
 Tu çîqa biçûk î..
 Tu xweşikî..
 Niza xweda ji te hez dike...?
 Ez dibêjim ji te hez dike..
 Ji ber wilo..
 Her dem te bi girî vedike..!
 Mîna mindalekî, ji himbêza dayika xwe
 dîr bûyî..
 Ezazîl ..ji te hez dike..
 Bi ser bilindayî û bê tirs ji xweda..
 Xwe tazî dikir..
 û Amûdiyên serxweş..
 pêre dîlana asîbûnê li dijî xweda..
 Per deya keçaniya qederê..
 diqetandin..
 Te go çi hevalo...?
 Ma tu yê biçî...?
 Ger bû ..tu çûyî..
 ji bîr meke..
 tu lawê qadeke pîrozî..
 Erê..
 Mat mayî nemîne..
 xakeke pîroz e..
 Peyxemberan... Firîşteyan..
 Eniya wan herî dibû, ji tiberkê..
 Razeke di damarên xweda de veşartiyê..
 Mamik e..
 Bawer bike... Mamik e.....?
 Ne efsane ye..
 ne xewn e..
 راستی‌که..
 Şevên Amûdê ne wek tu şevanel
 Heyv... Roj... Sitêr... Hezkirin..
 Hemû tiştên wê... Ne weke yê tu kesa ne..
 Ma qey ne wisa ye.....?
 Hûn tevde çûn û we xatir nexwest..
 û hîn wê herin..
 Wê ji te dîr bibin..
 û xatir naxwazin..!
 Bi kerwanê rêwiyan re..

Beyar Robarî



Erê xembarê

Erê erê şêrîn babê
 Vaye hat yarê min dîlberê
 Ne ji şevê çû de, lê ji sala berê
 Ez bendewari m li hemberê
 Rê dipê m û nûçan û xeberê
 Çiqas şev ez mam bê xew
 û bi keserê!
 *
 Erê erê şêrîn dayê
 Vaye hat giyanê min kîbarê
 Çiye mal û milk li kêlekê
 Rabûn û rûniştina xwe,
 mîrê Cizîra Botanê
 Agir û sote vê hêvarê
 Dilê min keçê û evîndarê
 Kela dilê min serî hildide wek buharê
 û dem bi min xweş tê,
 wek meha gulanê
 Bese jibo min delalê
 Nanê sêlê û dew û pîvazê
 Bes ez razim li ser sîng
 û ber wek xezalê.

Sirûda xatirxwaziyê..
 Xweziya xwe daqurtîne..
 û li pişt xwe bizîvire..
 Kêlîkekê raweste..
 Meyze bik û patekê bide..
 Gir û mezêlê wê..
 Şehrezad û êşa wê..
 Toş, rapêrîn û dastanên wê..
 Bi girî... Bi axîn..
 Bilorîne birawo..
 Ma ne bese.....?
 Bi xatirê te..
 Bi xatirê te..

Ezîz ê Cewo

KÊ Û JI BO ÇI DÎROKA GELAN ANEGORÎ BERJEWENDÎYÊN XWE VEGUHARTINE?

Îro di cihanê da zanîyar-dîrokzanên cuda nêr'înên xwe yê cihêr'eng li ser dîroka mirovahîyê û gelên cuda ên cihanê tînin zimên. Naha êdî govtûgoyên di wî warî da r'oj bi r'oj zêde û berfireh dibin. Êdî vekirî li ser wê tê axavtin, ku dîrokên gel û welatan ne weke r'astîya wan hatine nivîsandin, ku hemû dîrokên gelan desthilatdarên di dewrên (sedsal) navîn da anegorî berjewendîyên xwe serer'ast kirine û dane k'axezê. Ku anegorî gelek agahîyên dîrokî, zargotîyên gelan û belgeyên cuda, çî ku îro em di derbarê paşer'oya (r'abirdûya) gel û welatan da dizanin, ne anegorî r'astîya wan e. Heman zanîyar dibêjin, ku dîroka gelan divê jinûva li ber ç'avan r'a bê derbazkirin û dîrokên gelan anegorî r'astîya wan bîn nivîsandin...

Û îro di R'ûsiyayê da jî, yê ku serk'êşîya vê nêr'înê dike, zanyarekî dema me yê hêja Vadîm Makarênko ye. Heya naha di vê derbarê da, li ser pirsên dîroka kevna çar p'irtûkên wî derk'etîne r'onahîyê: "R'ûs¹ ji k'u hatye?", "Erdnîgarîya nû ya cihana kevna:"

K'ilîta r'avekirina dîroka kevna a Ewropa û Asîyayê", "R'ûs a windabûyî" û "Ji dîroka navên gund û bajarên". Di p'irtûkên Vadîm Makarênko da tişteke bala mirov dikşîne: ew dibêje, ku dîroka R'ûsiyayê (û ne t'enê ya wê!) r'ast nehatye nivîsandin. Ku ew dîrok desthilatdarên dewrên (sedsalên) navîn weke xwe dane guhar'tin û jinûva dane nivîsandin. Bi dîtina wî di destpêkê da R'ûsiya li R'ojhilata navîn bûye, ku îro net'ewa here nêzikî r'ûsan di vê herêmê da k'urd in. Ku r'eha van herdu gelan ji çîyekî tê, ku di zimanên van herdu gelan da 3000 p'eyvên destpêkî yê hevbeş hene. Heya beşekî p'irtûka xwe ya "R'ûs ji k'u hatye?" ewî weha navkirye: "K'urd=r'ûs". ...Wek ku ew dinivîse, R'oma kevna ne li wir bûye, cêhê k'u naha ew R'oma ye. Ku ew R'oma naha her t'enê wek bîranîna R'oma kevna hatye avakirin... Û ew li çîyê R'oma kevna diger'e, û bi znistî şîrove dika, k'a ew dikaribû di demên kevna da li ku bûya...

Û gelek-gelek nêr'înên wisa ên balk'êş!

Naha jî Makarênko k'arê xwe didomîne, di çapemanîyê da gotarên wî yê balk'êş tînin weşandin, û gelek ji wan jî li ser dîroka k'urdan û k'êşeya k'urdî ne. Demekê berê (17. 07. 2013) li ser r'upelên malp'er'a kurdistan.ru gotarek a wî (helbet bi zimanê r'ûsî!) bi sernivîsa "K'urdîstana Mezin ew cîgeh e, li k'u dîrokên "cuda" ên r'ûsan, k'urdan, t'irkan, ermenîyan û yê dinê r'astî hev tînin"

(http://kurdistan.ru/2013/07/17/articles-19299_Bolshoy_Kurdistan.html).

Di vê gotara xwe da jî Makarênko di derbarê serdema dewrên navîn a dîroka k'urdan, dîrokzanîya k'urdî ya îro û gelek tiştne dinê yê balk'êş da bi zanistî nêr'înên xwe anîne zimên.

Li vir ew wisa jî gelek pirsan li pêşîya dîrokzan û lèk'olîneran r'adixe, yê ku divê di pêşer'ojê da wan pirsan hêjayî bersîvên zanistî û anegorî r'astîya paşer'oya gelê me bikin.

Ji bilî wan, li vir r'êzek p'eyamên zanistî jî bo zanîyarên k'urd hene, yê ku divê bê baldarî nemînin...



Wekî dinê, ev t'enê destpêkek e. Naha jî dor ya xwendevanan e – xwendevanên pispor. Fermo:

Vadîm Makarênko:

"K'urdîstan a Mezin ew cîgeh e, li k'u dîrokên "cuda" yê r'ûsan, k'urdan, t'irkan, ermenîyan û yê dinê r'astî hev tînin"

"Wek ku tê xuyanê, îro derdê k'urdan ne dîrok e. Xem û xerêqên wan ên r'ojane p'ir' in. Ew lêger'îna dîroka xwe ji bo r'ojên xweş dihêlin. Ya ermenîyan û adîrbêcanîyan, dema wan bêht'ir heye, wisa jî di R'ûsiyayê da hez dikin, dîrokê vek'olînin. Van demên dawîyê t'irkan jî destpêkirye, bi dîrokê va mijûl bibin. Ew dixwazin, di vê sedsalê da du salveger'ên girîng pîroz bikin: 2023-an – sedsalîya T'irkîya îro, û 2071-an – hezarsalîya hatina sêlcûkan (a vê herêmê. – E. C.).

Mirov lêger'înê ji k'u destpêbike?

Dîrok bi hezaran salan tê hejmartin. Ew weke deşteke bêsînora e, eger mirov li wir derê r'êwîtîyê, dikare li her alîyî va her'e, lê, dema vegeer'e, ew divê r'êyekê hilbijêre, ya ku wê bê fitya (sedî sed) wî bîne mala wî...

Li ser xaka K'urdîstanê, heya li ser a K'urdîstana mezin, dewleta dawîyê ya serbixwe ya Akkoyûnlîyan bûye (ya ky gelek caran wek "ên pezên sipî" tê wergerandin, û ev jî hero-na ye). Lê k'urd ne her daman di derbarê wê dewletê da bi bîr tînin, ji ber ku Dewletên Akkoyûnlîyan (1378 – 1508) û Karakoyûnlîyan (1402 – 1478) di ç'avkanîyên dîrokî da her t'enê wek dewletên t'urkmênî tînin bîranîn. Ev jî dîyardeyekê saz dike, ku ew dûrî k'urdan in. Lêbelê berî wê, ku mirov dê di vê nêr'înê da bi bawer bibe, divê bi xwe ji bo wan dewletan û yê berî wan, ên ku wek ên t'urkmênî tîne navkirin, net'ewnavê (êt'nonîm) t'urkmênî bihata r'avekirin, a ku yek bi yek li wê bihata. Ew, ku îro êt'nogaf (net'ewzan) cudahîyê datînin navbera t'urkmênî Asya Navîn, yê Îraqê û Sûriyayê, ew jî pirsê ç'areser nake. Lê, eger k'omên êtnîkî, ên ku xwedî heman navî ne, ji hev cuda dibin, wê demê zelal dibe, ku net'ewnavê t'urkmênî bi naveroka xwe ya net'ewî r'a têkilîdar nîne. Ew t'aybetmendîyek a berbiçav dide zanîn, ya ku li bal wan êtnosên nêzikî hev heye û bûye bîngeha navê wan.

Eger mirov li wê li ser asta sedsala X-XI binîhêr'e, wê demê net'ewnavê t'urkmênî hîç nayê tîgîhîştin, lewra ku ne t'enê li herêma ji T'urkmênîstana îroyîn başûrtir, angû, Xorasan, lê

her weha, beşekî wê jî, di nav da wisa jî Mervayê li bakûr, bi giştî yê k'urdan bûne.

Demayê derbarê k'urdan da tê gotin, yê ku di navbera Îranê, Îraqê, T'irkîyayê û Sûriyayê da hatine p'arç'ekirin, di derbarê R'ûsiyayê da jî bi bîr tînin (ne ewqasî), lêbelê di derbarê T'urkmênîstanê da bi praktîkî nabêjin, her çiqas jî bi dîrokî ew p'arç'eyekî xaka K'urdîstana mezin bûye. Erd û aqarên k'urdan ên ku demekê yekgirtî bûne, û mirov hê dikare wê li ser xerîteyên belavbûna zimanên îranî bibîne, îro êdî ji hev p'arç'e bûne û wek yekîneyek a yekgirtî nayên dîtin.

Çiqas ez tîdigihîjim, dîrokzanên k'urd ji bo dîroka xwe wek bîngehekê li Akkoyûnlîyan nanîhêr'in, dîrokzanên adîrbêcanî hewl didin, wê dewletê berbi xwe va bik'işînin, her çiqas ew yekîne di bîngeha xwe da hemû aqarên K'urdîstana mezin digirin nav xwe. K'urd jî bi dîrokî ewana yê xwe hesab dikin – ji Asya Navîn heya Sûriyayê, beşê çîyayîyê Îraqê jî di nav da.

Pirs ne di wê da ye, ku ew navçe, li k'u êt'nosa k'urd bi yekgirtî jîyan kirye, yê ku li herêmên Adîrbêcana îro, Adîrbêcana Îranê, Anatolîya R'ojhilatê û Îraqê ne, dik'evin nava wan dewletana. Hem jî Xorasan û beşekî mezin ê Asya Navîn di nav wê da bûne, wisa jî, Marî (Merv a kevna). Ev jî ew p'aytext bûye, ji k'u dagerkerîyên Ogûzan hatine destpêkirin. Demek a dirêj piştî êrîşên ogûzan ew herêmana dibin warê jîyana ber û berekên k'urdan. Ev heya sedsala XX jî wisa bûye. Her t'enê dema Sovêtê di vê herêmê da çend sed hezar k'urd hatine bişavtin. Ç'eka sereke ya bişavtinê jî di sedsalê XX – XXI da guhar'tina zimanê serekke û jîbîrkirina dîrokê bû, ji ber ku faktorên dinê yê çandî ji bo net'ewbûnê k'ar nakin.

Pirs dertê holê, k'a t'aybetîyên berekên ogûzan çî bûne. Ma gelo divê mirov r'ewşê wisa tîbigîhîje, ku desttêwerdanên herêmên çîyayî jî hêla berekên barbar (= ên sêlcûkan) va, li k'u bi bîngehî gelên bêht'ir pêşk'evtî, di nav wan da wisa jî k'urdên bêht'ir pêşkevî jîyane, dînamîka wan a dîrokî t'evlihev kirine? Eger mirov desttêwerdana ogûzan bîne ber ç'avên xwe, peyr'a jî ya monxol't'eteran, wek êt'nosên bi bîngeha xwe va dûrî k'urdan, wê demê mirovê nikaribe tî bigîhîje, k'a nişteçîyên k'urd ên Xorasanê çawa karîbûne k'urdeyîyê xwe bip'arêzin, ji ber ku ew p'êlên êrîşan divê nişteçîyên k'urd t'unekîrana, yê ku li hember her'îkîna mirovan a girseyî r'awestyane. Lêbelê ew yek pêk nehatye. Li ser bîngeha vê mirov dikare bibêje, ku ew ji hêla êt'nîkî va girseyek a yekawa ye. Lê hejyana (şok) ji ber çalakîyên leşkerî her t'enê li p'er'ên herêmê hebûye, dema p'evçûn di navbera êt'nosên cuda da pêk hatine. Lê di hindur'ê aqara mezin a herêma çîyayî da ew şer'ên navxweyî bûne. Ew t'aybetîyên wê demê bûne. Helbet, ewana bi xwe r'a hejandinên mezin danîn, lê nedîgîhandin t'unekirina girseyên mezin ên mirovan.

Êt'nonav

Heyf, ku navên gelan, êt'nonav, bêht'ir tîştan vedîşêrin, ne ku didin xuyanê. Ew wek cil û bergên r'ojhilatî t'aybetîyên bedenê bêht'ir vedîşêrin, ne ku didin xuyan. Di R'ûsiyayê da serê xwe gelekî eşandin, nîrxandin, k'a p'eyva "R'ûs", "r'ûsî" tê çî wat'eyê, lê dijwar ku biryarek hebe, ya ku ji hêla hemûyan va bê p'ejirandin.

Govtûgo didomin. Dibe ku naha jî dora k'urdan e, ku navên xwe yê gelî yê giştî û yê kesî, malbet û berekan r'avebikin. Lê r'astî ne di wan da ye. Ew di wê da ye, k'a wê çawa tişteki giştî bibînin, ji ber ku, berî her tişt, ew ji bo wê hatye kirin, ji bo ku cudahîyan derxin pêş.

K'urdistan mezîna dê heya di r'amanê da jî avanebe, eger dîroka r'ast a wê herêmê ji nûva neyê nivîsandin, hiç na, dîroka k'urahîya du-sê hezar salan. Heyf, gelek t'irê, ji bo ku K'urdistan mezîna bê, divê hema hildin û wê bidin daxuyanîyandin. Helbet ew mercekî pêwîst e, lê t'êrê nake.

Nav gelek caran r'astîyan vedişêrin, ne ku didin xuyan. P'ir'ê caran navê gelan tê wat'eya "gel", "ber", "bavik", ango, hev girtina girseya nişteciyan. Lê k'a ew çî binemal e û çî p'ewendîyên wê bi yê din r'a hene, divê mirov zelal bike? P'ir' dijwar e, ku mirov bizanibe, k'a gelo k'îjan ber û eşîr ji k'îjan gelên wê demê ne. Ez dibêjim, ku ogûz yek ji navên k'urdî ye, lê makdêra "t'irk" li ser navê wan ê "sêlcûk" zêde kirine. Navê "ogûz" tê wat'eya "berek", "bavik". Bi navê Sêlcûk jî ew "sêlcûkî" navkirine. Sêlcûk r'êberê ogûzan bûye. Lê gelo wat'eya p'eyva t'irk çî ye? Net'ew bi ziman û çandê ji hev cuda dibin, ne bi nav. Ê, gelo k'î dikare t'aybetmendîyên zimanê ogûzan makbike, dema ewana meşa xwe ji Xorasanê despêkirine? Mînak, em r'ûs, nikarin bêyî wergera pisporên filologîyê "Serhatîya t'axbûra Îgor"³ bixwînin, ji ber ku di wê da jimarek a mezîna t'ürkîzm hene, lê di wê da p'eyvên r'ûsî jî ne kêman. T'u kevnek'olekî (ark'êolog) ew cîha, li k'u t'or'in Îgor şer'kirye, nedîtye. Ya min, nêr'inek a min a xweser di derbarê wê da heye. Ez dibêjim, ew şer' li r'ex Melazgirê bûye (nêzîkî derîya Wanê), lê t'or'inê "r'ûsî" Îgor di dîroka Vîzans da wek R'omanê IV Dîogên tê zanîn, ê ku împêratorê Vîzansê bûye. Di ç'avkanîyên r'ûsî da şewazê Çêrnîgov dane Melazgirê. Di wî şer'î da Arparslan serk'etye, navê wî yê r'ûsî Îzyaslav Yaroslavîç bûye, yê ku, divê bê gotin, ji mirdota (prîntsêsa) sivêdî Îngrêdê bûye. Gelo ji ber wê nîne, ku heya naha svêdî t'angrîya k'urdan dikin? Û salveger'a wî şerê sala 1071-ê t'irk dê sala 2071-ê pîroz bikin (bernameyek a mezîna e!), yê ku xwe peyhatîyên dijberên Îgor hîs dikin, her çiqas di wî şer'î da ên ku r'abûne hemberî hev, mirovên hev ên nêzîk bûne- wek ku her demê, xal û xarzi, ap û birazi, yê ku pîrsa mafên serdarîyê di Mêrvê û Xorasanê da ç'areser kirine. Arp'arlan apê Îgor bûye, û navê wî R'oman Svyatolavîç bûye.

Weha, sêlcûk k'î bûne? T'irk in, k'urd in, an r'ûs ?

Çîma wisa dibe ? Çîma her tişt wisa li hev piç'ikye ? Ji ber ku me, r'ûsan û t'irkan cudaşewazîyên (vêrsîon) dîrokê yê biyanî p'ejirandine. Ya cihûd-îzrayîlîyan jî wisa bûye, dema avakirina dewleta Îzraîl ewan dîroka bîyanî hildane, ji ber wê jî, felestîniyê herî dawîyê jî bi bawer e, ku ew di R'ojhilata Navîn da bîyanî ne. Pîrs di wê da ye, k'a gelo k'urdê k'îjan cudaşewazîya dîrokê bip'ejirînin, k'a gelo ew, a ku ewê bip'ejirînin, wê ji bo avakirina K'urdistan bi hêz k'arbike?

Paradok's di wê da ye, ku bajarê Marî, an Merv, ne t'enê bajarekî girîng ê dîroka k'urdan û t'irkan e, lê wisa jî ya r'ûsan e. Navekî wî yê din jî heye - GAWR, yê ku di ç'avkanîyên r'ûsî da wergehêzî Kîy (Kîev) bûye. Ew jî, wek Kîyêvê, heman tiştî dide zanîn, ango, dide zanîn, ku ew bajar li ser buhur'ê bûye ("du k'endar gîhandine hev"). Hîn jî wê jî zêdetir, ew Kîyêva Svyatolav bûye, yê ku biryar digire, navenda dewleta xwe biguhêze ser Şatt-el-Erebê (Dûnay). Cêr'ibandye, lê ji wî r'a li hev nehatye .

Helbet, divê bibêjim, ku ji bo dîrokzanên tradîsîon ên dema me nêr'îna min ne nêzîkî heş û

aqilan e, lê ew bi xwe jî nikarin ji p'ir'anîya pîrsên dîroka R'ûsîyayê r'a hiç bersîvekê jî bibînin.

Lê dîrok çawa hebûye, wisa jî dimîne, bêyî wê, k'a ji me r'a li hev hatye, em wê têbigihîjin , an-na. Dîroka dewrên navîn a binemala "r'ûsî" ya desthilatdar hema p'abendî Mêrvê ye, ji Svyatolavê nebînayî (esvebnewî) û vir va (bi ogûzî nave wî Sêlcûk bûye û, ger wisan e, sêlcûkî jî t'ur'a Svyatolav in). Lawê wî Vladîmîr (vlad+mîr, ango, padişah) "Rûs mêrûn (t'ehfil) kirye" Gelek lawên wî hebûne, binemala wan qewîn bûye, ya ku ji bo pêşer'ojê gelek tişt pêk anye. Ew hemû li ser xakên K'urdistan mezîna pêk hatine. Navê Vladîmîr ê xirîstîanî Vasîlî bûye, lê di dîroka ogûzî da ew Mîk'aîl e. Di dîroka Vîzansê da, r'asttir, a R'omê da, ew Vasîlîyê II e, yê ji binemala makêdonî ya Vîzans, ya ku, wek ku tê gotin, an k'urdan, an jî ermenîyan damezirandine. Svyatolav (=Sêlcûk), Vladîmîr (=Mîk'aîl), Yaroslav (=Çaxrî-beg), paşê, wisa jî, Mstîslav Ûdaloy (=Toxrîl) û t'or'inên din ên "r'ûsî" p'aytexta wan a sereke Merv (=Kîyêv, Marî) bûye, her çiqas jî Mstîslav Ûdaloy (ê ku navê wî yê xirîstîanî Konstantîn Monomax bûye), mînak, heya birayê wî di Mervê da li ser t'ext bû, ewî di Vîzansê (bi r'ûsî: Tmûtarakanê) da mîrtî kirye. "Grêkan" wê demê ew wek Konstantîn Monomax bi nav kirine (=Ûdaloy, ango, yê ku dikare şer' bike) .

Di dîroknûsîya r'ûsan da Paradok'sek heye . Ew dîroknûsîya p'ir' hatye serer'astkirin, di wê da binemala t'or'inan piştî Îgor, kes nizane çîma, wek "ya r'yûrîkovîyan" tê navkirin, her çiqas bi formalî//şewazî piştî Îgor, ê ku, anegorî agahîyên kevnar, hatye kuştin û, wek ku di ç'avkanîyên dîrokî da tê gotin, r'eha mêran a r'yûrîkîyan qut dibe. Lê ew r'ast e, ku ew binemal wek "ya r'yûrîkovîyan" tê navkirin, eger Îgor û Svyatolav ji binemalekê bûne, r'eha r'yûrîkîyan domyaye, (eger mirov navên "vîzansîyan" ên tradîsîonî hilde, ew herdu jî ji binemala makêdonî ya R'omê bûne).

Dîrokên r'ûs û k'urdan ji destpêkê û heya dawîya dewra XV p'ir' nêzîkî hev bûne . Ew hê jî di zimên da tê hîskirin: gelek p'eyvên hevbeş di zimanên r'ûsî û k'urdî da hene. Ew ji k'u dikaribûn bihatana? Lê di dîrokê da ew nayê gotin, lewra ku bûyerên dîroka r'ûsan bi zorê bi şûnwar û berfirihîyên R'ûsîya îroyîn va girêdane. Û ev jî ne r'ast e. Ya r'ûsan, û ya k'urdan dîrokek e, her çiqas navên beşdarên wê cuda ne, lê ew cudahî yê nirxî (hêjayî) nînin, ew t'aybetîyên wergerê û encama wê ne. Cîhana kevnar û ya sedasalên navîn p'ir'ziman bûye. Di herêmekê da bi zimanekî axivîne, lê di yeke dine da - bi zimanekî din - wek ku heya naha di Silêmanîyê û Dihokê da. Û navên t'or'inan jî cuda bûne. Ew jî ji wê bûye, k'a wana k'engê serdarî kirine û serdarîya k'ê kirine. Û ji bilî wê ew ne navên kesî bûne, ew navên p'eywiran û r'ayenav bûne.

Navên herêmên ç'iyayî

Bingeha p'eyvên K'êrmenşah, Germîan, K'urdistan yek e. Ew bi têgeha R'omê va p'ewendîdar e. Carna dibêjin, ku R'om jî Vîzans e, her çiqas di r'astîya xwe da Vîzans t'enê beşekî derdorên R'omê yê biç'ûk bûye. Hê jimêjva ne t'enê Vîzansa r'omî, ya ku Konstantînê Gewre damezirandye, lê wisa jî berî ku R'om R'omûla û R'êma hêz wergerîne, r'ayenavê (tîtûl) Alêk'sandrê Makêdonî (Îskenderê Mzin) "R'omî" bûye.

Lê ew, ya ku wek R'om tê gotin, wek Hr'om dihat

nivîsîn. Kurmanc tê wat'eya "mirovê ji R'omê", p'eyv bi p'eyv: "R'om+an"=r'omî û + "cî"=mirov. Divê bê gotin, hewremanî heya r'oja îroyîn vê p'eyvê dip'arêzin, navê wana mirov dikare p'eyv bi p'eyv wek r'omî, an yewnanî wergerîne. Bi zimanê yewnanî demekê di Kandaharê da (Afxanistan) nivîsîne . Gelek desthilatdaran, ên ku wisa jî li ser xaka K'urdistanê serdarî kirine, xwe serdarê R'omayê nav kirine . Mînak, di dewra XII da r'ayenavê serdarê "T'evahîya R'omanîyê", ango, Vîzans jî di nav da, Danişman Melîk' Muhammed bûye (1134 -1142), ê ku peyhatîyê Çaxrî-begê ji binemala Ogûzê gewre bûye; û vê binemalê jî çend dewran desthilatdarîya xwe li ser wê aqarê p'arastye.

Çaxrî-beg, ê ku di T'ürkmênistan û Ûzbêkistanê da bi r'êzdarî bi bîr tînin , di K'urdistanê da ewqasî jî nizanin. Ma-ne, ewî beşê mezîna ê r'asta Îraqê dager kirye, di dîroka dewrên navîn ên R'ûsîyayê da wek Yaroslavê heşmend (aqilmend) derbaz dibe . Û R'ûsîya jî wê demê, her çiqas jî dîrokzanên heyî îro wê nap'ejirînin, p'arçeyekî R'ojhilata Navîn bûye. Hema ji ber wê jî peyhatîyên wî, yê ku weke wî li ser aqarên K'urdistan Mezîna, ango, li R'omê, desthilatdarî kirne, anegorî navê r'êzebilind ê pêşîyên xwe p'ayanavê Danişman li navê xwe zêdekirine, ango, "heşmend//aqilmend".

Êt'nonavên herêmên ç'iyayî:

Bi xwe navê R'om/Hr'om p'ewendîya xwe bi têgeha "jorîn", ango, "cîyê destpêkê" r'a heye (îro di Îranê da ji ç'em r'a "r'ûd" tê gotin, ango, ç'avkanî, ango, ya/yê ji destpêkê diherike. Û ji vir jî: (h)rûdê=H*rûd-e-stan=K'urd-e-stan=K'urdistan, ango, welatê jorîn; welatê ç'eman; welat, ê ku ç'em jê destpêdibin, welatê ç'iyayî.

Dema mirov li girseya êt'nonavên R'ojhilata Nêzîk û Navîn binihêr'e, mirovê bikaribe şewazên k'omên wan ji hev cuda bike. Bi dîrokî mirovê bikaribe, herî kêman, sê astên p'eydabûna êt'nonavan anegorî demê û mercan cuda bike . Em li wan binihêr'in .

Asta yekem - ew êt'nonavên mîna *êzdî, t'acîk, t'alîş, êlîn/hêlên, zaza* (dimilî xwe wisa nav dikin), *mard//mar* û yê dinê. Û di bingeha van da têgeha "agir, r'oj" heye, lê wat'eya wan êt'nonavan a giştî p'eyva "p'ûtp'eres" dide zanîn, ango, *agîrp'eres t.* Lê divê bê zanîn, ku demek a dirêj biryarek hebûye, ya ku lêger'inên êtîmologîya wan têrmînan daye r'awestandin (ebloke kirye). Ji ber wê jî, heya di zimanê r'ûsî da, li k'u ew têrmînan bi berfirehî tê bik'aranîn, êtîmologîya wê p'eyvê îro nayê têgihîştin. Ew tê wat'eya p'arastina Xwedavendê R'ojê (di k'urdî da: Mêrê R'ojê - E. C.), û ew jî di êt'nonîmê da tê xuyanê.

Şewazê duyem ê êt'nonavên bi têgeha R'om/Hr'omê r'a p'ewendîdar e, yê ku divê bigihînin Êrân-vêz-ê, û wisa jî têgehên ku digihîjin wê. Ew êt'nonavên wek r'omî ne (di zimanê sogdîanî da: *fromçîk*, ango r'omî), hewremanî, kurmanc, k'êrmanşahî, goran, ermenî, helbet, k'urd û yê dinê. Evana di nava sîstêma berfireh a siyasî da bi yekîtiya civakên net'ewî p'ewendîyên xwe ava kirine. Û navê vê sîstêma siyasî jî R'om an R'omanîya bûye .

Gelek caran R'omê bi giştî wek Vîzansê dihejmêrin, xazma, ya demên hê derneg. Ev çewt e. Wek ku êdî hatye gotin, hê gelekî berî ku Konstantînê Gewre Împêratorîya R'omê ya r'ojilatê damezirîne, p'ayenavê Alêksandrê Makêdonî

(Îskenderê Mezin . – E. C .) R'omî bûye . Bi xwezayî, Vîzans ne beşê Romê yê mezin û sereke ye (ango, ew aqara dorhêla Vîzansê/Konstantînopolisê bûye) . Ew ne hemû erd û aqarên wê bûne. Di nav erd û aqarên wê da ji hêlekê va navçeyên berfireh yên ç'iyayî yên ermenîyan û Îranî bûne, ji hêla dinê va, berbi r'ojhilatê û berbi herêmên nimzecîh yên Navç'emkê (Mêzopotamyayê) bûne. Konstantînopolis bi xwe bajar-dewlet bûye, û ne hemû R'om bûye, an ne hemû R'omanîya bûye. Û ew ne r'ast e, ku wê bajar-dewletê wek împêratorîyek a berfireh dihejmêrin.

Serdewrana xweserîya R'omê hê heya dewrana X bidawî bibûye, lewra ku ji binemala Makêdonî û heya k'etina Konstantînopolisê di dewrana XII da di bin derbên xaçdaran da, wisa jî, dibe ku, hê di dema xazaran da, ew her t'enê aqareke dewlemend û bi hêz, lê bi bajarvan va girêdayî bûye. Û navenda wê jî hey li Xorasanê bûye, hey li Anatulîya R'ojhilatê .

Net'ewnavên r'ûs, t'irk, t'urkmên şewazê sêyem ê net'ewnavan saz dikin . Ew p'eyvana p'abendî têgehên "r'eh, nivş, berek, girse..."-ê ne. Di bingeha van da jî p'eyva "ûrûg" e (li bal kazakên r'ûs - "krûg" – k'om), ango lawên bavekî, an binemalek. Ev ew in, ên ku di nav xwe da cîyê herî sereke didin p'ewendîyên hundur'în ên binemala (k'oma) xwe. Ev şewazê net'ewnavan prênsîpên r'êxistinbûna civakê didan xuyan .

Û di nav wê da "ûrûg", ango, k'om, binemal, an "r'ûs", yekîneyek a bingehîn a sazîya desthilatdarîyê bûye . Eger wan wat'eyan hildin, wê demê Akkoyûnlû R'ûsa sipî ye (wek: k'om, binemal), lê karakoyûnlû R'ûsa r'eş e (dîsa wek: k'om, binemal). Desthilatdarî di destê binemala t'or'inê da bû . Û ew ne ku ji bavê derbazî law dibû, lê ji birayekî derbazî birayê dinê dibû. Û peyr'a derbazî şaxekî dine , binemalek a dinê dibû. Gelek caran pevçûnên hevkujiyê çê dibûn . Heya naha ew qanûna dorguhêziya desthilatdarîyê di binemala Mîrtîya Erebiştana Siûde da pêkan e. Demên weha binemal ji hev dûr dik'etin û dijminahîya hev dikirin, û, dema di herêma wan da hêvîya wan a desthilatdarîyê qut dibû, ew diçûn herêmên nû, li wir bi cîh û war dibûn. Wê demê ji bo wan navendek a giştî a here bilind hebû, û hemû binemal bi şewazî (formalî) mafên wan hebûn, ku demekê li ser wê Olîmpê, di welatê wan ê destpêkî da wê desthilatdarî bigihîje destê wan jî. Dibe ku ev yek di r'amana K'urdistanê mezin da jî heye?

Çima divê mirov dest ji dîroka pêkhatî berde ?

Dîroka heyî – ew dîrok e, ya ku ji bo xurtkirina berjewendîyên bîyanîyan ên net'ewî hatye nivîsandin, ne ji bo yên kurd'an.

Ew dîrok demek a ewqasî dirêj di bin berjewendîyên net'ewî desthilatdar û olên herêmê da hatye "alastin", ku di wê da ji bo k'urdan cîyekî hêja nîne. Cîyê wisa di dîrokê da ji bo gelek gelan nîne. Ew ji bo r'ûsan jî nîne, her çiqas jî, li pişt r'ûsan va dewleta serbixwe jî heye û heya – ç'eka nûkleri jî. Dîsa jî dîrok tiştêkî p'ir' girîng lê zêde dike, û bêyî wê jî wê dijwar be, ku mirov xwe wek mirovê pêkhatî têbigihîje, ew k'u ma, wek net'ewa gewre.

Di vê r'ewşê da gelo mafê k'urdan heye, ku bi dîrokê va mijûl nebin? Divyatîyên r'ojane hene, lê ne hemû k'urd xwe di t'êk'oşîna siyasî da hîs dikin, heya ne hemû k'urd di K'urdistanê da dijîn. Bi dehan dîrokan dive hebin. Ji bo ku mirov bi dîrokê va mijûl bibin, p'ir' tişt pêwîst nîne, ew fir'andina dorger'a (satalayt) erşî nîne. Hem jî gelek dikarin bi dîrokê va bi derfetên xwe mijûl bibin. Tankek, a ku di navbera sê deqan da dikare bi "Molotiv-koktêlekê" bê sotin, bahayê wê p'ir'tir e, ne ku ew, çî ku pêwîst dike, ji bo ku çend deh mirov "bi hêsane" bi dîrokê va mijûl bibin. Ma ne, ferqa di navbera destnivîsar û tankan da ew e, ku destnivîsar naşewitin. Ya ku bi pênuşê hatye nivîsîn – bi bivir nayê qutkirin.

Her t'enê dîroka me bi xwe me pêwîst e, ne ku ew, di k'ijanê da ji bo pêşyên me cîhekî hêja nîne.

Di R'ûsîyayê da di dawîya dewra XVI da dîroknûsî nînbûye, welat hê nû li ser cîhekî nû saz dibû. Hesen Ûzûn (= Îvan ê III ê Gewre) t'ext li T'ewrêzê hişt û hate wir. Pêwîst bû, ku ew ji bo jîyanbûnê bitêkoşin. Dîplomate brîtanî Cîls Flêtçêr, di dawîya dewra XVI da hewl dide, bizanibe, k'a di herêma Moskova îro da Îvan ê III çawa bi cîh û war bûye, lê nikaribûye. Wê demê di R'ûsîyayê da hiç kes bi dîrokê va mijûl nebûye: derdê wan ne dîrok bûye. Dîrokê hê paşê wê binivîsin. Di sedsala XVII da cudaşewazîyê (vêrsîon) dîrokê p'eyda dibin, ên ku dîroka r'ûsan ji 4000 salan berê va di R'ojhilata Navîn da destpêdikin. Lê dawîya dawîyê cudaşewazîyê "ewropî// vatîkanî" li ser dik'eve. Û anegorî wê ji dîroka r'ûsan hate bir'in û ew hate kurtkirin (t'a dewra IX jê qutkirin) û hişkem bi xaka R'ûsîyayê ya îroyîn va girêdan. Bi wî awahî, ew bûyer, ên ku li R'ojhilata Navîn pêk hatine, bi wan xakan va girêdan, yên ku r'ûs nû lê bi cîh û war bibûn.

Em naha ji ber wê cudaşewazê dîrokê zorîyê dik'işînin. Em hewl didin, t'êbigihîjin, k'a em k'î ne, Xaka R'ûsî ji ku hatye. Ez bi hêvîya mezin li dîrokanên k'urd dinihêr'im, hem li yên îro, hem jî li yên pêşer'ojê. Lewra ku ez bi bawer im, ku dema ew cîh ji bo dîroka xwe paqîj bikin, û di R'ojhilata Navîn da jî– ji bo dewleta xwe, ewê bi xwezayî gelek tiştên nû yên di derbarê dîroka r'ûsan da derxin holê. T'enê pêwîst nake, ku derengî bêxin... ”

1. R'ûs – navê R'ûsîya kevnar e. Wisa jî jêr'a dibêjin R'ûsa kevnar. Ev nava ji navê berekek a dîrokî ya slavên r'ojhilatî tê.

2. Merv (Marî) – (farsî: مرو; t'urkmênî: Merw) – bajarekî kevnar ê Asîya Navîn e, li ber ç'emê Mûrgabê li başûr-r'ojhilatê T'urkmênistanê. Ew 30 kîlomêtrî ji bajarê Marî yê îro berbi r'ojava ye. Ew p'aytexta dewleta sêlcûkan Margîanayê bûye. K'îlafeyê (xerabe) Merva kevnar wek peykerê mîras/paymahîyên mirovahîyê ya hemcîhanî tê p'arastin.

3. "Serhatîya t'axbûra Îgor" – peykerek a wêjaeya r'ûsî ya navdar a kevnar e.

Wergera gotarê, pêşgotin, nasî û amadekirina ji bo weşanê: ya Ezîz ê Cewo

Mehmûd Derwêş



Wergerandin ji Erebi

Mizgîn Hesko



Babo: ez Yûsiv im.

Babo: birayên min, ji min hez nakin.

Babo: min di nav xwe de naxwazin.

Xwe dirêjî min dikin , çêr û kevîran davêjin min.

Dixwazin ez bi mirim , da pesnê min bidin.

Û wan...dergehê mala te li ber min girtin.

Babo: û wan ji zevî berdane min

Rezê min jehirkirin.

Babo: wan leyistokên min şikandin

Û gava bawêşînk bi porê min şa bû, ji min ciz bûn

Û di jî min û te rabûn.

Babo: ma min ji wan çêkiriye.....?

Pirpirîkan...xwe li ser milên min danîn

Gulgenim...bi ser min de tewîn

Balinde...di kefa destên min de danîştîn.

Babo: ma min çikiriye û çima ez....?

Te ez Yûsiv binavkirim

Û wan ez di kortê de werkim û Gur tawanbarkirin

Û Gur ji birayên min dilovantir e

Babo: ma min gunehkiribû gava min gotibû

Min yazdeh stêr ...

Roj û heyv

Li ber xwe çokdayî dîtine...

Kurdikirina efsaneyekê : *Can kurd*

Şehzadeyê Çînî yê hoşmend



(Ev efsaneya Çînî di „Wekî çemê diherike“ de, bi terzekî xweşik, ji aliyê romanerê mezin Paulo Coelho yê Brazîlî ve, hatiye nivîsandin.)

250 sal berî ji dayîkbûna hezretî Isa, silav lê bin, li welatê Çînê, pêwîst bû şehzadeyê navçeya Tîng Zida bibe Imperator, hema li gor serohatên kevarê yê çînî, diviya bû berî wê yekê, ew ji xwe re bûkekê bistîne, zagon wilo bû.

Ji ber ku wî dixwast jinekê bîne, ku ciyê baweriyê be, lew re hişmendî ji wî re gotin, ku bila hemî keçikên navçeyê bîn li ber wî rawestin, da ew yeke ji gişan bêtir pêbawer e, ji nêv wan hilibijêre.

Hemî keçikên navçeyê bi dilşadî xwe ji wê mîhrecanê re amade kirin, bi gelek lewendîkirin, xweşikî û nazdarî, bihatirîn cil kirin ber xwe, bi xemlên zêrîn û pir bi bîn, bi gelek kulîlk û reng û ton hatin li ber şehzadeyê xwe civiyan, di dilê her yekê de hîviya mezin hebû, ku wê ji xwe re hilibijêre, li xwe mar bike.

Berdesteka hejar, ku di koçka şehzade de kar dikir, dît ku dota wê jî hezdike tev li wê hilibijartinê bibe, Gotê: „Dota min, qey tu di serî de nesaxî? Van keçikên hanê, tev dotên malmezî û maldarên navçeyê ne, ma tu cil û xemlên wan nabînî? Tu yê bi van cilên xwe me riswa bikî. Bavê te di tewla hespan nizimtirîn karên paqijiyê dikir. Ma tu kîyî heta tu tev li wan keçan bibî?“

Lê belê xewnên dota wê jî wekî yê hemî ciwanan bilind û mezin bûn, wê ji şehzadeyê xwe hez dikir, pir ji wî hez dikir.

Dota wê pîrejîne bersîv wilo da dayîka xwe: „Dayê, dayê, Ez baş dizanim, ku ez nayê hilibijartin û ez dizanim, ku gelek ji van keçikên dî ji min çelengtirin, û ewana dotên malmezî û serhêz û maldaran in. Ji min re ev mîhrecana hilibijartinê yekemîn delîve û bergeh e, ku ez tê de hezkiriyê dilê, davdiliyê xwe, ji nêz ve bibînim. Ji min re dîtina wî ji nêz ve carekê bi giş malê cihanê dike û bi van hemî stêrkên gerdonê dike. Qedera min wilo ye, ku ez dota bavekî hejar û dayîkê hejar bim, hema tu dizanî, dayê, te jî di ciwanîya xwe de ji bavê min hezkir û tu jê venebû.“

Di hêvara wê rojê de, hemî keçikên memleketê rêz bi rêz, tev bi xemlên rengareng û giranbiha, bi bihna Misk û Enber û Gulav û Lewentê, bi gerdenên zêrîn û bi xilxalên zîvî, por şexirî û bi pêlikên bi ser piştên wan de daketîne, û bi solên, ku tenha bûkên ciwan di roja dewatê de dikine pê, hatin. Li ser destên wan sepetên gelek xweşik xemilandîne, ku tede kulîlk an firindên kes nedîtî an jî fêkî û şîrone, yê ku şehzadeyê wan jê hezdike. Tenha dota hejar a pîrejîna berdest, her wekî di mala xwe de, cilên xwe yê erzan dike ber xwe, wilo li dawîya teviya keçikan hat, lê piçekî

xwe paqijtir kiri bû, û lew re ji hinde keçikan çelengtir û mêşengtir dixuya.

Li ser destekî wê jî sepeteka xêzeranî ya bi xwe çêkiribû hebû, tê de çend kulîkên ji ber beneke zinarî jêkiribûn. Di dilê wê de tenha yek hîvî hebû, ku ew ji nêz ve li rûyê şehzade binêre, wî di şadiya hilibijartinê bûkekê de bibîne.

Çiya û newalan dengên deholên mezin û wîtewîta zurneyên ji rumekî dirêjtir bûn, vedida.

Zarok li pey keçikan dibezîn, bi hîviya standin û berhevkirina çiqinên diyariyan, gava şehzade ji jor ve, ji ser piştê sewkiyê bilind ve, wan davêje ser keçikan.

Şehzade dest bi pêşbirkê kir, got ku ew ê bo her keçikekê tova kulîlkekê bide, û kî ji wan paş şes mehan çelengtirîn kulîlk bîne, ku ji wê tovê şîn bûye, ew ê bibe bûka şehzade, û gava dewata wan çêbû, ji xwe şehzade dibe Imperator û bûka wî dibe xanima yekemîn di Çînê de.

Hemî guhdar û dîdaran bi wê pêşniyaziyê dilşad bûn, ji şehzade re erê kirin û keçikan yekûyek tov ji xwe re standin û ber bi malên xwe de lezkirin û çûn. Dota hejar jî bi dîtina şehzadeyê, ku li ba wê hezkirîrê mirovan bû, dilşad bû, tova xwe rakir û ber bi mala xwe ve beziya, di dilê wê de jî hîviyê nû pêda bû, ku ew bibe bûk şehzade; gava ji wî re kulîlka baştir ji ya gişan bîne, û ew soza ku li ber teviya gelê xwe daye nexu.

Keçika hejar ew tov di hêjatirîn kûzikên mala xwe de çand, bi gelek hajêkirin û paqijî ew herroj avda, ji pîrejînen derdora mala xwe şîret li ser çandina kulîlkan girt, hema tiştê ji wê tovê pêda nebû. Demeke dirêj derbas bû û ji kûzikê nîşaneke jiyanê derneket. Tov mirî bû.

Sê meh û bêtir, keçik xemgîn bû, kir û nekir tova wê şîn nebû, û roj bi roj çiriska hîviyê jî, ku ew bibe bûka şehzade çermisî, tevî ku hezkirina di dilê wê de ji berê mestir û geştir bû. Bi diya xwe re gelek caran peyivî, li ser bext û qedera xwe, li ser tova mirî, li ser xebata ku di ber wê tovê de kiribû û li ser nêzîkbûna roja pêşkêşkirina kulîlkan ji aliyê keçikan ve. Dayîkê jê re got, ku qedera wan wilo reş hatiye nivîsandin, ewana mirovin hejar in û divêt qedera xwe wekî ku ew heye bipejirînin, lê belê dota wê carekê ji hoşmendekî pîr bihîstibû, ku mirov dikane qedera xwe biguhêre, gava mejiyê xwe baştir û çêtir bi kar bîne û gava hîvî di dilê wî de nemire.

Gote diya xwe: „Ez di pêşbirkê de amade dibim.“

Diya wê berken bû û gotê: „Qey tu dixwazî hemî keçikên dî ji xwe re bi me bikenin?“

„Berê, giş ji xwe re bi hejariya me dikenin.“ Wilo bersiv da dayîka xwe.

„Kurê, tu yê çewa bi kûzikê bê kulîlk biçî nêv keçikên, ku bêguman tev bi kulîlkên xwe niha serbilindin?“

„Tew nebe, ez ê davdiliyê xwe carekê dî ji nêz ve bibînim.“

„Mala hezkirîrê kavil be, mirovan tew kûr dike û mejî ji seriyên wan difirîne, wan bê hiş dike.“ Dayîka wê di dilê xwe de wilo got.

Wan şes meh teva bûn, keçikên navçeyê di roja pêşbirkê de hemî wekî cara pêşîn bi xeml û hîviyên mezin hatin li ber şehzadeyê xwe li rêz rawestiyan û li ser destê her yekê ji wan kûzîkekî gelek xweşik, ku tê de kulîlkeka çeleng şîn bûye, hebû, lê belê her kulîlkek ji babetekê û bi şeweyekî, bi rengên bedew û bi bihnen dîlkêş. Tenha kûzikê dota hejar bê kulîlk bû, lew re jî teviya keçikan dikirine xîzêxîz û tîqetîq, bi wê dikenyan û hinekan jî deng li wê dikirin. Yekê gote wê: „Qey kulîlka te bi rê de firîya?“ Yeka dî got: „Na...Na...Wê bi rê de da hezkiriyê xwe.“

Şehzade di ber keçikan re çû û hat, weku ew dixwaze rast kulîlkekê hilibijêre, ne keçikekê. Giş bê deng man û dilê wan di sîngan de bi hêrs û lezîna lêdidan, gulmên wan sor bûn wekî gulên Corî, lêvêd wan pirpitîn, kabêd wan lerizîn û çavêd wan kûris bûn.

Şehzade li dawiyê giha ber dota hejar, a ku gelek keçik ji wê ciwantir û çelengtirin, û di kûzikê wê de kulîlk şîn nebûye. Şehzade tiliya xwe ber bi rûyê wê dirêj kir û got: „Ev.“

Hemî peyrew û keçikan şaş man. Hinek qîriyan û hinek di cîh de rûniştin û giriyan, kab li hinekan sist bûn û hiş di seriyê hinekan de nema. Kesek tenegehîşt bo çî şehzade ew keça hejar, a bê kulîlk û bê cilin giranbiha hatiye, hilibijart.

Şehzade çû li ser textê xwe yê şahanî rûnişt û gote wan: „Berî hûn tev biçin malên xwe, ez ji we re dibêjim, ka ji ber çî min ev keçik ji nêv we tevan hilibijart. Ji ber ku ew dirist e, ne wekî we xapînok û direwkar e. Min tovên ku dane we, wekî tova ku min dayî ve keçikê bûn, giş mirî bûn, tew nedişyan bişî û ji wan çî kulîlk û gul pêda nedibûn. Lê belê her yek ji we hatiye û guleke mezin û çeleng bi xwe re aniye. Ji vê keçikê pê ve we gişan sextekarî kiriye. Herin malên xwe û ji xwe re li bextekî xapînok ê wekî xwe bigerin.“

Wilo diyar bû, ku keçikan gava dîtin wan tov mirîne, her yekê ji xwe re guleke şînbûyî stand û anî, da şehzade bi wê bixapîne, hema ew ji wan zanatir bû, nehate xapandin, û dizanî kîjan keçik ji wan bo standina nav û ciyê xatûna Imperator çêtir e.

Beyar Robarî

Birakê te nexweşe!

- Xelek 1 -



- 3 -

Şeva dawî em hersê mamosteyên dibistanê li gundê Xalta -herêma Çiyayê Kurmênc (Efrînê) li gel xudanên çend şagirtan li mala bavê Mustefê lihevrûniştin û me demek xweş û biken bihevve derbaskir.

Dem havîn bû û padem' gelek nazik û hêmin wê hêvarê. Em li derva li pêşiya malê li ser sewkiyê rûniştin û dengê cinawir û şivanan ji her hêlê ve dihat. Gund bixwe çûçike û di dev û dawiya gêlî de cî girtî û ji sê hêlan ve derdor çiya ye û herêm tevde bi daristane. Xalta gundek kurdî klasîkî ye xelkê xwe bi çandiniyê û xwedîkirina sewalan dijîn û biberê darên zêtûnan.

Xalta ji bajarokê Cindirêsê ve gelek nêzîke. Tiştê herî bala min kişandî ew bû kû yek ji mamosteyên gund ta ji bajarê Derha sînora Urdonê hatî herêma Kurdistanê mamostatîyê bike! Navbera Efrîn û Derha dora 500 km heye. Ê mamosteyê sêyemîn wek min Kurd bû û ji herêma bû- gundê Gazê .

Roja ez gihîştimî gund meha kewçêrê bû sala 1984 an bi rastî ez şaş û metmayî mam! Di kaxezên min de rêvebirîya perwedê ya bajarê Helebê dibistan li gundê Xalta Jêrîne. Piştî ez gihîştin gund û min çend roj li wir derbaskirin, min ji hevalên xwe mamostan pirsî ger ev Xalta Jêrîne ma Xalta Jorîn li ku dikeve?

Herdû bihevve kenîn!

- 1 -

Min got: Çima hûn diken in?

Gotin min: Jiber ev yeka berî te biserê me jî hatî!

Mamoste Azêd got: Hêla rastê ji gund Xalta Jêrîne û hêla çepê jî Xalta Jorîne!

Min got: Tu rast dibêjî?

Selîm: Belê ez rast dibêjim.

Min got: Belem ez dibînim gund yeke!

Bersîva min da û got: Gotina te di cî de ye. Belam bi fermî gund dudu ne!

Min got: Çima?

Selîm: Berî niha bi çend salan xelkê gund girtinî hevdu û piştî wî şerî gund perçekirin û bû du gund û wek tu dibînî bixwe yek gunde û birayek li vê hêlê gêlî rûiştî û yê din li hêla din û her hêlek gundek serbixweye!!

Vê meselê rewşa perçebûna Kurdistanê bi bîra min anî! Nebes welatê me perçeye lê belam haqas perçebûn di her perçakî de me hene!

Me mamostan di xaniyê mizgeftê de xewdikir, jiber kû mele ji gund bû û xaniyê mizgeftê vala bû û jibo mamosteyan terxandin ji hela gund ve. Dema me xewdikirî darbest (tabût) li ber serê me bû. Yek caran mamoste Selîm henek dikirin û di darbestê de xwe dirêjdikir û digot divê ez ji niha de xwe amedebikim jibo rewşa mirinê û sehkîm ka

rewşa mirovê mirî çawa ye!

Sibede dora demjimar dehan min çentê xwe

kirehev û xatirê xwe ji mamoste Selîm û Ebdela xwast û ez bi meşê birêketim. Li ser rê navera Xalta û gundê Miskê bîkabek gihîşte min û ez tevê lênîştin û bixwere birim ta bajarokê Cindirêsê. Xwediyê bîkabê pere ji min nebirin jiber zarokê xwe li ba min dixwandin.

Li Cindirêsê derdora demjimarekê kê-m-zêde ez mam û paşê ez li teksiyeke ji ew teksiyeke li navbera Efrîn-Cindirêsê kardikinî niştin û çûme Efrînê. Teksî jî ji ew modêlên kevin û mezin û mixwabin şûfêr li şonê heft mirovan dehe mirovan lêkirin jibûna çend qurşan zede derxe.

- 2 -

Jibo ajotvên (şûfêr) vehesa rêwîyan nexem û derdbû. Armanca wî û hemû hevalên wî bes çend qurşa xwe lis er hesabê vehesa rêwîyan derxin û hesabê bûyeran nedikirin û tiştêk lis er rêkê pêkwere! Yanê tu kanî bêjî em li ser hevdû rûniştin û ta em gihîştin Efrînê ez hatim guvaştin!

Duniya germ bû û em haqas mirov di tirimbîlê de bûn, ta em gihîştin Efrînê em di xuyê de bûne av û ji bilî bihênê fûfûû .. û jixwe hestiyên min xişbûn! Xwedê kirî kû Cindirês ji Efrînê ve nedûre, wek din ez bawerdikim ez bisaxî nedi gihîştin mal!

Li Efrînê ez ji tirimbîlê derketim û min berê xwe da malê xalê Hamîd jiber min sozdabû wî ez di cem re derbasbim ger ez ji Xalta ve gerîm Efrînê. Lê min got ez ke çawa herim ba wî û bihên ji min têye piştî min di tiimbîlê waqas xuda!! Min rê tere nedît ji bilî teve we xuyê herim ba xalê Hemîd û lêborîna xwe ji wan bixwazim.

Xalê Hemîd mirovek gelek zîrek û zane bû. Ew û birakê wî Ehmed herdu di dema yekîtiya navbera Sûrî û Misrê de, ji hela hêzên asayîşa Sûrî ve hatin binçavkirin. Jiber kû ew endamên Partiya Komonîsta Sûriyê bûn. Herdu bira bi îşkencê seqetkirin û nikanîn bimeşiyana û destên xwe nikanîn bişewak asayî (normal) bikarbanîna. Xalê Hemîd, qandî polîsan lêdan û kotekirin, ji mêranîyê jî kirin. Tendirustiya wan gelekî zehmet bû, lê viyana wan herdukan gelekî bihêzbû û ticarî dest ji raman û boçûnên xwe bernedan.

Pê nivro ez gihîştin ba xalê Hemîd, ew li ba xaka xwe rûdinişt û xaka wî mêrkirbû û mêrê we xizmê wanbû. Piştî me silav dahevdu û li hal û rewşa hevdu pirsî ez, min destûr xwest ez herim dest û serêxwe ta qirtikê bişom da hinekî ez vehesim ji dest we germê.

Dayîka Ziyêd desmalek serdestan da min jibo ez dest û serçavên xwe pê zuhabikim.

Piştî min dest û serçavên xwe şustin bihêna min hinekî derket û min dipêre qedek avî hênîk vexwar û em li hundir rûniştin.

Piştî hinekî serê min vehesî û me zebeş xwar û dibere gil û gazincên xwe kirin û em li rewşa xweya taybetî û rewşa welêt axivîn.

Dora demjimar çaran ez ji cem xalê Hemîd birêketim û çûm geraca mirokbasan li pêşiya sera bajarê Efrînê ew radiswetîn û xelk lêdiniştin.

Li wir ez li mikrokê niştin û berê xwe da bajarê

Helebê. Li ser rê min biryar da kû ez li ser rêya gundê me peyabim û herim gund û sehkîm çî heye li mala û halê mala me çawaye û roja din ve gerim Helebê.

Berî em bi rêya gund gînin, bi çend xulikan ez ji ciyê xwe rabûm û çûm ba şûfêr û min jêre got:

Seyda ji kerema, ger tu kanî li ser rêya gundê Zaretê bisekinî, jiber ez dixwazim li wir dayem.

Şûfêr ji min pirsî û got:

Pismam bes te got tu derî Helebê ye, û li gor wê min kirê ji te bir!

Min got: Raste lê hat bala min, ez berê di gund û paşê ezê ve gerim Heleb.

Wî got: Başê ezê li ser rêya gundê Zaretê rawestim.

Min got: Sipas seyda.

Ez li ser rêya gund, ji mikrobasê peyabûm û min da gava û demek dirêj neçû derektorek ji paş ve hat û ez tevê lênîştin û em çûm gund, jiber şûfêr ji gundê me bû.

Eshed şûfêrê terekto, ji min pirsî û got:

Pismam tu çawayî û tu ji ku têye ?

Min got: Ez başim û hêvîdarim rewşa te jî baş be. Wek din ez ji Efrînê tême.

Eshed: Tu zanî halê min cote, paleye û cercere. Karê gundiyan pismam xelas nabe.

Min jê pirsî û got: Zarokên te çawanin?

Bersîv da û got: Halê zarokan başê, derin dibistanê û pîrek jî li ber malê kardike.

Eshed pirsî û got: Mamoste tu li ku derê seyan (dersan) didî?

Min got: Li gundê Xalta.

- 4 -

Eshed: Min bi Xalta bihîstî, lê ez nizam li ku dive.

Min got: Li bakûrî Cindirêsê.

Wî got: Aha. Ê Karê te başê?

Min got: Ji tunebûnê çêtire!

Eshed pirsî û got: Çima pismam tu wisa dibêjî?

Min got: Jiber pereyên xwe hindikin û sergêjî pêve pire!

Serî hejand û got: Raste zarok pir dikin pilepil û serî mera dêşîn.

Mamoste te negot kengî tu ke jinbikî?

Min got: Pismam bes Xwedê mirazke ezê jinbikim.

Wî got: Giştik qismete.

Min destê xwe danî ser mil û got:

Tu rast dibêjî . Xêra te pêwîstnekiri ez bimeşim, destên te xweşbin.

Wî got: Şaye nîne. Tu naxwazî em herin ba me, em çayekê vexwin ?

Min got: Pismam zor şipas mela carek din be, divê ez herim mal jiber sibede ez vedigerim Helbebe. Û wisa em gihîştim binê gund û ez ji derektorê daketim û min xatirê xal ji Eshed xwast û berê xwe da mal.

Piştî pênc xulikan ez gihîşt ba mala me û ji hêla rojhilat ve, ez ketim hewşê û hewşa me gelek fere û bi sênc bû.

Erdê hewşê zinar tê pîrbûn û me çend dar tede çandibûn. Ro hêdima berve ava diçû û derva hênik bû. Mala mala meya nû li rojavayê gund dikeve. Dema ez ketim hundir hewşê kesê yekemîn kû ez dîtîm xwûşka min bû, ew biçûkbû dora dehe salî bû.

Berve min beziya û banker û got:

Anê birakê min Hejar hat.

Min silav dayê û rakir kir hemêza xwe û rûcîk maçkirin û jê pîrsî û got:

Tu çonî û xwendina te çawa derbasbû hîsal?

Rewşnê bersîva min da û got: Halê min rinde û xwendin baş derbasbû. Û halê te çone?

Min got: Halê min başe.

Min pîrsî û got: We rapor wergirtin?

Wê bersîv min da û got: Erê me rapor wergirtin.

- 5 -

Min got: Raporta te çawabû?

Wê got: nîvenîv.

Min got: Başe, belam dive tu hewil bidî ji hane çêtirbe xwendina te.

Wê got: Bira tu mafdarî.

Min got: Tu zanî?

Wê got: Çi?

Min got: Min gelek bîra te kiri bû! Şabû û hinekî rûcîk sorbûn.

Wê got: Min jî bîre te kiribî ... ez ji te hezdikim.

Min got: çima?

Rewşen: Jiber tu bi ser min de nakî hêlehêl û li min naxî.

Min bi dêst girt û got: Çima ez ke li te xim û mafi min tune ez li kesîxim û neji kesek li min xe!

Mil hejandin û got: Nizam .. yê din bi min re şerdikin û tim dixwazim karan bi min bikin!!!

Min got: Xûşka min bibore min tiştêk ji te re nekirî. Jiber ez diçûm Heleb, lê li ser rê min got ez berê herim gund û ezê sibede vegerim bajêr, loma ez dest boşim û tiştêk min bi xwe re nanî. Li şonê wê ev dehe wereq (Sûrî) ji te re û sehke tiştinî xwe ji dikanê pêbikire.

Wê got: Destxweş bira.

Min got: Şaye nîne, tu dilê birayê xweyî.

Min jê pîrsî û got: Kî li male û anê çi karî dikeye?

Rewşen: Anê li kelingê şîvê dike. Wekî din birakên min Rizager û Rêzên ve li malin.

Min got: Bavû û yê din li ku ne?

Rewşen: Bavo tev Çîlo li nav erdane.

Min got: Başe dê were em herin cem anê. Bes divê ez çentê xwe berê dînim hundir .

Rewşen: Başe tu çente dîne hundir û ezê herim bi anê re bibêm tu hatî.

Min got: Dibe, tu here ezê çend xulik din bi te gînim. Min çentê xwe danî hundir û ez çûm kelingê . Keling wê demê pixware bû û bi êzingan şîv û nan tede dikirin û şîr dikelandin û kinc lê dişustin.

- 6 -

Dîwarên kelingê me bêherî û xanî bi keviran me girtibû. Û ardû jî ji êzing û kês û tebig û bişkilbûn û qurim û nuçên hişkbûn pêkdihat.

Ez ketim kelingê û min got: Hêvar baş anê û tu çawayî?

Wê hêze xwe kir û got: Tu bixêr hatî lawê min ez başim ka ez lawî xwe maçkim û em çûne rûyê hevdû.

Paşê pîrsî û got: Tu çonî û karê te çawaye? Karê hîsal bidawîbû?

Min got: Ez başim, halê min nexerabe. Wek din dibistan hîsal biserî bûn, wek dibistana gundê me.

Anê: Kew eye başe qenê tê hinekî alîkariya me bikî.

Min got: Dibe, çima na!

Min jê pîrsî û got: Halê bavo çone?

Anê: Halê bavo başe, tu zanî duniya havîne û kar pire. Ji pale de bigre ta pêz û sebzana û rêz, qet paşî netê.

Min got: Halê gundiyan eve.

Wê got: Raste. Tu ke çend rojan li gund bimînî ?

Min bersîv da û got: Sibede dive ez herim Helebê jiber hin karê min heye. Bes ez xelaskim ezê vegerim da em pale biserî bikin û şixran bikşînin.

Dayê got: Başe lawê min.

Min got: Anê bibore min ti tişt bixware naniye, jiber min dil hebebû ez herim bajêr û paşê werim gund, lê li ser rê min helwesta xwe guhart û ez ji mikrobasê daketim û hatim mal.

Dayê: Tişt nabe kurê min, sebze û mîweyên me gîştinî û şîr û mast û hêk û zêt û zêtûnê me bixwe hene. Serî xwe bi wê meselê mêşîne. Tu nebirçî yî ?

Min got: Belê ez birçîme. Bes dive emê li benda bavo û birakên min bimîn û bihevê şîv bixwûn.

Min pîrsî û got: Wek din çi heye, çi tune?

Dayê got: Welah lawê min, birakê te nexweşe!

Ez hane şaş mam û min got: Birakê min nexweşe, kîjan?

Anê: Rizgar.

Min got: Çi bûyî? Kudera xwe dêşe ?

Anê: Wek dibêje tim serî xwe dêşe. Ji hundir dertê û bi çolê de dere bişev nîşev!!

- 7 -

Min pîrsî û got: Ma we jê nepîrsî ji çi serê dêşe û çima bi çolê de dere??

Anê: Me jê pîrsî. Dibêje ez nizanim, lê li gor min rastiyê nabêje .

Min got: Anê Rizgar çûye dîktor?

Anê: Na, neçû. Wek din gelek hindik duxwe û xewa dike.

Divê tu vêre denkî û jê têbighînî deredê xwe çiyê û çarakê jê re bibînî.

Em li bendêbûn tu werî mal , da em sehkin çi çarê em kanin jêre bibînin.

Belkî ji me vedîdike bibêje çi vêre çêbûyî.

Min got: Ger tiştêkî xwe heye divê here ba bijîşk, tu rêya din tunene. Û heger pêwîstbû divê em wî bibin nexweşxanê.

Lê divê ez berê tevê rûnim û baxvim û bizanibim ka derdê xwe çiyê. Ez hêvîdarim pêwîstneke em bibin nexweşxanê.

Min pîrsî û got: Dayê ka Rizgar li kuye?

Anê got: Ez bawerim li oda jêrîn xwe dirêjkirî.

Min got: Başe ez derim ba wî silavekê têbidim û hewilbidim bi denkirin bidim û jê têbighînim derdê xwe çiyê..

Anê: Başe kurê min, belkî ji te re xeber de, jiber û tu jê mezintirî û ji te vedîneke, jiber hûn herdû wekhev xortin .

Min got: Başe ez binêrin ka çi dibê. Ez ji kelingê derketim û çûm oda jêrîn ciyê Rizgar lê raketî. Gava ez ketim hundir xwe dirêjkiribû û bi desmala serî serçavên xwe niximtibû. Min nizanî xewkirî an payî ye!

Min deng lêkir û got: Rizgar te xewkirî an na?

Min sehkir xwe livand û hewil da rabe serxwe û got:

Na min xewnekirî bes min xwe dirêşkirî û abû li ser xwe rûnişt. Min dest dayê û li çavan nêrî, kû rengî çavan hatî guhartin û gelek ehte û hinek lawazbûyî.

Min gotê: Roj baş bira, tu çonî?

Bersîv da û got: Tu bixêr hatî, ez başim û tu çawayî? Bibore bira ez nikanim rabime ser lingaye!.

Min got: Xemnake danîşe. Halê min nexerabe, derbasdibe.

Rizgar: Tu kengî hatî?

Min got: Ez berî niha bi demek kurt hatim.

Sernivîser

Qado Şêrîn

Rêvebirê Nivîsînê

Arşek Paravî

Desteya birêvebir

Abdilbaqî Huseynî

Ezîz Xemcivîn

Lawîn Şêxo

Pîr Rustem

Silêman Azer

Derhener

Xorşîd Şûzî

Ji bo hinartina berhe mên kurdî:

kurdi.penusanu@gmail.com

Jimarên "Pênûsa Nû" Tev ji vî Emêlî derxînin:

www.penusanu.com

